**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**İlyas SAYIM**

# KURMANCÎ VE HİNTÇEDE ERGATİF YAPI ÜZERİNE BİR İNCELEME

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ–2017**

**T.C.**

**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**İlyas SAYIM**

# KURMANCÎ VE HİNTÇEDE ERGATİF YAPI ÜZERİNE BİR İNCELEME

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**

**Yrd. Doç. Dr. Hüseyin ALLAHVERDİ**

**MUŞ–2017**

**K.T.**

**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN**

**ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**İlyas SAYIM**

# DI ZIMANÊN KURMANCÎ Û HÎNDÎ DE LÊKOLÎNEKÊ LI SER SAZIYÊN ERGATÎV

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Yrd. Doç. Dr. Hüseyin ALLAHVERDİ**

**MÛŞ–2017**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönergesine göre hazırlamış olduğum "Di Zimanên Kurmancî Û Hîndî De Lêkolînekê Li Ser Saziyên Ergatîv" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim şartlarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☑ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin ……yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

16./01/ 2017

**İlyas SAYIM**

**TEZ KABUL TUTANAĞI**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Yrd. Doç. Dr. Hüseyin ALLAHVERDİ danışmanlığında, İlyas SAYIM tarafından hazırlanan bu çalışma 30/06/2016 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Başkan** | : | Yrd. Doç Dr. Canser KARDAŞ | İmza: |
| **Jüri Üyesi** | : | Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ | İmza: |
| **Jüri Üyesi** | : | Yrd. Doç. Dr.Hüseyin ALLAHVERDİ | İmza: |

## NAVEROK

**NAVEROK** .................................................... **I**

**ÖZET** .................................................... **II**

**KURTE** .................................................... **III**

**ABSTRACT** .................................................... **IV**

**KURTEBÊJE** .................................................... **V**

**PÊŞGOTIN** .................................................... **VI**

**DESTPÊK** .................................................... **1**

**BEŞA YEKEM**

**DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ Û MÎNAKÊN KURMANCÎ**

**1.1. DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ** .................................................... 7

**1.2. MÎNAKÊN KURMANCÎ** .................................................... 12

**BEŞA DÛYEM**

**DI HÎNDÎ DE ERGATÎVÎ Û MÎNAKÊN HÎNDÎ**

**2.1. DI HÎNDÎ DE ERGATÎVÎ** .................................................... 63

**2.2. MÎNAKÊN HÎNDÎ** .................................................... 69

**ENCAM** .................................................... **99**

**ÇAVKANÎ** .................................................... **101**

**PÊVEK** .................................................... **104**

**JÎNENÎGARÎ** .................................................... **107**

# ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**KURMANCÎ VE HİNTÇEDE ERGATİF YAPI ÜZERİNE BİR İNCELEME**

**İlyas SAYIM**

**Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Hüseyin ALLAHVERDİ**

**2016, 107 Sayfa**

Kürtçe ve Hintçe aynı dil ailesinin üyeleri olmak itibarıyla pek çok ortak özellikler taşırlar. Bunların en dikkat çekicilerinden biri de ergatif adı verilen ve Hint-Avrupa dil ailesinde yalnızca İrani ve Aryan grubunda bulunan bir gramer olayıdır. Geçmiş zamanlı ve geçişli cümlelerde fiilin nesneye göre çekimlenmesi şeklinde tarif edebileceğimiz bu dilbilgisi hadisesi bulunduğu dil içerisinde kendine has nitelikler kazanarak yine aynı özelliği barındıran bir başka dile göre kimi farklılıklar kazanmıştır. Bu çalışmamızda Kürtçe ve Hintçede ergatif vasfının nasıl şekillendiğini şematik yaklaşımla ve analizci bir usulle tahlil ederek iki dil arasındaki ortak ve çelişen tarafları sergilemeye çalıştık. Tahlil için sunulan pek çok örnek, bir yandan konunun daha iyi anlaşılmasını temin ederken, diğer yandan mukayese imkanı sunmuştur. Bu da teorik olarak karmaşık gibi görünen fakat anadil konuşanlarının büyük bir akıcılıkla kullandıkları ergatif mekanizmasının nasıl yürütüldüğü ve zihnî süreçleri ile ilgili detayların belirginleşmesini sağlamıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Ergatif, Kürtçe, Hintçe, Özne, Nesne

**KURTE**

**TEZA MASTIRÊ**

**DI ZIMANÊN KURMANCÎ Û HÎND DE**

**LEKOLÎNEKE LI SER SAZIYÊN ERGATÎV**

**SAYIM, İlyas**

**Şêwirmend: Yrd. Doç. Dr. Hüseyin Allahverdi**

**2016, 107 Rûpel**

Kurmancî û Hîndî du ziman in ku ji çend aliyan ve dişibin hevûdû û hevpariyên wan jî ne kêm in. Yekê ji wan taybetmendiyên balkeş jî ergatîv e. Di famîlyeya berfireh a Hînd-Ewropayê de endamên ku vê xusûsiyetê dihewînin bitenê di malbatên Îranî û Aryanî de ne. Ergatîv bi kurtasî wiha tête te'rîf kirin: "Di demên rabirdû de lêkereke gerguhêz ji terefê bireser ve tête kesandin û bi vî awayî bandora kirde li ser fi'lê wenda dibe. Ango di hevokên bi lêkerên gerguhêz de lêker dikeve bin bandora bireserê û yekjimarî an jî pirjimariya bireserê di lêkerê de diyar dibe." Lê zimanên ergatîvî çawa xisletên wek hev dihemilînin, li gorî her zimanekî ewqas jî nîşanî wesfên xwerû didin. Ji ber vê yekê me xwast ku di Kurmancî û Hîndî de vê bûyera gramatîk bi şêweyeke şematîk û tehlîlî rave bikin û ferqî û hevşibîyên wan çi ne pêşkêş bikin. Mînakên rêzkirî yên Hîndî tev bi tîpen xwe yên orîjînal hatine nivîsandin. Piştî transkrîbe û wergerê mentiq û şuxulîna ergatîvê bi dirêjî hatiye şirove kirin. Hêvîya me ew e kû qayde û distûrên ergatîvê û binyada vê mekanîzmayê ji dûr ve çiqas tevlihev û dijwar xuya bike jî bi arîkariya van nimûne û îzahatê zelaltir bibin û şixulandin û xebitandina wan êdî wek pirsgirek neyên dîtin; çawa ku Kurmanc û Hindûstanî di bikaranîna wan de tu zehmet nakişînin û sivik û herikbar diaxivin.

**Peyvên Sereke:** Ergatîv, Kurdî, Hîndî, Kirde, Bireser

**ABSTRACT**

**MASTER THESIS**

**A SURVEY ON ERGATIVE CONSTRUCTIONS IN KURDISH AND HINDI LANGUAGES**

**İlyas SAYIM**

**Advisor: Yrd. Doç. Dr. Hüseyin Allahverdi**

**2016, Page: 107**

Kurdish and Hindi are two members of the same language family and they share a great number of features one of which is ergativity. It is an interesting grammatical event to be found only in the Iranian and Aryan subgoups. It can shortly de defined as the quality of conjugating verbs in accordance with objects, rather than subjects, and this happens only in past tense and within the limits of transitive verbs. It also gains certain characteristics in certain languages and definitely incorporates differences when compared to one another. In this study our main aim is to decipher the structural properties of ergativity through schematic approach and analytic techniques and provide the reader a clear map of common points and contrasts as well. Plenty of examples will hopefully help the reader to understand the topic better and he/she will be able to compare two structures more easily. This will in turn illuminate the mental processes carried out during the implementation of the ergativity and make the details visible and evident, just as the native speaker who has no problem in utilizing them does.

**Key Words:** Ergativity, Kurdish, Hindi, Subject, Object

**KURTEBÊJE**

| | |
|---|---|
| amd. | : Amadekar |
| b. n. | : Berhema Navborî |
| bnr. | : Binêrin |
| c. | : Cild |
| c.n. | : Cîh Nediyar e. |
| ç. | : Çap |
| g. | : Gotar |
| g.n. | : Gotara Navborî |
| h. | : Hejmar |
| hwd. | : Herweha didome |
| Îng. | : Îngilîzî |
| j. | : Jimare |
| k.d. | : Koça Dawî |
| K.T. | : Komara Tirkiyeyê |
| m.n. | : Meqaleya Navborî |
| r. | : Rûpel |
| T. C. | : Türkiye Cumhuriyeti |
| t.n. | : Tarîx nediyar e. |
| wer. | : Werger |
| wr. | : Wereq |

**PÊŞGOTIN**

Bingeha xebata me ji taybetmendîyeke balkeş a rêzimana Kurmancî û Hîndî, ango ergatîvê pêk tê. Ev taybetmendiya kevnare di her zimanê de xusûsiyetên hem muşterek, hem jî ji hev cuda nîşan didin.

Me pêşî di çarçoveke gelemperî de agahî dan û behsî qaîdeyên ergatîvê yên her du zimanan kirin. Piştre jî bi terzeke şematîk pêşkêşî mînakên Kurmancî û Hîndî kirin. Bi saya wan îzahatê jî bandora ergatîvê li ser sentaksê û semantîkê diyar bû û pêvajoya pêk hatina wê di zîhnê me de zelaltir xuya kir.

Min di xebatên dirêj û westîner ên min de gelek arîkarî û piştgiriya hewalên xwe dîtin. Nemaze hevalên mîn ên hêja mamoste Îkram Fîlîz, Xetîb Erdoxmuş, Serwet Şengul, Îsa Işiq û Tûran Guler her daîm ez teşwîq kirim û agahiyên xwe ên biqîmet ji min texsîr nekirin.

Bi vê wesîleyê ez dixwazim ji bo hemû kesên ku rasterast an nerasterast di teza min a lîsansa bilind de têkarî kirine re ji can û dil sipasiya xwe bişînim.

**Muş- 2016** **İlyas SAYIM**

**DESTPÊK**

Kurmancî û Hîndî bi saya vê yekê ku her du jî girêdayî malbata "Hînd-Ewropa"yê ne ji gelek aliyan ve nêzîkî yekûdu ne û taybetmendiyên wan ên paralel jî pir in. Ergatîvî ku xisleteke gelek kevnare ye, ji hemî beşên vê malbatê rabûne, lê di şaxên Aryan û Îranî de hebûna xwe hêj jî didomînîn.[1]

Di vê xebatê de hedefa me ew e ku em du zimanên eqreba bidin ber hev, çima ku her du jî di demeke kevnare de ji zimaneke qedim peyda bûne, yanî çavkaniya wan yek e.[2] Bi gotineke din, çend zimanên din jî hene ku ew jî xwedî taybetmendiya ergatîvê ne, lê ji ber ku nakevin malbata Hînd-Ewropayê me nexwast ku li ser wan bisekinin. Gurcî,[3] Baskî,[4] Buruşaskî,[5] Tîbetî,[6] hwd. çend endam in ji wan zimanan.

Ergatîv, bi te'rîfeke herî besît kesandina lêkerê ji hêla bireser ve ye. Ev bûyera gramatîk di hinek zimanan de di demên din de jî tê dîtin, lê belê li çend zimanan de jî bitenê li dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz tê bikaranîn.[7] Dîsa jî em nikarin ji bo vê bûyerê pênaseke wisa besît bidin, loma her ziman, çi Kurmancî û çi Hîndî vê qaîdeyê di daîreke wisa de bikartîne ku bitenê mexsûsa xwe ye. Me xwast ku di tehlîlên hevokan de ji şêweya "şemayan" sûd bigirin da ku hevokekê ji çend parçeyên morfolojîk pêk tê û bandora wan li ser semantîkê çi ne diyar bibin. Di şiroveyên hevokan de jî heya ku ji destê me hat me mentiqa ergatîviyê û terza wê ya xebatê pêşkêş kirin bo ku ergatîvî di demên borî de çawa sûret digire û sentaksê bi çi awayî diguherîne bi detayî berbiçav bibe. Bi gotineke din di îzahatê de munasebetan peyvan bi hevûdu re, peyvên îdyomatîk, taybetmendiyên peyvsazî, tiştên ecêb ku li sentaksê qewimiye û nemaze şixulîna ergatîve hatine ravekirin.

Di hilbijartina mînakan de me cehd kir ku hevokên ku me îqtîbas kirine taybetmendî û wesfên ergatîviyê bi temamî bidin der û temsîlîyetên wan tekûz bibe. Bi peyveke din mînakên vê xebatê bi te'bîra "numûne" re mutabiq in û rehendên muxtelîf ên ergatîvê derdixînin holê.

[1] https://en.wikipedia.org/wiki/Ergative_case (08/10/2016)
[2] http://www.dandavats.com/?p=16739 (08/10/2016)
[3] http://www.nthuleen.com/papers/L12paper.html (08/10/2016)
[4] https://en.wikipedia.org/wiki/Basque_grammar (08/10/2016)
[5] https://en.wikipedia.org/wiki/Burushaski (08/10/2016)
[6] https://en.wikipedia.org/wiki/Modern_Standard_Tibetan_grammar (08/10/2016)
[7] https://en.wikipedia.org/wiki/Split_ergativity (08/10/2016)

Di tercîhên mînakan de hinek hevok hebûn ku di halên xwe yên orîjînalde bi alfabeyên çeşîtdar hatibûn nivîsandin. Di tarnskrîpsîyonê wan de ji ber ku dengên Kurmancî bi tekûzî temsîl bikin me ji çend îşaret, wekî binxet û apostrof îstîfade kirin. Bi vî awayî jî fonetîka Kurmancî zelaltir û qewîtir hat nîşandan.

Hevokên Hîndî jî berê bi tîpên xwe yên eslî, yanî bi herfên Sanskrît hatin teqdîm kirin, lê pey wan de me wan latînîze kirin û carek din ji îşaretên cûr be cûr sûd girtin. Di transkrîpsîyona dengên "Devanâgarî", yanî ew alfabeya ku milletê Hînd bikartînin de çi ji destê me hat nav Hîndî û Kurmancî de me hevşibî çêkir. Yanî Kurmancekî dikare transkrîbeya Hîndî wekî Kurmancî bixwîne, bi wî şertê ku fonksîyona çend remzan ku me li dawî de pêşkêş kirine bizanibe.

Em bi vê fikrê qaîl bûn ku di pênasîn û şiroveya taybetmendiyekê wekî ergatîvê ku bitenê hinek zimanên cîhanê de tê bikaranîn de gelek mînak bidin û wan bi têrî îzah bikin. Ji ber vê yekê jî me di Kurmancî de 100 û di Hîndî de 50 mînak dan û bi dirêjî çarçove û rolên wê yên gramatîk nîşan dan.

Di beşa encamê de me bi maddeyan yek bi yek hevşibiyên û cihawaziyên ergatîvê yên her du zimanan bi rêz kirin. Bi vê terzî jî diyar bû ku di xisleteke hevpar de jî dikare gelek cudahî çêbibe.

Daxwazê me ew e ku di vê xebatê de ergatîvî çêtir bê nasîn û ew zimanên din ku vê taybetmendiya balkeş dihewînin, çi eqriba û çi dûr, wekî Zazakî, Gurcîkî, Goranî, Peştû, Pencabî, Gucaratî, Baskî, Dyîrbalî, hwd. jî bibine mijara vekolîn û berawirdê.

### Zimanê Hîndî: Saheya Wî û Kesên Ku Pê Diaxivin

Hîndî, yekî ji zimanên Hînd-Ewropayî ye.[8] Di nav vê malbata birfireh de jî girêdayî şaxa Îndo-Aryan e.[9] Kesên ku bi vî zimanê diaxivin herî zêde li Hîndîstanê di eyaletên Bîhar, Çhattîsgarh, Delhî, Haryana, Hîmaçal Pradêş, Charkhand, Madhya Pradêş, Racasthan, Uttarakhand û Uttar Pradêş de kom bûne.[10] Di van eyaletan de zimanê fermî ye û herwisa li cem Îngilîzî zimanê fermî yê hikûmeta Hîndîstanê ye jî. Eger em zimanê Urdû yê ku li Pakîstanê diaxivin zimanekî cuda qebûl bikin li gorî sermijariya 2001, kesên ku bi wesîleya Hîndîxwe radigehînin ji 420 mîlyon kes zêdetir in. Lê hejmareke mezin jî li dervayî welatê ne ku ew neketine vê sermijariyê.

[8] Omkar N. Koul, **Modern Hindi Grammar**, Spriengfield: Dunwoody Press, 2008, r. 1
[9] b.n., r. 1
[10] http://aboutworldlanguages.com/hindi (08/10/2016)

**Lêhceyên Wî**

Hîndî û Urdû du zimanin ku her du jî ji çavkaniyek bi navê Kharîbolî (Îng. Khariboli) tên ku ew jî li hawirdora Delhî dihat axaftin.[11] Piştî zayînê di sedsalên 8-10an de fatihên Efxan, Faris û Turk vî zimanî xistibûn zimanê komunîkasyonê loma wextê ku bi gelên Hîndîstanê re diketin temasê zimanê herî bi fayde û pratîk ew bû.[12] Piştî çend perîyodan da ku vî zimanî binivîsin alfabeyeke bi tîpên erebî hat peyda kirin û gelek peyvên Erebî û Farsî ketin vokabulariya wî. Êdî jê re "Urdû" an jî "Rexta" dihat gotin.[13] Dûre ew ziman wisa xurt bû ku hêdî hêdî cihê zimanên din wekî Sanskrît, Prakrît û Apabhramsa girt. Lê dîsa jî şaxekî ji wî zimanî (Kharibolî), nemaze kesên ku dînê wan Hînduîzm bû di çêkirina formên edebî de gelek peyvên Sanskrît, Prakrît û Apabhramsa dihewand. Bi vî awayî ye ku zimanê Hîndî rû da û bû zimanekî serbixwe.[14]

Esasen Hîndî û Urdû ji hevûdu ne cuda ne, loma her du jî dabestî heman rêzimanê ne. Berê formeke bi navê Hîndûstanî hebû ku ji her du lehceyên Hîndî û Urdû pêk dihat û di nav wê de hem peyvên Erebî û Farsî hem jî Sanskrît hebûn.[15] Di pevajoya azadiya Hîndîstanê de ev ziman bûbû sembola nasnameya netewî. Lê heta sedsala 18an dem lazim bûbû ku lehceya Hîndî bibe zimanekî edebî û zimanê komunîkasyonê yê tekûz û kamil.[16]

Em dikarin vî zimanî bi du qism dabeş bikin: Hîndiya rojhilat û Hîndiya rojava. Zaravayên rojhilat Avadhî, Baghelî û Çhattîsgarhî ne; zaravayên rojava jî Haryanvî, Brac, Bhundelî, Kanucî û Kharîbolî ne. Niha van zaravayan tev di bin navê Hîndî tên dîtin. Lê Hîndîya standart ku bûye zimanê edebîyat, rojname, komunîkasyon, tîcaret, huner û xasme Bollywoodê ji lehceya Kharîbolî tê û di herêmeke berfireh ya Hîndîstanê de tê fêmkirin.[17]

**Hîndî Û Urdû**

Di demeke dirêj de berê azadbûna Hîndîstanê zimanekî bi navê Hîndûstanî ku ji hevpariya Hîndî û Urdû pêk dihat bûbû zimana ragihandinê yê gelek herêmên Hîndîstana mezin. Herçend zimanê Sanskrît di dewra qralîyetên Hîndû de zimanê

---

[11] https://en.wikipedia.org/wiki/Khariboli_dialect (10/10/2016)
[12] Koul, b.n., r. 2
[13] https://en.wikipedia.org/wiki/Rekhta (10/10/2016)
[14] Koul, b.n., r. 3
[15] https://en.wikipedia.org/wiki/History_of_Hindustani (10/10/2016)
[16] Koul, b.n., r. 3
[17] b.n., r. 7

hikûmetê bûbû, an jî di dewra xanedanên Musulmanan de Farsî zimanê îdareya dewletê bûbû dîsa jî van zimanan bitenê di daîreke teng de hebs mabûn û belavbûyî nebûbûn. Di perîyodên nûjen de jî ev rewş ji bo Îngîlîzî jî carî bû, yanî zimanê milletê Îngîlîz yê dagirker jî tevlî belavbûna xwe cihê zimanê Hîndûstanî negirt û bi tenê bi elîtan re tixûbdar ma.[18]

Di destpêka sedsala 12an de hêzên Musulman li Hîndîstanê bicîhbûn.[19] Xanedanên Memlûkiyan, Tuxluq, Lodî û Muxal tev liwir hikum kirin, lê zimanê wan yê îdareyê ne Hîndî bûbû. Ew bi tenê ji bo ku navberê wan û gelê de hêsanî çêbibê vî zimanê bikaranîn. Di dawiya sedsala 13an de jê wî “Hîndî” binavkirin. Yanî ew ziman ku aîdê Hîndîstanê ye an jî jê tê. Di hikumdariya Muxalan de jê re navekî din jî danin ku ji Turkî tê û bi wateya qerargeh an jî kamp e: “Urdû”. Bi dirêjiya sedsalan di nav formên Hîndî û Urdû de cudahiyek wekî niha çênebûbû û ji bo van her du forman “Hîndûstanî” dihat gotin. Lê piştî îşxala Îngîlizan ew ji bo ku cudahiya navbera milletên Hînd zêdetir bibe û tu car Musulman nebin hêza herî mezin ya Hîndîstanê hêstên netewiperest teqwiyet kirin û ji bo reqabeta van zimanan rê vekirin.

Piştî ku Hîndîstan azad bû û pey de jî jê sê welatên cuda bi navên Hîndîstan, Pakîstan û Bangladeş derket her yekî ji wan, zimanê xwe xistin fermî û nêzikbûna Hîndî û Urdû jî ket xetereyê. Hêj jî ew pêvajo didome û nasyonalîstên Hîndû heya ku ji destê wan tê li cihê peyvên Erebî û Farisî peyvên Sanskrît bikartînin û wekî “öz Türkçeci” yên Turkiyeyê cehd dikin ku zimanê xwe her çi ku Îslameyitê tînê bîra mirov jê dûr bixin.

### Taybetmendiyên Wî Yên Lînguîstîk

Hîndî wekî zimanên din yên Hînd-Aryanî gelek dengdêr dihewîne û bi yekûn van dengên vokal digihêjin hejmara “10” ku di wan de yên dirêj û yên kurt jî hene. Eger em di dirêjî an jî kurtasiya vokalekê de guhertin çêbikin hingê îhtîmale ku wate jî biguhere. Vêca dirêjiya vokalan dibe fonemîk, yanî sedema guhertinê. Her wiha dengên nazal an jî pozî jî hene ku bikaranîna wan an jî tunebûna wan me’nayê diguherîne. Yanî ew jî fonemîk in. Mesela dengdêra “e” li vê peyvê ha de ne nazal e û nîşanî yekjimariyê dike: मेरा भाई अध्यापक है। (Mêrâ bhâî adhyâpak h*e*.) “Brayê min mamoste ye.” Di vê mîsalê de jî “e” ji pozê tê xwandin û nîşanî pirjimariyê dike: “सेब मेज़ पर हैं।” (Sêb mêz

[18] b.n.,r. 3

[19] https://en.wikipedia.org/wiki/Muslim_conquests_of_the_Indian_subcontinent (10.10.2016)

par he.) “Sêv li ser maseyê ne.” Bi vê terzî em fêm dikin ku dirêjî û nazaltiya dengdêrekê ser wateya peyvan guhertin çêdike û bi vê taybetmendiyê dibe fonemîk.

Navdêrên Hîndî dikevine tewangê û li gorî zayendê, hejmarê û halê tên kesandin. Ji hêla hejmarê dibin du beş: Yekjimar û pirjimar. Ji hêla zayendê dibin du beş: Nêr û mê. Ji hêla halê/rewşê jî dibin du beş: Dîrekt û oblîk. Zayendên navdêrên xwezayî wekî “mêr” û “jin” diyar in, lê navdêrên eşyayan, yanî tiştên bêgiyan ne diyar in û hewce ye ku zayendên wan bên jiberkirin. Cînavk dikewine tewangê û nîşanî rewş û hejmar didin. Rengdêr du qisim in: Yên yekem ku dikevine kesandinê û yen duyem ku nakevine kesandinê.

Ji bo lêkeran gelek taymetmendî hene. Lêkerekê ji rehendên şexs, hejmar, zayend, dem, rewş û cîhet ve tê kesandin. Sê dem hene: Dema niha, dema bê û dema borî; sê rewş hene: Raweya fermanî, raweya daxwazê, raweya xeberê; du cîhet hene: Lêkerên temam û lêkerên natemam/kêm. Hîndî zimanekî ye ku lêker di dawî de tê bikaranîn.

Hîndî bi alfebeya Devanâgarî (देवनागरी) tê nivîsandin ku ji nivîsîna Brahmî peyda bûye. Çend zimanên din jî hene ku vê alfabeyê adapte kirine û wê bikartînin. Wekî zimanên Marathî, Nepalî, Palî, Konkanî, Bodo, Sîndhî, Maîthîlî, hwd.[20]

**Statûya Wê**

Hîndî Li Hîndîstanê zimanê fermî yê Yekîtîyê Hîndîstanê ye û deh eyalet jî vî zimanê fermî qebûl kirine. Zimanê herî belavbûyî ew e û hejmara kesên ku pê diaxivin ji zimanên din zêdetir e. Li îdareya dewletê, çapemeniyê, perwerdehiyê, sektorên fîliman û şebekeyên civakî de bi berfirehî tê bikaranîn.

Yekîtiya Hîndîstanê dixwaze Hîndî li eyaletên din, nemaze li başûrê jî bê bikaranîn û bibe zimanê hevpar û cihê Îngîlîzî bigire. Lê vê yekê tiştek ne ewqas hêsan e, loma ‘elimandin û belavkirina zimanekî hem dem, hem jî hêzên maddî dixwaze. Ser de jî milletên Dravîd ku zimanê wan ji Hîndî gelek dûr un û ji zemanên berê heta niha bûne xwedî edediyatek gelek bihêz naxwazin bikevine bandora netewîperestên Hîndû-ziman û ji bo nîyetên wan ên dagirker îtiraz dikin.[21] Ji ber van sedeman hukma Îngîlîzî li ser milletên Hîndîstanê hêj jî didome û dibe ku demeke dirêj dê bidome jî.

[20] https://en.wikipedia.org/wiki/Devanagari (15/10/2016)
[21] https://en.wikipedia.org/wiki/Anti-Hindi_agitations_of_Tamil_Nadu (20/10/2016)

**Pirtûkan Rêzimanê Yên Zimanê Hîndî**

Berê zimanê Hîndî ku bûbû zimanê lîngua franka, yanî zimanê muşterek li bakûra Hîndîstanê, milletên Hîndîstanê xwedî tradîsyoneke mezin ya gramerê bûbûn. Bi gotineke din nivîsandina pirtûkên rêzimanan li Hîndîstanê kevneşopiyeke gelek kevnare ye ku hêj jî dewam dike. Em dikarin van pirtûkan bêxin sê beş: (1) Rêzimanên kevneşopî (2) Rêzimanên muqayeseyî û dîrokî (3) Rêzimanên Nûjen û lînguîstîk.

Rêzimanên kevneşopî di çarçoveya Sanskrît de zimanê şîrovê dikin û qaîdeyên wan rêze dikin. Rêzimanên muqayeseyî di fonolojî û peyvsazî de çi guhertin qewimîne îzah dikin û ji bo fîlologan û kesên ku zimanên Aryanî meraq dikin re gelek sûdmend in. Rêzimanên nûjen jî bi nêrîneke ilmî li ser çend mijarên zimanê wekî sentaks an jî teorîyên muxtelif de disekinin û ji bo xwendekaran an jî kesên ku nû destpêkirine faydeya wan zêde ye.

# BEŞA YEKEM

# DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ Û MÎNAKÊN KURMANCÎ

## 1.1. DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ

Ergatîv, bi te’rîfeke herî besît û zelal ve bûyereke gramatîk e û wiha pêk tê: Di demên borî de lêkereke gerhuhêz ne li gorî kirde, lê li gorî bireser tê kesandin.[22] Di Kurmancî de jibona bireseran hem rehenda hêjmarê (yekjimarî û pirjimarî), hem jî rehenda şexsê (şexsên yêkjimar û pirjimar ên yekem, duyem û sêyem) heye. Wextî ku lêker ji van her du aliyan ve bişibe bireserê ew çax ergatîv dertê holê. Ji bilî vê yekê jî çend qertaf jî hene ku nîşanî tewangê dikin û bi kirdeyan ve dizeliqin. Van paşqertafan ku em dibêjin ev in: Jibo kelîmeke nêr -î û jibo kelîmeke mê -ê û jibo kelîmeyên pirjimar jî -an.

Rojhatî xanî ava kir.[23]

Rostemî hesp çêrand.[24]

Hesenî çêlek dot.[25]

Dilşayê sêv xwar.[26]

Berfînê pirtûk xwend.[27]

Gulnîgarê name nivîsî.[28]

Hevalan rojname xwend.[29]

Hevalan rojname xwendin.[30]

Hevalan hêkerûn çêkir.[31]

Wekî ku tê dîtin di nav şeş cînavkên de bireser li gorî kîjan navê were bikaranîn lêker jî li gor wê hatiye kişandin û kirde ji xwe re elametên munasîb ên nêrî, mêtî an pirjimarî wergirtiye. Lê tişteke wiha jî heye ku van paşqertafan wek berê ewqas zêde nayên bikaranîn, nemaze paşqertafa nêrtî û meyla bikarneanîna wan berfirehtir dibe.Bi

---

[22] Kadri Yıldırım, **Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi**, İstanbul: Avesta, 2013, r. 77

[23] Nezîr Ocek, **Waneyên Rêzimana Kurmancî**, İstanbul: Sîtav, 2014, r. 60

[24] b.n., r. 60

[25] b.n., r. 58

[26] b.n., r. 59

[27] b.n., r. 59

[28] b.n., r. 59

[29] Yıldırım, b.n., r. 77

[30] Yıldırım, b.n., r. 77

[31] Ocek, b.n., r. 61

qoleke din îşaretên ku nîşanî ergatîvê didin û bi navên taybet an jî gelemperî ve dizeliqin çiqas diçe kêmtir tên ‘emilandin û di metnên nûjen ên Kurmancî de ev taybetmendî qismen ji holê rabûye.

Silêman gazî min kir.[32]
Rojbîn firavîn xwar.
Diz ketin hûndir û bazinan birin.

Hewce ye ku em xusûsiyetên veguhertina cînavkan baş bizanibin daku em ji ergatîvê baş fêm bikin. Loma cînavkên ku di demên fireh an bê de wek kirde xuya dikin di dema borî de di mewqi’ê bireser de ji xwe cih digirin. Ber’eksiya vê rewşê jî rast e: Bireserên ku di demên fireh û bê de tên şixulandin di dema borî de pozîsyona kirdetî bi dest dixin. Em dikarin ji bo ku mijarê çêtir fêm bikin cînavkan bêxin du beş û ji bona her yekî ji wan navekî cuda bidin:

| **Şexs** | **Cînavkên Koma Yekem (Koma Ez)** | |
|---|---|---|
| | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| **I. Axiver** | ez | em |
| **II. Muxateb** | tu | hûn |
| **III. Xaîb** | ew | ew |

Em ji bo wan dibêjin *koma yekem ên cînavkan*. Em dikaran van wek koma sade an jî koma ez binavbikin.[33] Taybetmeniyê wan ev e ku di demên fireh û bê de temsîlîyetî kirdeyê dikin û di hevokeke ergatîvî de rola biresertiyê dikîzin. Niha jî em li koma din mêze bikin:

| **Şexs** | **Cînavkên Koma Yekem (Koma Min)** | |
|---|---|---|
| | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| **I. Axiver** | min | me |
| **II. Muxateb** | te | we |

[32] Abdullah İncekan, **Geçişli Fiiller ve Ergativ**, İstanbul: Nûbihar, 2010, r. 138
[33] Yıldırım, b.n., r. 33

**III. Xaîb** wî/wê wan

Ewanan tev cînavkên beşa duyem in. Em dikarin wan wek cînavkên koma *min*ê an jî koman tewandî binavkin.[34] Taybetmendiya wan a hevpar ew e ku di dema fireh û bê de temsîlîyetî bireserê dikin û di hevokeke ergatîvî de jî rola kirdetî dilîzin.

Min tu dîtî.
Te ez dîtim.
Ew wî dît.
Wê ew dît.
Me we dîtin.
We em dîtin.
Hûn wan dîtin.
Wan ew dîtin.

Di nav wan mînakan de endamên beşa yekem û duyem bi tevahî hatine nîşandan. Gelek zelal û kifşe ye ku cînavk rolên nuh bidestxistine û kirde bûye bireser û bireser jî bûye kirde.

Fenomena ku ergatîviya Kurdî bitenê di dema borî de xuya dibe tê vê wateyê ku Kurdî zimaneke ergatîvî a qismî ye.[35] Ji xeynê vê yekê jî di dema borî de bitenê lêkerên gerguhez tabiî vê qaîdeyê dibin. Jibo vê xusûsiyetê jî *ergatîva qut kirî* tê gotin (split ergativity).[36]Di mînakên ku me helanîne jêrê peyvekî wek bireser/objeyê xuya nake û jibo vê yekê jî hevahengiya bireser û lêkerê pêk nehatiye lê tenasuba kirde û bireser pêk hatiye. Bi qoleke din lêker hem ji aliyê şexsê, hem jî ji aliyê hejmarê ve di dema borî de jî wek demên fireh û bê li gorî kirdeyê hatiye kesandin.

Ez çend salan li wî bajarî rûniştim.[37]

---

[34] Yıldırım, b.n., r. 33
[35] Ocek, b.n., r. 52
[36] Formal Explanation of Ergativity, http://hindilanguage.info/hindi-grammar/verbs/ergativity/ (19/10/2016)
[37] Celadet Alî Bedirxan, Roger Lescot, **Kürtçe Grameri**, Wer: Kendal Nezan, İstanbul: Avesta, 2012, r. 231

Çend zaro hatin.[38]

Gelek ji wan çûne.[39]

Gustîlk ji tiliya min derket.[40]

Şayirê Heftê Şeref-xane, (…) li Culamerkê ku cihê hukmeta Hekariyane, peyda bûye, (…)[41]

(…) Meleyê Cizîrî di sala 1101 hatîye dunyayê, di sala 1169 mirîye.[42]

Lêkerên ku wek mijara ergatîvî tên hesibandin çar celeb in. Em dikarin wan wiha birêz bikin: Lêkerên besît, lêkerên çêkirî, lêkerên terkîbî û lêkerên îdyomatîk.[43] Mînakên ku helanîne xwarê nîşanî wan cûreyan dide û keyfîyeta wan berbiçav dike.

Rezvanî doşav keland.[44] → Lêkera besît

Şivên şîr vexwar.[45]→ Lêkera besît

Min pirtûk xwand.[46]→ Lêkera besît

We partiyekî pêşverû çêkir.[47] → Lêkera çêkirî

Min xwendekar wekî pênc kom dabeş kirin.[48]→ Lêkera çêkirî

Pez ji zozanan dagerandin deştê.[49] → Lêkera çêkirî

Min mirişk ser jêkir.[50] → Lêkera terkîbî

Destê xwe dirêjî min kir.[51] → Lêkera terkîbî

Te name bi min dan şandin.[52]→ Lêkera terkîbî

---

[38] b.n., r. 231
[39] b.n., r. 232
[40] Yıldırım, b.n., r. 101
[41]Prof. Qanatê Kurdo, Tarixa Edebyeta Kurdi, Ankara: Öz-Ge,1992, r. 16.
[42]b.n., r. 90
[43] Yıldırım, b.n., r. 94
[44] Ocek, b.n., r. 215
[45] b.n., r.  61
[46] b.n., r. 49
[47] Yıldırım, s. 87
[48] b.n., r. 88
[49] b.n., r. 88
[50] b.n., r. 92
[51] b.n., r. 92
[52] b.n., r. 92

Kur nesekinî, bavê lêda.[53]→ Lêkera çêkirî

Ji kerban serê xwe li dîwêr xist.[54] → Lêkera çêkirî

Min cilên xwe li xwe kir.[55] → Lêkera çêkirî

Çawa ku dîtin di daîreya ergatîvê de cûreya lêkerê ne giring e û jibo kesandinê ne asteng e illa bi wî şertî ku lêker gerguhez û di dema borî de bibe. Eger ne wisa be bûyera gramatîk a ergatîvê dernakeve hole an jî ji xwe re hawridoreke munasîb nabîne.

[53] b.n., r. 96
[54] b.n., r. 96
[55] b.n., r. 96

## 1.2. MÎNAKÊN KURMANCÎ

**1)** Ehmedî rojname xwend.[56]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ehmed | -î | rojname | xwend. |

**Şîrove:** Ji ber ku “Ehmed” navekî nêr e û di rola kirdeyê de ye paşqertafa “–î” wergirtiye. Lêker (xwend) li gorî şexsa sêyem hatiye kesandin, loma peyva “rojname” yekjimar e. Herçend ku kirde (Ehmed) û lêker (xwend) ahengdar xuya bibin jî ev ahengdarî ne ji ber kirde (Ehmed) û lêker (xwend) e, lê li saya bireser (rojname) û lêkerê (xwend) ye.

**2)** Ehmedî rojname xwendin.[57]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ehmed | -î | rojname | xwendin. |

**Şîrove:** Ji ber ku “Ehmed” navekî yekjimar e paşqertafa *–î* wergirtiye. Lêker (xwendin) li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye kesandin. Sebeb ew e ku “rojname” bi wateyeke pirjimar hatiye bikaranîn. Ev peyvê ha her çiqas qertafa pirjimarî negirtibe jî fonksiyona pirjimarî bi cih aniye. Em vê yekê ji konteksê fêm dikin loma “rojname” forma lêkerê xistiye pirjimar (xwendin) û di navbera wê û lêkerê de ahengekî ava kiriye. Ew jî ergatîvê pêk aniye.

**3)** Rûkenê çîrok xwend.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Rûken | -ê | çîrok | xwend. |

**Şîrove:** Navê taybet ê “Rûken” kirdeyeke mê ye û ji ber vê yekê paşqertafa “–ê” helaniye. Em dikarin derbarî vê hevokê behsa ahengeke zahirî bikin. Sedem ev e ku lêker (xwend) li binyada bireserê (çîrok) tê kişandin, ne li esasê kirdeyê (Rûken). Livir her du peyv jî sîngular in û lêker jî weka wan yekjimar e. Bi wî terzî li hevokê di

[56] b.n., r. 77
[57] b.n., r. 77

navbera kirde (Rûken) û lêkerê de (xwend) ahengeke tesadufî çêbûye û em bihêsanî bi ergatîvê nahesin. Lê belê hemana ku lêkerê kişandiye û xistiye yekjimar hêmana bireser an jî “çîrok” e, ne hêmana kirde.

**4)** Rûkenê çîrok xwendin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Rûken | -ê | çîrok | xwendin. |

**Şîrove:** “Rûken” kirdeyeke mê ye û wek elametê mêtîyê paşqertafa “–ê” wergirtiye. Peyva “çîrok”ê zahîren yexjimar xuya bike jî peywira pirjimariyê bi cih aniye. Ji ber vê yekê jî lêkera ku wê teqîb dike li gorî bireserê hatiye kişandin û li şûnî sîxeyê “xwend”, bûye “xwendin”.

**5)** Hevalan kovar xwend.

| | | |
|---|---|---|
| Hevalan | kovar | xwend. |

**Şîrove: “**Hevalan” kirdeyeke pirjimar e û paşqertafa “–an” wergirtiye. Bi vî şeklî pirjimariya xwe gelek eşkere kiriye. “Kovar” di mewqiya bireserê de ye û bi vê terzî îhtimal heye ku bibe ya yekjimar ya jî pirjimar. Wextî ku em dimêzînin hêmanên hevokê dibînin ku lêker bi forma “xwend” hatiye kesandin û ew jî tê vê wateyê ku kirde û lêker ne ahengdar in. Ev pirsgirek encax bi vî avayî tê hel kirin ku em bibêjin hevoka ku em behsa wê dikin karakreteke ergatîvî dihewîne û bireser (kovar) ku kelîmekê yekjimar e lêkerê jî (xwend) wek xwe xistiye yekjimar û şibandiye xwe.

**6)** Hevalan kovar xwendin.

| | | |
|---|---|---|
| Hevalan | kovar | xwendin. |

**Şîrove:** Di navberakirdeya “hevalan”û lêkera “xwendin” de ahengdarîyekê heye. Lê sedem ne ew e ku lêker li gorî kirdeyê hatiye kesandin, lê belê biresera “kovar” rola pirjimarî wergirtiye û lêkerê jî wekî xwe xistiye pirjimar. Vêca ev aheng ku ji der ve

xuya dike dibe ku me bixelitîne. Lazim e em bizanibin ku harmonîya hevokê ji pirjimar bûyîna kirde û bireserê pêk tê.

**7)** Azad û Rûkenê gotar xwend.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Azad | û | Rûken | -ê | gotar | xwend. |

**Şîrove:** Wextî ku kirde ji du peyvên ku zayendên wan ji hev cuda pêk were qertafa zayendê diziliqe bi navê duyem re. Ji ber vê yekî navê taybet ê “Rûken”, “–ê” wergirtiye. Peyva “gotar” bi serê xwe ve yekjimarî an pirjimariya xwe diyar nake û em encax bi arîkariya konteksê fêm dikin ka singular e ya plural. Di vê hevokê de bi hêsanî tê fêm kirin ku ev peyv yekjimar e, zîra hêmana lêkerê li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kişandin. Bi gotineke din biresera yekjimar fi’lê jî xistiye yekjimar. Hingê kirde çiqas pirjimar bibe jî kesandina fi’lê bi vê terzî nîşanî saziya ergatîvê dike.

**8)** Rûken û Azadî gotar xwendin.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Rûken | û | Azad | -î | gotar | xwendin. |

**Şîrove:** Wextî ku li hevokekî du an jê zêdetir faîl hebin û cînsîyetên wan hev negirin em paşqertafa zayêndi li gorî kirdeya herî dawî bikartînin. Livir jî “Azad”, navê herî dawî yê silsileya kirdeyê ye û paşqertaf şikla xwe li gorî wî werdigire û pê re ahengdra dibe. Ji ber ku tiştê herî giring di saziya ergatîvê de mutabiq bûyîna bireser û lêkerê ye peyva “gotar”, lêkerê şibandiye xwe û wê xistiye pirjimar. Loma ew bi xwe jî çiqas qertafa pirjimarî negirtibe jî pirjimar e. Bi vî avayî kesandin dibe “xwendin”.

**9)** Te selete tirş kir.[58]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Te | selete | tirş | kir. |

[58] b.n., r. 100

**Şîrove:** Hevokê ha ji bo fêm kirina mentiq û nêrîna ergatîvê pir muhim e loma sentaksa peyvan ku rast neyên fêm kirin me’nakê pir ecêb derdixînin holê. Em dikarin meseleyê wiha îzah bikin: Hevok bi zemîrekî ku girêdayî beşa duyem a cînavkan e dest pê dike. Zemîrên vê beşê tev bireser in û li hemberî beşa yekem an jî beşa “ez” disekinin. Hêmanên beşa yekem çiqas wekî bireserê bên şuxilandin jî di dema borî de û di çarçoveya ergatîvê de roleke nû werdigrin û dibine kirde. Yanî ji xwe re wezîfeyeke cuda heltînin û ji bireserî dûr dikevin û dibine mijara lêkerên gerguhez. Ji ber ku “selete” peyveke yekjimar e lêkerê jî mînandiye xwe û wê jî xistiye yekjmar. Jêderka fi’lê “tirş kirin” e û bi kesandinê bûye “tirş kir”. Diyar e ku lêker ji du hêmanan pêk tê; yekê ji wan nav e û ya din jî lêker e. Em nikarin hêmana ewil biguherînin, loma ew nav e; lê hêmana din lêker e û li gorî bireserê tê kesandin. Bi vî avayî jî ergatîv tehaqquq dike.

**10)** Min goşt sor kir.[59]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Min | goşt | sor | kir. |

**Şîrove:** Li hevokê hêmana herî ewil cînavka “min” e ku ew bi xwe jî ji koma bireserê ye û wek forma tewandî a cînavka şexsa yekem a yekjimarê (ez) ye. Ji ber ku kelîmeya goşt ne pirjimar e, lêker jî di forma yekjimariyê de hatiye bikaranîn û li şonî “sorkirim”, bûye “sor kir”.

**11)** Ew em mezin kirin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Wî | em | mezin | kirin. |

**Şîrove:** “Wî” yekî ji wan cinavkan e ku girêdayî koma duyem a cînavkan e. “Em” jî aîdê cînavkên koma yekem e. Herçend kirde yekjimar bibe jî lêker pirjimar e û vê yekê jî bi bireser ve têkildar e. “Em” livir wek kirde nayê şixûlandin û dibe bireser û ji ber ku ji yekî zêdetir e (herî kêm du kes) lêker jî li gorî xwe dikesîne. Bi vê terzî jî em nabêjin “mezin kir”, lê belê çawa ku bireser iqtîza dike dibêjin “mezin kirin”.

[59] b.n., r. 100

**12)** Min zarok birin malê.[60]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Min | zarok | birin | mal | -ê. |

**Şîrove:** “Min” di pozîsyona kirdeyê de ye û yekê ji cînavkên koma duyem tê hesibandin. Bi vî şiklî ji kirdeyê zêdetir dişibe bireserê, lê li saya saziya ergatîvê em dikarin wê wekî kirdeyê bibînin. “Zarok” peyveke wisa ye ku ne hewce ye em bibêjin pirjimar e. Eslê vê peyvê “zarû” ye û tîpa “–k” livir zaîd e. Ji ber ku objekt pirjimar e lêkera ku ji payê wê tê ew jî sûreta pirjimariyê werdigire. Hêmana herî dawî jî paşqertafa “–ê” girtiye loma wekî biresereke nerasterast hatiye emilandin.

**13)** We mêvan hanî mala wî.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| We | mêvan | hanî | mal | a | wî. |

**Şîrove: “**We” zemîreke wisa ye ku her daîm rola kirdeyê dilîze, lê di dema borî û di çarçoveya ergatîvê de vê rola xwe diterikîne û dibe bireser. Di beşa duyem de yanî di koma “min”ê de ji xwe re cih girtiye. Hêmana ku wê te’qîb dike di pozîsyona kirdeyê de ye û yekjimar e. Me berê jî gotibû ku hêjmara bireserê bandorekê çêdike ser lêkerê û wê li gorî xwe yekjimar an jî pirjimar dike. Ji ber vê yekê li şûnî forma “hanîn” ku zemîra “we” dixwaze, forma “hanî” tê bikaranîn; çawa ku peyva mêvan îqtîza dike. “Mal” kelîmeyeke mê ye. Loma wextî dikeve nava terkîbekê li gorî zayenda xwe paşqertafa “–a” werdigre. Di Kurmancî de zemîrên ku nîşanî xwedî bûnê dikin û zemîrên ku rola biresertiyê dilîzin yek in. Bi wî avayî “wî” dibe xwedyê du wateyan: wî (bi Îngilîzî: him) û ya wî (bi Îngilîzî: his).

**14)** Wî ez ji odê derxistim.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Wî | ez | ji | odê | derxistim. |

[60] b.n., r. 100

**Şîrove:** Lêker ji koma duyem a cînavkan e. Yanî ev zemîr ji xeynê dema borî her daîm di wezîfeya bireserê de ye. Bireserê hevokê jî ber ‘eksiya wezîfeya xwe ya gelemperî di rola kirdetiyê de ye. Bi vê terzî dibe faîl ango çêkirînerê lêkerê. Di vê mînakê de em dibînin ku kirde bûye bireser û bireser jî bûye kirde, yanî rolên hev veguhastine. Wateya “ji” derketin ji tiştekî an jî cihekî ye (ablatîf). Weqtî “ji” were berê kelîmeyek, kelîmeya ku wê te’qîb dike dikeve tewangê. Livir jî “ode” şekla xwe ya esl wenda kiriye û bûye “odê”. Hêmana dawî ku cinsa wê lêker e li gorî bireserê sûret girtiye û elaqeya xwe bi kirdeyê ve ji dest daye. Di encamê de li şûnî “wî…derxist”, forma “ez…derxistim” pêk hatiye.

**15)** Zozanê gustîlk ji tiliyên xwe derxistin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Zozan | -ê | gustîlk | ji | tili | yên | xwe | derxistin. |

**Şîrove:** “Zozan”, bi zayenda xwe ya mê paşqertafa “–ê” wergirtiye. “Gustîlk”, çiqas bi formeke yekjimar xuya bibe jî peywira wê pirjimarî ye. Vê yek’e ji hêmana dawî ango lêkerê xistiye bin bandora xwe û li cihê “derxistê” wê aniye forma “derxistinê”. Yanî lêkerê ji kirdeyê birrîye û têkiliya wê bi kirde re nemaye. Peyva “tiliyan” bûye parçeyek ji ravekê û ji rûyê “xwe” forma “tiliyên” derketiye meydanê. “Xwe” peyvekê ye ku navdarên berê xwe têxe aîde xwe an jî di hevokê de hereket dîsa dizivire faîlê. Eger em di daîreya vê hevokê de bifikirin em dikarin bêjin ku kesê ku ji tiliyan gustîlk derxistiye Zozan e û tiliyan jî aîde Zozanê ne.

**16)** Bavê min ez di şikeftê de hîştim.[61]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Bavê | min | ez | di | şikeftê | de | hîştim. |

**Şîrove:** Peyva “bav” giredayî şexsa yekem e û bi zemîrê “min”ê ve ketiye tewangê û li gorî zayenda xwe paşqertafa “–ê” wergirtiye. Livir faîl ji du peyvan pêk tê: “Bavê min”. Ez her çiqas ji koma zemîran ên yekem bibe jî livir rola bireserê leyistiye û lêkerê kesandiye. Îsbata vê yekê ev e ku lêker bi forma “hîştim” hatiye nîşandan. Di

[61] b.n., r. 102

Kurmancî de daçeka mekan an jî rewşa lokatîfê bi arîkariya du peyvên piçûk tê pêşkêş kirin: “di…de”. Loma em jî di şemayê de ji bo van her du peyvan du beşên cuda vekirine. Ji ber ku halê lokatîfe navderekî têxe tewangê “şikeft” bûye “şikeftê”.

**17)** Wê gelek caran ez tirsandime

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Wê | gelek | caran | ez | tirsandime. |

**Şîrove:** Cînavka *wê* cihê navdêrên mê digire û aîda koma duyem ên zemîran e. Bi vî terzî ew ne kirde ye, lê bireser e. Lê di çarçoveya ergatîvê de roleke nû werdigire û dibe kirde û bi kesandinê lêkerê ve taybetmendiyeke xusûsî peyda dike. *Ez* asayî ji koma yekem a cînavkan e û dikare lêkerê bikesinîne. Lê belê ev zemîr jî çawa ku ergatîv iqtiza dike ji kirdetiyê dertê û derbasî biresertiye dibe û bi vî terzî koma xwe diguherîne. Hemin ku ev qaîde eşkere ye em dikarin bêjin ku *tirsandime* vedigere cînavka sêyem ê yekjimar û qet’en aîde şexsa yekem ê yekjimar nîne. Lêker jî ne sade ye, lê saziya wî jî demên cuda pêk tê. Terkîba wê bi vê şiklî ye: *tirsandim* dema bôri a diyar e. Paşqertafa –e wateya lêkerê ji dema borî aniye dema niha û bandora lêkerê berfirehtir û domdartir xistiye. Bi qoleke din lêker her çiqas di demeke borî de pêk were jî tesira wê hêş jî didome û hêza xwe wenda nekiriye.

**18)** Ji xwe serê min diêşiya, te bêtir êşand.[62]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ji | xwe | serê | min | diêşiya, | te | bêtir | êşand. |

**Şîrove:** Saziya hevokê ji du cumleyên cuda pêk tên, yanî du lêkerên serxwe hene. Lêkera ewil herçend di forma dema borî de bibe jî bi kirdeyê re ahengdar e. Sedem ew e ku ew negerguhez e û bi tu awayî bireser nagire. Wextî lêker bi xwe ve mefûl an jî objeyekê negire ew çax ahengdariya lêker û bireserê teheqquq nake û bi awayekî siriştî harmonî, navbera kirde û lêkerê de çêdibe. Te’bîra “ji xwe” te’bireke îdyomatîk e ku tê wateya “zaten”. Kelîmeya “ser” bi cînavka “min” ketiye ravekê û li gorî cînsîyeta xwe paşqertafa “–e” helaniye. “Diêşiy”a sîxeya dema borî a berdewam e

[62] b.n., r. 102

û ji jêderka “êşîn”ê tê û li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kesandin. Lêker me’naya berdewamiyê îma dike. Çawa ku me di mînakê borî de gotibû livir jî lêker ji du demên cuda pêk tên û terkîbekê derdixînin holê: dema borî û dema niha. Qisma herî bingehî ku me elaqeder dike qisma duyem a hevokê ye. Livir te rola kirdeyê pişt kiriye, lê ew bi xwe ji koma cînavkên bireserê ye. “Êşand” livir vedigere raveka “serê min” a cumleya ‘ewil û bi şexsa sêyem a yekjimar ve têkildar e. “Bêtir” ji peyva “behtir”ê tê. Yanî tiştek çêtir bibe jê re bêtir tê gotin. Lê livir me’naya xwe a esil wenda kiriye û ji xwe re menayeke nû wergirtiye: zêdetir, pirtir.

**19)** We ji mamosta çi pirsî?[63]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| We | ji | mamosta | çi | pirsî? |

**Şîrove:** “We” ji koma duyem a cînavkan e. Her çiqas bireser bibe jî di çarçoveya ergatîvê de rola kirdeyê wergirtiye. Cînavka pirsê “çi” cihê peyveke yekjimar digire û ji ber vê yekî jî divê ku lêker jî bibe yekjimar. Forma “pirsî” li şûna “pirsîn” jî rewşa ha îzah dike û netîceya vê qaîdeyê ye. Lêkera “pirsin” li Kurmancî edata “ji” îqtîza dike lê mesela li Îngîlîzî “to” yanî datîf dixwaze. Ew jî nîşan dide ku li her zimanê mentiq û bikaranîna edatan hev nagirin an jî ji hev gelek dûr û cuda ne.

**20)** Nexweş şirûb venedixwar.[64]

| | | |
|---|---|---|
| Nexweş | şirûb | venedixwar. |

**Şîrove:** Hêmana ewil navdêreke gelemperî ye. Ji bom e fêmkirina hejmara wê ne hêsan e. Bi gotineke din em bitenê bi mêzekirina forma wê fêm nakin ka ew yekjimar e, an jî pirjimar. Hingê em hewcedarê konteksê ne. Yanî j ime re lazim e ku em li derûdora peyvan bimeyzînin daku derbarî vê peyvê agahiyên saxlem peyda bikin. Livir dibe ku naxweş bitenê şexsekî bibe yan ji şexsekî zêdetir. Em ji bo tesbîta hejmarê bi awayeke tekûz di du hêmanên din de jî zêde agahî nabînin. Peyvên *şirûb* û

[63] b.n., r. 103
[64] b.n., r. 107

*venedixwar* jî ji kirde cudatir in loma em dizanin ku di ergatîvê de bireser û lêker bi kirdeyê ve elaqedar nînin û jê dûr timînin. Ew çax hejmara faîlê bitenê ji hêla axivker û muxateb ve tê zanîn û ji bo me ne pêkan e ku em vê yekê bi qetîyet bizanin. *Şirûb* vexwarinekî ye û tiştên ku em vedixwun nayên hejmartin û bi vî şiklî em wê yekjimar dihesibînin. Lêker jî di formeke terkîbî de ye û ji du demên cuda pêk tên: Dema borî û dema niha.

**21)** Min ji wî re behsa serpêhatiyên xwe kirin.[65]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | ji | wî | re | behsa | serpêhatiyên | xwe | kirin. |

**Şîrove:** "Min" ku di mewqia kirdeyê de ye û yekê ji koma duyem a cînavkan e di halê xwe ya tebîî de bireser e. "Ji…re" ji daçekan du parçeyî ye û ji wan parçekê berê navdêrê û a din jî li piştî wê rotîne. Li vir wateya van daçekan "berêxwedan" (datîf) e. Weqtî em van daçekan bikartînin ew dikevin tewangê û ji beşa yekem a cînavkan dertên û dikevin beşa duyem an cînavkan. Bi gotineke din em nikarin bibêjin "ji ez re". Tiştî rast ew e ku em bibêjin "ji min re". Kelîmeya "behs"ê bi lêkereke ve dibe munasîbetdar û lêkereke terkîbî çêdike. Sûreta tekûz a vê lêkerê wiha ye: "behsa tiştekî kirin". Peyva "serpêhatiyan" bi kelîmeya ku wê te'qîb kiriye ketiye tewangê û paşqertafa xwe ya "–an" wenda kiriye û cihê xwe heştiye jibona paşqertafa "–en"ê. Pirjimar bûyîna bireserê 'eynen ser lêkerê jî peyda bûye û lêker li şûnî şexsa yekem a yekjimar forma şexsa sêyem a pirjimar wergirtiye.

**22)** Wan av vexwaribû.[66]

| | | |
|---|---|---|
| Wan | av | vexwaribû. |

**Şîrove:** "Wan" ji zemîren cînavkî ye ku wan her tim (ji xeynî dema borî) di rola kirdetiyê de dimînin. Bi gotineke din cînavkên han wekî koma duyem tên binavkirin û endamên vê komê di demên borî û di şûbeyên wê de çiqas wekî bireser xuya bibin jî di

[65] b.n., r. 110
[66] b.n., r. 112

rol û wezîfeya kirdetiyê de disekinin. Sedema vê yekê saziya ergatîvê ye. Ji aliyê hejmarê ve navbera bireserê “av” û kirdeya hevokê “wan” nakokiyek xuya dike. Li vir em rastî pirsgirekeke mezin tên: Gelo lêker li gorî kîjan hêmanê tê kesandin? Li gorî kirde an jî bireser? Helbet li gorî bireser. Em di dawiya hevokê de dibînin ku peyva “av” bi yekjimar bûna xwe bandorek li ser lêkerê çêkiriye û wê jî xistiye yekjimar. Bi îlawe kirina “bû”yê jî lêker bûye lêkereke terkîbî.

**23)** Berî ku ez biçim Başûr, min pirtûkên soranî nedîtibûn.[67]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Berî | ku | ez | biçim | Başûr | min | pirtûkên | soranî | nedîtibûn. |

**Şîrove:** Hevok ji du parçeyan pêk tê ku yekê ji wan parçeya esil û a din jî parçeya arîkar e. Qisma ewil raweya daxwazê dihewîne (biçim). Sedema vê teserrufê daçeka “ku” ye ku rola wî girêdayîn a îfadeyan e. An jî em dikarin bibêjin ku ev peyv yekî ji taybetmendiyên karakterîstîk ên zimanên îranî ye û derbarî lêkrê agahî dide ku ew hêş teheqquq nebûye û bitenê ji nîyet, hizr, gelale, plan û armanc îbaret e. Peyva “Başûr” naveke taybet e û çawa ku “b” mezin e hewce ye ku em herfên herî ewil bi tîpên mezin binivîsin. Livir peyva “Başûr” berêxwedanê îma dike û di halê datîfê de ye. Beşa duyem a hevokê bi cînavkeke bireserî a “min” destpêkiriye. Livir zemîr rola kirdetiyê lîstiye û tu bandora wê li ser lêkerê hasil nebûye. Terkîba “pirtûkên Soranî” di rola objeyê de ne û hêmana ku şiklekî dide lêkerê ew e. Ji ber vê yekê jî lêkereke ku girêdayî şexsa yekem a yekjimarê ye li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye kesandin.

**24)** Me tirba Feqiyê Teyran li Miksê ziyaret kiriye.[68]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Me | tirba | Feqiyê | Teyran | li | Miksê | ziyaret | kiriye. |

**Şîrove:** “Me” ji koma duyem a cînavkan e. Bi vî terzî wekî endamekî ji cînavkên bireser bê hesibandin jî di saziya ergatîvê de wesfa çêkerê werdigire. “Tirba Feqiyê Teyran” îfadeyeke zencîrî ye ku ji sê peyvan pêk tê. Ji ber ku bireser yekjimar e

---
[67] b.n., r. 113
[68] b.n., r. 116

lêker jî bi xwe bûye sade / yekjimar. Hokera ku nîşanî cihê dide “li Miksê” ye. Li vir sedema tewangê nava taybet ew e ku li berê wê daçeka “li” hatiye bikaranîn. Hêmana herî dawî a hevokê lêkera terkîbî a “ziyaret kirin” e ji du demên cuda ve teşkîl dibe: Dema borî a dîyar û dema borî a nediyar. Bi qoleke din saziya forma “kiriye” kompleks e û bikaranîna du demên ku me behs kiriye îşaret dide ku lêker her çiqas di dema borî de çêbibe jî bandora wê berdewam e.

**25)** Min gelek bajarên mezin dîtine lê min Stenbol nedîtiye.[69]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | gelek | bajarên | mezin | dîtine | lê | min | Stenbol | nedîtiye. |

**Şîrove:** “Min” ji koma duyem e. Çiqas bireser bibe jî wekî kirde hatiye şixulandin. Ji ber peyva “gelek” peyva “bajar” pirjimar bûye û ji xwe re –an wergirtiye. Lê wextî bi sifetekî ve têkildar bûye û ketiye ravekekî paşqertafa –an bûye –ên. Bireser (bajarên mezin) û lêker (dîtine) ketine harmoniyê û ji aliyê şexsê û hejmarê ve şibîne yekûdû re. Edata girêdanê a “lê” du hevokan ji hev cihê kiriye. Hevoka dûyem careke din jî bi zemîrê “min” dest pê kiriye. Çawa ku di cumleya berê de wezîfeya kirdetiyê helanîbû livir jî wisa rola faîltiyê li xwe girtiye. Stenbol peyveke yekjimar e û lêkera ku wê dişopîne jî bûye yekjimar. Her du lêkerên hevokê jî di forma terkîbiyê de ne û di naveroka xwe de du zemanên cuda îhtîwa dikin.

**26)** We gul didîtin.[70]

| | | |
|---|---|---|
| We | gul | didîtin. |

**Şîrove** “We” ji koma duyem a zemîran e. Her çiqas bi wateya bireserê ve xuya bibe jî çawa saziya ergatîvê dixwaze wezîfeya kirdetiyê helaniye. “Gul” pirjimar hatiye bikaranîn. Em dikarin vê yekê, yanî pirjimar bûyîna vê peyvê ji lêkera ku wê dişopîne bi hêsanî fêm bikin. Lê livir pirsgirekeke heye: Gelo pirjimarî ji rûyê kirdeyê ye an jî giredayî bireserê ye? Bersiv ew e ku ahengdariya kirde û lêkerê tesadufî ye û navbera

[69] b.n., r. 118
[70] b.n., r. 121

wan du peyvan tu têkiliyek tûneye. Lêker li gorî şexsa sêyem a pirjimar ve hatiye kesandin, ne li gorî şexsa duyem a pirjimar. Ji xwe berî her tiştan hevok bi “we” hatiye nivîsandin ku ew îşareta ew e ku saziya ergatîvê dê were bikaranîn. Êdî lêker û bireser çiqas hevûdû bigirin jî em dizanin ku lêker di bin bandora bireserê ye, ne bin bandora kirdeyê.

**27)** Berfînê hinek pere ji min deyn kiriye.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Berfîn | -ê | hinek | pere | ji | min | deyn | kiriye. |

**Şîrove:** “Berfîn” kirdeyeke mê ye û bi vê şiklî ji xwe re paşqertafa “–ê” wergirtiye. Hêmana “hinek pere” bireser e û parçeya ku lêkerê dişibîne xwe ew e. Çawa ku ew yekjimar e lêkerê jî xistiye yekjimarr û şexsa sêyem a yekjimar. Di hevokê ahengekî xuya dike û dibe ku vê yekê me şaş bike lê ew ahengdariya navbeyan bireser û lêkerê ye, ne harmoniya kirde û lêkerê. Wextî ku em bizanibin ku di saziya ergatîvê de bireser û lêker ji her aliyan ve hevûdû digirin ew çax em dikarin xwe ji van şaşîtîyan biparêzin. Lêker, xwedî formeke terkîbî ye û ji du demên cuda pêk tê. Ew jî dema borî û lêkera qertafî ne.

**28)** Rengê dîwaran zer bû, kê ew sor kirin?[71]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Rengê | dîwaran | zer | bû, | kê | ew | sor | kirin? |

**Şîrove:** Livir du qism hene û “rengê dîwaran” ravekeke navderî ye û kirdeya hevokê jê teşkîl dibe. “Zer” wezîfeya hevalnaviyê pişt dike û “bûyîn” jî li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kesandinê forma “bû” bi dest xistiye. Qisma duyem a hevokê bi “kê” dest pê kiriye ku ew forma tewangbûyî a “kî”yê ye. Bi vê terzî ji xwe re taybetmendiya cînavkan bireserê wergirtiye. Peyva “ew” ji konteksê xwe kifş nake ka yekjimar e an jî pirjimar e. Em hewcedarî nişaneyan in daku em vê muemmayê çareser bikin. Di vî halî de terkîba “rengê dîwaran” yekjimar bibe jî peyva “dîwaran” pirjimar e û bi hêsanî em dikarin bibêjin ku cînavka “ew” derbasî cihê wê bûye. Hemin ku bireser

[71] b.n., r. 161

pirjimar e divê ku lêker jî pirjimar bibe. Peyva “sor” jî keyfîyeta û çawabûna lêkerê vedibêje û bi vê terzî wezîfeya hokeriyê helaniye.

**29)** Bavê min ji dara ber mala me çar gopal çê kirin.[72]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Bavê | min | ji | dara | ber | mala | me | çar | gopal | çê | kirin. |

**Şîrove:** “Bavê min” di pozîsyona kirdeyê de ye û ravekekî ye ku şexsa sêyem a yekjimar îfade dike. Gumlata peyvan a “ji dara ber malê me” nîşanî çavkaniya “gopalan” dike û ji ber ku wekî bireser nayê hesibandin li ser lêkerê bandorekî çênake. “Çar gopal” bi xwe bireser e û beyanî pijimariyê dike û lêkerê jî wekî xwe xistiye pirjimar. Bi qoleke din herçend kirde yekjimar bibe û mentiqa me forma “kir” îqtîza bike jî ji bona hemahengiya bireser û lêkerê em sîxeya “kirin” bikartînin. “Çêkirin” lêkereke îdyomatîk e ji du peyvên cuda pêk tên: çê (baş, çak) û kirin. Peyv çiqas wekî “başkirin” xuya bike jî me’na gelemperîtî peyda kiriye û niha cihê “kirin”ê digire.

**30)** Rojnamevanî wêne bi dizî kişandin.[73]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Rojnamevan | -î | wêne | bi | dizî | kişandin. |

**Şîrove:** “Rojnamevan” li pey xwe paşqeratê “–î” wergirtiye û bi vê terzî kirde bûyîna xwe bi hêsanî eşkere kiriye. Her çiqas wêne paşqertafa pirjimartiyê negirtibe jî bi nêzîkayikî analîtîk kifşe dibe ku ew wekî peyveke pirjimar hatiye şixulandin. Bi vê avayî bandorek çêkiriye li ser lêkerê û forma pirjimariyê daye wê. Di encamê de li şûnî “kişand”, “kişandin” derketiye holê. Wextî “bi” li cem navan, bi taybet jî li cem navên neberbiçav were bikaranîn rola hokertiyê dilîze û ji me re derbarî çawaniyê fi’lê agahî dide. Livir em bi îfadeya “bi dizî” em hîn dibin ku lêker bi sûreteke mexfî hatiye bicîhanîn.

**31)** Min tu dîtî.[74]

[72] b.n., r. 161
[73] b.n., r. 174
[74] W. M. Thackton, **Kurmanji Kurdish, A Reference Grammar with Selected Readings**, c.n, t.n. r. 18

| | | |
|---|---|---|
| Min | tu | dîtî. |

**Şîrove:** Ev mînak ku di kitabên rêzimanê de gelek caran dertê pêşiya me taybetmendiyên gelemperî ên ergatîvê dihewîne û ji ber vê yekî jî pir balkeş e. Kelîmeya ewil eslen bireser û kelîmeya duyem eslen kirde ye lê belê her du jî ber eksiya zahirên xwe rolên nû bidest xistine. Eger em nizanibin ku qaîdeya ergatîvê wezîfeyên cînavkan diguherîne ew çax dibe ku em menaya hevoke tam fam nekin an jî şaş fam bikin. Zîra livir "min" fonksîyona "ez"ê bi cih tîne û "tu" jî rola "te"yê dilîze. Heke wisa be her du peyv wezîfeyên xwe yên eslî wenda kirine û "min" wekî kirde û "tu" jî wekî bireser hatiye bikaranîn.

**32)** Rîskeke mezin hebû ku wan ez tewqîf bikirama.[75]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Rîskeke | mezin | hebû | ku | wan | ez | tewqîf | bikirama. |

**Şîrove:** Daçeka "ku" nîşan dide ku hevok ji du qisman teşkîl bûye û qisma duyem saziya ergatîvê îhtîwa dike. Lêkera duyem "bikirama" raweya daxwazê ye û nikare bi serê xwe ve wateyeke tekûz beyan bike; loma bitenê bi arîkariya qisma yekem û lêkera ewil tê famkirin. Heta ku em beşa duyem dixwînin em nizanin ku "rîska mezin" ku di beşa yekem de derbas dibe kê elaqedar dike. Peyva herî ewil a beşa duyem (wan) cînavkekî ye ku girêdayî koma beşa duyem a cînavkan e. Yanî eslen bireser e. Lê dîsa jî wekî kirde hatiye bikaranîn. Peyva ku wê dişopîne jî (ez) eslen kirde ye û girêdayî koma yekem a cînavkan e lê wekî bireserê hatiye şixulandin.Ev têkîliya kompleks a cînavkan li ser lêkerê jî xuya dibe zîra lêker li şunî kirdeyê ku jê hinek dûr dimîne ji hêla bireserê ve tê kesandin ku ew jê re nêziktir e. Livir raweya daxwaziyê nîşan dide ku lêker teheqquq nekiriye. Wekî tê zanîn di beyana nîyetan, pêşnûman, îhtîmalan, arzûyan û xeyalan de em sîxeya xeberê bikar naynin. Li cihê wê raweya merc û daxwazê dixebitînin. Di vê kontetksê de "tewqîf" anjî hatina binçavkirinê çiqas rîskeke mezin bibê jî pêk nehatiye û hêş teheqquq nekiriye.

[75] b.n., r. 65

**33)** Ew nivîsarên ku ji Hawarê re dihatin şandin, berî ku bihatana weşandin kesî ew di ber çav re derbas dikirin?[76]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Kesî | ew | di | ber | çav | re | derbas | dikirin? |

**Şîrove:** Peyva "kes" wekî nîşaneya ergatîvê ji xwe re paşqertafa "-i" wergirtiye. Livir em dibînin ku zemîra nebinavkirî a "kes" wekî peyveke nêr hatiye qebûl kirin. Kelîmeya ku wê te'qîb dike di forma kirdeyê xuya bike jî ji cihê xwe û ji pozîsyona xwe diyar dike ku di rola bireserê de ye. Daçeka "de…re" nîşanî ablatîfê dike ku wate ji cihekî derketin û ji mekanekî dûr bûyîn e. "Debas kirin" lêkereke gerguhêz e û bi vê terzî ji xwe re bireserekî îqtîza dike. Dem ji demên cuda pêk tê û di dema borî de îşaretî berdewamiya dike. Yanî lêker wisa ji nişka ve neqediyaye û di dema borî de hinek domiye û wexteke kin an dirêj berdewam bûye.

**34)** Wan mala wî şewitand.[77]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Wan | mala | wî | şewitand. |

**Şîrove:** Hêmana herî ewil a hevokê "wan" e ku cînavka herî dawî a koma duyem, an jî koma "min"ê ye. Peyv çiqas wekî bireserê xuya bike jî cihê kirdeyê girtiye û lêker ji hêla wê hatiye kesandin. Peyvên "mal" û "wî" bi hev re hatine bikaranîn û ravekekî çêkirine û bi vê terzî têkîliya xweyî bûnê nîşan daye. Ji ber ku "mal" peyveke mê ye paşqertaf jî li gorî wê bûye "-a", ne "-ê". Ji ber ku bireser yekjimar e, bandoreke li ser lêkerê çêkiriye û wê jî xistiye bireser. Bi qoleke din "wan" çiqas kirde bibe û ji aliyê hejmarê pirjimar bibe jî lêker li gorî bireserê hatiye kesanin û yekjimar maye. Bi bî awayî jî "şewitand" hatiye bikaranîn, ne "şewitandin".

**35)** Ji alîkî, ji hevalan bi dûr diketim, ji aliyê din birîna hêta min ez diêşandim…[78]

[76] b.n., r.66
[77] b.n., r. 70
[78] b.n., r. 87

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ji | aliyê | din | birîna | hêta | min | ez | diêşandim. |

**Şîrove:** "Alî" tê wateya "teref" an jî "hêl" û çawa ku îqtîza dike wisa jî li gorî zayenda xwe "-ê" wergirtiye. Daçeka "ji" têkîliya derketinê nîşan daye û bi du peyvên ku wê dişopînin tevayîkî çêkiriye. Sê peyv hene ku ri rola kirdeyê de ne: "Birîna hêta min". Ev komek li cihê şexsa yekem a cînavkan digire. "Hêt" peyveke mê ye û bi vê taybetmendiya xwe û di ravekan de paşqertafa "a" heltîne. Peyva ku rola biresertiyê dilîze cînavka "ez"ê ye û forma wê çiqas bişibe kirdeyê jî wateya biresertiyê beyan dike. Hêmana herî dawî a hevokê lêker û ne ji hêla kirdeyê ve ku nîsbeten jê dûr e lê belê ji hêla bireserê ve ku nêzîkê wê ye tê kesandin. Di saziya ergatîvê de tiştê ku ji me re ecêb tê jî ev e.

**36)** Gelek rojên xweş û pir rojên reş min li Amûdê derbas kirin.[79]

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Gelek | rojên | xweş | û | pir | rojên | reş | min | li | Amûdê | derbas | kirin. |

**Şîrove:** Bireser ku ji komeke dirêj a peyvan pêk tê di serê hevokê de bicîh bûye û bi vê terzî nimûnekî xweş çêbûye jibona hevokên qelibandî. "Gelek rojên xweş û pir rojên reş" di formeke pirjimar de ye û ji ber qelibandî bûna xwe çiqas ji lêkerê dûr ketibe jî hêmana ku wê dişekilîne ew e. "Min" peywirabiresertiyê winda kiriye û wezîfeya faîltiyê wergirtiye. "Li Amûdê" hokera demê ye û tu tesîrekî li ser lêkerê pêk neanîye. "Derbas kirin" lêkereke terkîbî ye û bi formeke kesandî derketiye pêşiya me: Dema borî; şexsa pirjimar a sêyem. Ev sîxe, çawa ku em li jor de jî gotibûn, di çarçoveya ergatîvê de bi bireserê ve têkîldar e û elaqekekî a wê bi "min", an jî bi kirde ve nemaye.

**37)** Rojekê ji nişka ve cewrikekî –Xwedê zane ê kwîr bû– ji paş ve bi hêta min girt û ez birîn kirim.[80]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ji | paş | ve | bi | hêta | min | girt | û | ez | birîn | kirim. |

[79] b.n., r. 87
[80] b.n., r. 87

**Şîrove:** Livir du hevok hene ku bi "û"yê ji hev cihê bûne. "Ji…ve" çiqas ji du daçekan pêk bê jî her du bitenê nîşanî yek wateyekî dikin: Cihet û alî. Hingê em fêm dikin ku "cewrik" ji paş ve êrîşî zilamê kiriye. Taybetmendiyek din jî xuya dike daçeka "bi" li cem lêkera "girtin" hatiye bikaranîn û mena nêzikî îdyomê bûye. Em dikarin bêjin ku hereketa girtinê ji nişka ve pêk hatiye. Di hevoka ewil de herçend kirde û fî'l hevaheng bibin jî ev harmonî ne ji ber wan e, lê girêdayî bireser û lêkerê ye. Bi gotineke din em dikarin jibona pirsa "Kîjan hêman ev harmoniya ku di hevokê da xuya dike pên aniye? Lihevhatina kirde û lêker, an jî lihevhatina bireser û lêker?" wiha bersiv bidin: "Helbet ahenga bireser û lêker." Di qisma duyem de "ez" zemîra yekem a koma ezê ye. Ji ru ve çiqas wekî faîl bixuye jî li gorî karaktera ergatîviyê wateya biresertiyê qezanç kiriye û bandor li lêker kiriye. Eger em ji qaîdeyên ergatîvê agahdar nebin dibe ku em hevokê bi xeletî fêm bikin û wê berevajî menaya xwe ya esil şîrove bikin.

**38)** Xwedê em ji herî û çiravê parastin, baran ne bariya.[81]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Xwedê | em | ji | herî | û | çiravê | parastin, | baran | ne | bariya. |

**Şîrove:** Hevok ji du beşan pêk tê û qisma duyem, ji ber ku lêkereke gerguhêz nahewîne nîşanî taybetmendiya ergatîvê jî nade. Wextî ku em unsurên hevoka ewil bidin ber tehlîlê hebûna ergatîve bi hêsanî eşkere dibe. Loma "Xwedê" çiqas wekî zemîr a sêyem a yekjimar bibe jî bandoreke li ser lêkerê çênekiriye. Hêmana ku lêkerê dişekilîne "em" e. "Em" esl û esasê xwe de kirde bibe jî ji aliyê wate ve rola biresertiyê lîstiye û fonskiyona xwe ya di çarçoveya ergatîvê bicîh aniye û lêkerê xistiyê forma zemîra yekem a pirjimar. Livir hewcê ye ku unsurên ku bireserê pêk tînin (herî û çirav) çi bandoreke li ser lêkerê çênekirine. Van peyvan çiqas bi hev re wateya pirjimarîyê çêbikin jî kesandina lêkera "parastin"ê bitenê bi zemîra "em"ê elaqedar e.

**39)** Bi lez û bez min xwe gihand cem tixtor.[82]

---

[81] b.n., r. 88
[82] b.n., r. 88

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Bi | lez û bez | min | xwe | gihand | cem | tixtor. |

**Şîrove:** Çar peyvên ewil ku terz û sûreta çêkirina lêkerê rûşen dikin hoker in û wekî hokerên rewşê tên hesibandin. Di Kurmancî de îfadeyên cotî an jî kelîmeyên ku hevûdû teqîb dikin pir belavbûyî ne. “Lez û bez” jî yek ji wan tekraran in ku çiqas ji du peyvên cuda jî pêk bên wateya wan yek e. Bi daçeke pratîk e ku bi saya wê em ji navên neberbiçav dikarin hoker çêbikin. Peyva “min” di zahîr de wekî mefûl xuya bibe jî wezîfeya kirdetiyê îşxal kiriye. Hêmana ku ji piştî wê tê (xwe) beyanî rewşa vegerdariyê dike û ew hêman e ku lêkerê dişêwîne. Her çiqas ev unsur cihê şexsa yekem a yekjimar girtibe jî ji ber ku mesele bi awayeke nerasterast hatiye neqil kirin lêker jî li gorî wê li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kesandin. Hêmanên din ku têkîliya wan bi biresertiyê ve tûne ye bandora wan li ser lêkerê jî çênebûye.

**40)** Roja din em gihiştin Dêrîkê, li ba hevalekî bûm mêvan, lê bi şev xewnine bi tirs ez vediciniqandim.[83]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Lê | bi | şev | xewnine | bi | tirs | ez | vediciniqandim. |

**Şîrove:** Weqtî ku daçeka “bi” bi peyvekî ku demê radigihîne tê bikaranîn zerfekî dertê holê. Livir îfadeya “bi şev” tê vê wateyê: wextî ku şev dibe, dema şevê de, bi hatina şevê ve. Peyva din ku vê te’qîb dike ji kelîmeyekî û ji qertafekî pêk tê: “xewn” û “–ine”. Ev qertaf ku bi kelîmeyekî ve bê zeliqandin wateya “çend, hinek, qismekî” lê zêde dike. “Bi tirs” ji me re derbarî keyfîyeta navderê agahî dide û bi vê terzî wekî sifet hatiye bikaranîn. Hêmana din, yanî ez her daîm wekî kirde an jî faîl tê şixulandin. Îstîsna ew e ku di hevokên dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz wateya xwe ya esil wenda dike û wekî bireserê tê emilandin. Hêmana herî dawî jî lêkereke terkîbî ye û ji du deman teşkîl bûye: dema borî a dîyar û dema borî a berdewam. Çiqas faîlê hevokê,xewnine, ji peyveke pirjimar pêk bê jî lêker ne pirjimar e. Bi gotineke din navbera kirde û lêkerê hevahengî çênebûye. Li şûna vê yekî ahengdarî navbera bireser û lêkerê qewimiye û forma “vediciniqandim” derketiye holê ku li gorî şexsa yekem a

[83] b.n., r. 88

yekjimar hatiye bikaranîn. Hemin ku wisa ye kesî ku tirs ketiye dilê wî şexsa yekem e, ne kesekî din.

**41)** Min fam kir ko buhara Eyndîwerê bihareke welatî ye.[84]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | fam | kir | ko | buhara | Eyndîwerê | bihareke | welatî | ye. |

**Şîrove:** Hevok bi peyveke wisa destpêkiriye ku di eslê xwe de çiqas bireser bibe jî wezîfeya kirdetiyê wergirtiye. “Fam kirin” lêkereke hevedudanî ye û li gorî şexsa sêyem a yekjimar û di dema borî de hatiye kesandin. Livir, hêmana ku lêkerê dikesîne berovajî mînakên ku me berî dîtibûn e, loma ji peyvek an jî peyvên mueyyen teşkîl nebûye. Rêza peyvan ku piştî daçeka “ko” hatine wekî bireser hatine qebûl kirin û lêkerê kesandine. Bi vê terzî em dikarin bêjin ku tiştê ku nivîskar fêm kiriye bi tevahî wekî bireser hatine şixulandin. Yanî “buhara Eyndîwerê bihareke welatî” bersiva vê pirsê dide ku nivîskar çi fêm kiriye û têgihiştina wî çi ye? Bireser bi forma xwe ya sîngular derketiye pêşiya me loma tiştê ku hatiye fêm kirin, yek heqîqetekî ye û ji ber vê yekê jî em nikarin wê bi forma plural bikarbînin. Di encamê de hêmaneke yekjimar jî kesandina şexsa yekem a yekjimar dixwaze û ji xwe lêker jî bi wê awayî derketiye pêşiya me.

**42)** Saet nêzîkî dudiyê piştî nîvrojê bû û, wê rojê, germa havînê tu gêj kiribûyî.[85]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Wê | rojê, | germa | havînê | tu | gêj | kiribûyî. |

**Şîrove:** Peyva “wê” li cem peyva “roj” hatiye bikaranîn û her du hokera demê pêk anîne. Peyvên din ku wan te’qîb dikin (germa havînê) bi hev re ravekekî çêkirine û kirdeya hevokê jî ji wan çêbûye. Hêmana ku piştî kirdeyê tê (tu) bireser e û herçend zemîreke kirdeyî bibe jî livir wekî bireser hatiye şixulandin û lêkerê kesandiye. Eger em vê yekê nizanibin dibe ku hevokê xelet fêm bikin. Lê di çarçoveya ergatîvê de hêmanên kirde û bireser ji nû ve tên şayesandin û livir jî “tu” roleke nû wergirtiye û lêkerê

[84] b.n., r. 89
[85] b.n., r. 95

kesaniye û kirde, “germa havînê”, neşiyaye ku fi’lê bikesîne. Hemin ku hal û mesele wisa ye em dikarin bêjin ku bireser û lêker di nav ahengekî de ne û têkiliya kirde û lêker bi tevahî qetiyaye.

**43)** Te pencere vekiribû û ji derve, pêlên bayê hênik bi şermdarî derbasî hundirê oda te dibûn.[86]

| | | |
|---|---|---|
| Te | pencere | vekiribû. |

**Şîrove:** Ji ber ku hevok gelek dirêj e qisma duyem a hevokê negerguhêz e û me ji aliyê ergatîvê ve elaqedar nake em bitenê li ser qisma yekem sekinîne. Bi vî awayî hêmana ku mewqi’ê kirdeyî digire zemîra “te” ye. Ev cînavk di demên fireh û bê de bi wateya bireser de tê şixulandin, lê di çarçoveya ergatîvê de li cem lêkerên gerguhêz dibe kirde û ji xwe re roleke nû bidestdixe. Lê vê rol etfî ye, yanî bi tenê bi hinek şert û mercên ku pêwist in dertê holê. Em dikarin van mercên ku lazim in wiha îzah bikin: Fi’l di dema borî de ye, yanî hundura xwe de yekî ji demên borî dihewîne û îlla geguhêz e, yanî ji xwe re bireserekî werdigire û bê wê tekûz nabe. Livir “pencere” kelîmeke yekjimar e û bi vê terzî lêkerê jî xistiye bin bandora xwe û wê kiriye yekjimar. An jî bi gotineke din lêker ji tesîra kirde ku bi xwe şexsa duyem a yekjimar e derketiye û elaqeya xwe jê biriye. Di encamê de lêker li şûnî forma “vekiribûyî” dibe “vekiribû”. Eger em ji saziya ergatîvê agahdar bin hingê hevokê rast fêm dikin û nakevin xeletiyeke gengaz.

**44)** Te xwe ji bîr dikir û te çemê bajarê xwe tanî bîra xwe, ava wî û gul û sewsenên li kendalên wî.[87]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Te | xwe | ji | bîr | dikir… |

**Şîrove:** Zemîra “te” ku bi xwe ji cînavkên beşa duyem e û wateya biresertiyê dide livir di saziya ergatîvê de pozîsyona kirdetîyê helaniye. “Xwe” cihê cînavkan bi

[86] b.n., r. 95
[87] b.n., r. 95

temamî digire û wateya wê ev e ku bandora lêkerê dizivire li ser kirdeyê. Livir "xwe" cihê hêmaneke yekjimar girtiye û ji ber vê yekê jî lêker jî bûye yekjimar. "Jibîrkirin" sûreta ji bîr dikir" wergirtiye loma çawa ku em gotibûn şexsa duyem a yekjimar ango "te" tesîra xwe ya li ser fi'lê wenda kiriye û li cihê wê bireser ango "xwe" wê kesandiye.

**45)** Lê te pirr ji çemê şehrê xwe hez dikir.[88]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Lê | te | pirr | ji | çemê | şehrê | xwe | hez | dikir. |

**Şîrove:** "Te" çiqas yekê ji cînavkên bireseran bibe jî li gorî wezîfeya xwe li pozîsyona kirdeyê de ye. "Pirr" di mewqiya hokerê de ye û derbarî rêjeya "hez kirin"ê de jibo me agahî dide. Di Kurdî de "hez kirin" ablatîvê dixwaze û bi vê terzî "ji" hatiye bikaranîn. Piştre jî behsa wê tiştê hatiye kirin ku jê pirr hezdikin: "Çemê şehrê xwe". Ev ravek di formeke yekjimar de ye û bi vê terzî îqtîza dike ku lêker jî bibe yekjimar. Ji ver vê yekê "hez dikirî" nehatiye bikaranîn û li şûnî wê forma "hez dikir" derketiye holê. Fi'l hevedudanî ye ji "dema borî a diyar û çîrokiya dema boriya niha" teşkîl bûye.

**46)** Çavên te girtî bûn û germa dijwar laşê te sist kiribû, te gêj kiribû.[89]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Germa | dijwar | laşê | te | sist | kiribû, | te | gêj | kiribû. |

**Şîrove:** Di zahîrê de her du peyv jî ji aliyê kirde û bireserê ve di nav ahengekî de xuya dikin, le aheng girêdayî bireser û lêkerê ye. Loma di hevoka pêşîn de "laşê te" yekjimar e û lêkera ku wê te'qîb dike jî jê re rîayet kiriye û ew jî bûye yekjimar: "Sistkiribû". Her wija biresera hevoka duyem jî mufred e (te) û fi'la ku di dey de tê jî wekî wê bûye mufred (gêj kiribû). Çawa ku em hêja gotibûn, kirde jî yekjimar e û ku em ahengdarîya hevokê jê bizanibin ev xeletiyek mezin e. Çima ku di çarçoveya saziya ergatîvê de qaîdeke serbixwe heye û lazim e ku em li gor wê rezikê lêkerê girêdayî bireserê bikin.

[88] b.n., r. 95
[89] b.n., r. 96

**47)** Te xwest bibî başoke, ew teyrê te pirr jê hez dikir u te xwest bayê dûrbûnê bi baskê xwe biqelêşî.[90]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Te | xwest | bibî | başoke. |

**Şîrove:** Kirde, peyvekî ji endamên koma bireserê ye. Ji xeynê dema borî ev peyv wekî obje an jî bireser tê bikaranîn lê livir bi wayeta suje an jî faîl hatiye bikaranîn. Hêmana duyem lêker e û bi formeke sade hatiye bikaranîn. Qesda me ji sade ew e ku li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kesandin. Em bi vê şiklî bi hêsanî fêm dikin ku hêmana ku piştî lêkerê hatiye bikaranîn jî sade an jî yekjimar e. Livir çiqas ji yekî zêdetir peyv hebin jî hemû wekî yek cuz tên qebûl kirin. Bi gotineke din "bibî başoke" biresera hevokê ye loma nîşanî yek arzû û xwastinê dikin. Yanî nûser ji dilê xwe tiştek bihûrandiye ku ew jî "bûyîna başoke" ye. Hemin ku mirazê wê yek e, pêwist e ku lêker jî li gorî wê bi formeke sade bê şixulandin.

**48)** … Rast e te pirr keç peyda kirin, ji ber ku tu pirr bedew bûyî di du-sê salên pêşî de…[91]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Rast | e | te | pirr | keç | peyda | kirin… |

**Şîrove:** Di hevokê de hevokek piçûk a din jî heye: "Rast e." Ew wezîfeya derbasokê helgirtiye daku em bala xwe bidin jibona cumleya ku wê te'qîb dike û em wê rast bipejirînin. Faîla cumleya bingehî "te" ye û em vê cînavkê her tim di rola bireserê de dibînin lê livir di dema borî de bi peywira kirdeyê hatiye bikaranîn. Kelîmeyên ku di pey de tên (pirr keç) bi formeke pirjimar de derketine pêşiya me. Herçend peyva "keç" yekjimar xuya bike jî bi arîkariya "pirr" û ji pirjimariya lêkerê em bi hêsanî fêm dikin ku ew pirjimar e. "Peyda kirin" lêkereke hevedudanî ye di dema borî a diyar de hatiye kesandin. Di endamê de pirjimar bûyîna lêkerê girêdayî pirjimar bûyîna bireserê ye û

[90] b.n., r. 96
[91] b.n., r. 98

em di çarçoveya saziya ergatîvê bifikirin û meseleyê bi wê terzî binerxînin tu şaşîtî dernakeve holê.

**49)** Û hate bîra te, dema carna tu û Cengî di newalên li dora çem de, li ser kevirên pehn û latên sivik digeriyan û we ew heldibijartin.[92]

| | | |
|---|---|---|
| We | ew | heldibijartin. |

**Şîrove:** Di hevokê de em bi hêsanî dibînin ku mena dibe ku şaş were fêm bikin loma cihê peyvan naşibin cihê zemanên fireh û bê. Peyva ewil li dema fireh û bê de bi wateya bireser tê bikaranîn lê livir di çarçoveya saziya ergatîvê de rola xwe ya esil wenda kiriye û rola kirdetiyê helaniye. Her wiha peyva duyem jî di demên fireh û bê de bi rola kirdetiyê dertên pêşiya me lê livir di çarçoveya ergatîvê de wekî bireser hatiye ‘emilandin. Van guherînan bi cînavkan muqeyyed nemane û bandorek giring li ser lêkerê jî çêkirine. Bi gotineke din lêker li gorî bireserê hatiye kesandin, ne li gorî kirde. Livir nuqteyek din a giring jî bala me dikişîne: Lêkera hevokê di saziya xwe de daçekek dihewîne (hel-) û bi parçeya ku di dep de tê ve zeliqîye (-bijartin). Qertafa –di ku nîşanî wateya berdewamiyê dike piştî daçekê û berê parçeya lêkeriyê bicîh bûye. Eviya taybetmendiya gelemper a lêkerên bi daçek e. Yanî wextî qerfatek bê bikaranîn ew îlla di pey daçekê tê bicîhkirin.

**50)** Ber çend salan, dema ew hê mindalek biçûk bû, wî sê çar qedeh çay li ser xwarina firavînê vedixwarin…[93]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Wî | sê | çar | qedeh | çay | li | ser | xwarina | firavînê | vedixwarin. |

**Şîrovema:** “Wî” ji koma bireser a cînavkan e û îfadeyî şexsa yekem a cînavkan dike û ji aliyê zayendê ve dikeve di bin kategoriya nêr. Di demên fireh û bê de wateyeke pasîf werdigire, yanî wekî bireser tê bikaranîn. Lê li dema borî de ji xwe re peywireke aktîf heltîne û wekî kirde tê bikaranîn. Di hevokê de kirde her çiqas şexsa sêyem a

[92] b.n., r. 100
[93] b.n., r. 102

yekjimar bibe jî lêker ne li gorî wê hatiye kesandin û nakokiyek derketiye holê. Em livir dikarin bipirsin ku lêker li gorî kîjan hêmanê hatiye kesandin. Bersiv ev e ku meseleya ergatîvê vê pirsgirêkê çareser dike. "Sê çar qedeh" nîaşnî pirjimariyê dike û cihê şexsa sêyem a pirjimar digire. Ji ber vê yekê jî lêker tabiê wê dibe û ew jî dibe şexsa yekem a pirjimar. Harmoniya di navbeyna bireser û lêkerê ew taybetmeniyê ye ku di çarçoveya lêkerên gerguhêz û dema borî de xuya dike û ji mentiqa demên din gelek cuda ye.

**51)** … Rabu ser xwe, bervê Azad maşiya, li ber wî danişt, her du destên xwe li dora wî gerandin, ew hembêz kir û bi dengek pir nizim di guhê Azad yê çepê de got: …[94]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Her | du | destên | xwe | li | dora | wî | gerandin. |

**Şîrove:** Di hevokê de behsa kesekî ku bi destên xwe hembezî kesekî din dike tê kirin. Çawa ku ji bo vê fi'lê, yanî hembêz kirinê du dest an jî du mil lazim in wisa jî bireser dibe pirjimar û ji yekî zêdetir. Ji ber vê yekê jî lêker jî pirjimar bûye lewre di çarçoveya ergatîvê hewce ye ku bireser û lêker muqabilê hevûdu bin. Bi gotineke din em dikarin bêjin ku di dema borî de bi lêkerên gerguhêz qaîdeya ergatîvê tê tetbîq kirin û ew jî hevahengiya bireser û kirdeyê dixwaze. Livir jî çawa ku "her du destên xwe" pirjimar e, wisa jî "gerandin" jî bûye pirjimar û harmonî pêk hatiye.

**52)** … Bavê wî jî ew kiribû hembeza xwe, radimûsa û tûrikên armuxanan didan wî.[95]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Tûrikên | armuxanan | didan | wî. |

**Şîrove:** "Bavê wî" ew hêman e ku lêker ji hêla wê hatiye bicihanîn. Herçend ev kelîme bi formeke yekjimar bê bikaranîn jî lêker li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye lidarxistin û bi vî awayî nakokiyek balkeş qewimiye. Sedema vê yekê ev e ku raveka "tûikên armuxanan" wekî bireser hatiye bikaranîn û di formeke pirjimar de xuyaye. Di çarçoveya saziya ergatîvê de yekjimarî an jî pirjimariya peyvan lêkerê jî têxin bin bandora xwe û wê wekî xwe dişikilînin. Wiha jî –eger em mînaka berjorî binerxinîn û

[94] b.n., r. 102
[95] b.n., r. 102

bidin ber çavan- “bavê wî dida” xelet e û heya ku em “bawê wî didan” nebêjin ew xeletî dê bidome.

**53)** Jinekê bi tirkiyeke osmanî, lê bi devoka çerkezan bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê.[96]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ji | destê | min | girt | û | ez | birim | odeya | rûniştinê. |

**Şîrove:** Ev her du hevok bi arîkariya “û” bûne yek û cumeleyeke dirêj pêk hatiye. Her du hevok jî bi hewandina lêkerên gerguhêz saziya ergatîvê elaqedar dikin. “Ji destê min” ravekeke ye ku di parçeya yekem de derbas dibe. Bireser bi forma xwe ya yekjimar lêkerê jî şibandiye xwe û ew jî xistiye yekjimar. Di encamê de kesandina fi’lê bûye “girt”. Hewce ye ku em livir wiha nefikirin ku lêker ji ber kirdeya yekjimar ve bûye yekjimar loma aheng bitenê derdora bireser û lêkerê diqewime û ahenga zahîrî di navbeyna kirde û lêkerê tesadufî ye. Di qisma duyem de em têkiliya hêmanên kirde-bireser-lêker qenctir fêm dikin. “Ez” herçend ji koma yekem a cînavkan bibe jî livir wekî bireser hatiye şixulandin û lêkerê ku wê dişopîne ji hêla wê hatiye kesandin. Loma em dikarin bêjin ku livir “ez” nebiriye û berevajî ji terefê kesekî din ve hatiye birin. Nexwe sûret û zahîrê peyvan potansîyela xapîner bûyînê dihewîne. Ger em ji qaîdeya taybetmendiya ergatîvê agahdar nebin dibe ku em li gorî xuya bûna peyvan an jî sentaksê bifikirin û bikevin xeletiyek mezin.

**54)** Min carna jî hin bend di Hawarê de belav dikirin.[97]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | carna | jî | hin | bend | di | Hawarê | de | belav | dikirin. |

**Şîrove:** Hevok bi zemîra “min” destpêkiriye. Ev yekê ji cînavkên koma bireserê ye û ji xeynî demên borî û li cem lêkerên gerguhêz vê peywira xwe her tim didomîne. Livir di çarçoveya ergatîvê ji qaîdeya xwe ya gelemperî derketiye û ji xwe re wezîfeyeke nû wergirtiye. Yanî di saziya ergatîvê de koma yekem a cînavkan dibin

---
[96] b.n., r. 116
[97] b.n., r. 117

kirde û koma yekem a cînavkan jî dibin bireser. “Jî” di hevokê de ji bo te’kîdê yanî kirpandinê hatiye bikaranîn. Hêmana ku li ser te’kîd çêbûye “carna” ye. Hêmana ku wê te’qîb dike “hin bend” e û bi wezîfeya kirdetiyê hatiye ‘emilandin. Livir herçend kelîmeya “bend” paşqertafa pirjimariyê negirtibe jî bi arîkariya “hin” em baş fêm dikin ku pirjimar e. Çawa ku bireser pirjimar e wisa jî lêker jî bûye pirjimar û li cihê “belav dikirim”, ji forma “belav dikirin” hatiye sûdgirtin. Bi vî awayî jî qaîdeya ergatîvê pêk hatiye û navbeyna bireser û lêkerê ahengeke xurt qewimiye. Yanî kirde, bandora xwe ya li ser lêkerê winda kiriye û li cihê wê bireser wê kesandiye.

**55)** Mirana wî ez mehû kirim.[98]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Mirana | wî | ez | mehû | kirim. |

**Şîrove:** Jêderka lêkerê “miran” digel paşqertafa zayendê ve hatiye bikaranîn û li cem peyva ku wê dişopîne ravekeke çêkiriye û bûye kirde. Teserrufên vê terzî yekjimar tên hesibandin û bi awayek siriştî di netîceyê de lêker jî dişibînin xwe. Lê di mînakê de em dibînin ku lêker ne li gorî kirdeyê ye. Sedem ev e ku “ez” wekî bireser hatiye bikaranîn. Ev cînavk her tim bi wateya faîl tê şixulandin, lê di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz wateya xwe ya esil wenda dike û tê wateya “min”. Tiştê balkeş ev e ku herçend wekî bireser bê bikaranîn jî taybetmendiya xwe ya kirdetiyê bi tevahî wenda nake û dikare lêkerê bikesîne. Lewre di hevokê de li gorî ahenga kirde û lêkerê hewce bû ku em bigotana “ mehû kir” lê bi saya qaîdeya ergativê û taybetmendiya cînavka “ez” form bûye “mehû kirim.” hemin ku wisa ye em dikarin xwe ji xeletiyên gramatîk biparêzin û menayê rast û dirust têbigihijin.

**56)** Di mêvandariyeke kurt de wê ez hînî pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got.[99]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Di | mêvandariyeke | kurt | de | wê | ez | hînî | pir | tiştan | kirim. |

[98] b.n., r. 19
[99] b.n., r. 120

**Şîrove:** Çar hêmanan herî ewil zerf in loma hemû nîşanî bûneweriyê dikin. Livir axivker behsa mêvantiyeke dike ew tê de ye. Hemana din kirde ye. Wê ji cînavkên koma yekem e û cihe şexsa yekem a yekjimar digre. Bi gotineke din muqabilê şexsa yekem a yekjimar û mê ye û bi awayeke eşkere nîşanî zayendê dike. Asayî ev wekî bireser tê bikaranîn lê livir di çarçoveya ergatîvê de rola kirdetiyê wergirtiye û wekî faîl tevgeriye. Dîsa jî madem ku gelemperî fonksiyona biresertiyê dibîne nikare lêkerê bikesîne. Di beşa mute’akib de cînavka “ez” bicih bûye. Ev peyv ji xeynî dema borî her tim rola kirdeyiyê dilîze, lê di hevoka ku behsa mijarê de ye di bin bandora lêker ê maye û wekî bireser tevgeriye. Lê dîsa jî ji taybetmendiya xwe ya kirdetî ya gelemperî dikare lêkerê bikesîne. Forma “kirim” ku li cihê “kir” hatiye sûdgirtin vê yekê îsbat dike. Em dikarin di daîreya vê mînakê de behsa tiştek din jî bikin: Hinek lêker hene ku ji yekê zêdetir bireser îqtîza dikin. Wekî “kesî hînî tiştekî kirin”. Em dikarin vê jî bipirsin: Gelo kîjan hêman e ku em wê wekî biresera bingehîn a ku lêkerê dikesîne qebûl dikin? Mesela di hevokê de lêkera “hîn kirin” derbas bûye. Li gorî vê fi’lê kîjan bireser pêwist e wê bikesîne? Li gorî “ez” an jî li gorî “pirr tiştan”? Û lêker kîjan kesandinê werdigre? “Kirim” an jî “kirin”? Bersiv gelek hêsan e: Kîjan ji wan li ser a din serdest bibe ew dibe bireser. Ji ber vê yekê ye ku “ez” wekî biresera esas a ku lêkerê dişekilîne hatiye bikaranîn.

**57)** Bi hesreta welêt çavên xwe girtin û ji vê dinyayê koç kir.[100]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Bi | hesreta | welêt | çavên | xwe | girtin. |

**Şîrove:** “Bi” wateya navgînê dihewîne û eger arasteyî wesifandina lêkerekî bibe ji xwe re rola hokertiyê werdigire. Wextî ku “bi” li cem peyvekî were bikaranîn dikarê vê peyvê bêxe tevangê. Em livir rastî taybetmendiyeke ecêb tên ku di hinek devokan de tê şixulandin: Li cihê “welatê” welêt” hatiye bikaranîn. Yanî “dengdêra “a” ketiye tewangê û bûye “ê”. Forma “çavan” jî tewiyaye û bûye “çavên”. Sebebe w e ku bi peyveke din re (xwe) hatiye bikaranîn û pê re ravekekî çêkiriye. Ev ravek, yanî “çavên xwe” di mewqia bireser de ye û bi vê wesfê heqqa kesandina lêkerê ya wê ye. Bi vî

[100] b.n., r. 124

awayî jî kirde herçiqas şexsa sêyem a pirjimar bibe jî li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye kesandin û di netîceyê de lêker bûye “çavên xwe girtin”.

**58)** Lê ew yeka han jî ew bêhêvî nekir.[101]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Lê | ew | yeka | han | jî | ew | bêhêvî | nekir. |

**Şîrove:** “Ev yeka han” hêmana kirdeyê pêk tinin. Di saziya kirdeyê de sifeta îşaretê (ew) û zemîreke bi tekîd (yeka han) heye. Em tê digihijin ku van peyvan hatine li cihê hinek peyvên din ku berê behsa wan hatibû kirin. “Jî” daçekekî ye ku ji bo tekîda peyveke ku wê te’qîb dike tê bikaranîn. Livir nivîskar ji du te’kîdan sûd girtiye û bi vê terzî me’na gelek xurt û bihêz bûye. “Ew” cihê bireserê digre. Herçiqas li cihê şexsa yekem a yekjimar an jî şexsa yekem a pirjimar were bikaranîn jî em ji herka peyvan bi hêsanî fêm dikin ku kîjan ji wan rast e. Livir di cihê şexsa yekem a yekjimar hatiye bikaranîn û bi yekjimartiya xwe lêkeê şibandiye xwe. Di çarçoveya ergatîvê de bireser û lêker paralel in. Livir jî ev rêbaz xera nebûye û “ew” fi’lê xistiye bin bandora xwe û tekiliya kirde û lêker qut bûye.

**59)** Herweha wî gelek nivîs di kovara Hawar û Ronahî de jî weşandine.[102]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Wî | gelek | nivîs | di | kovara | Hawar | û | Ronahî | de | jî | weşandine. |

**Şîrove:** Hevok bi zemîra sêyem a cînavkan destpêdike. Herçend peywira wê ya esil bireser bibe jî di daîreya ergatîvê de dişibe kirde û ji xwe re roleke nû werdigire. Her du peyvên ku wê dişopînin bireser in û di forma pirjimartiyê de ne. Ji ber ku peyva “gelek” wateya pirjimariyê dihewîne êdî ne hewce ye ku paşqertafa pirjimariyê bê bikaranîn. Bi gotineke din eger em bibêjiin “gelek nivîsan” ev ne munasib e, hetta xeletiyek e. Du navên kovaran derbas dibe ku di wan de gelek nivîs hatine weşandin: Hawar û Ronahî. Tiştê ku bala me dikişîne ew ku li cihê “di kovarên Hawar û Ronahî de” “di kovara Hawar û Ronahî de” hatiye bikaranîn û peyva “kovar” paşqertafa

[101] b.n., r. 127
[102] b.n., r. 130

pirjimariyê helnedaye. Livir yekjimartî wisa hatiye bikaranîn ku jibona pirjimariyê hewcedarî nemaye. Loma du navên taybet derbas bûye û "kovar" yek carekî bitenê bê bikaranîn jî em dizanin ku mebest her du kovarên "Hawar" û "Ronahî" ne. Pirjimar bûna lêkerê jî giredayî pirjimar bûna bireserê ye. Ji ber ku "gelek nivîs" pirjimar e, lêker jî li gorî wê forma "weşandine" helaniye. Lêker bi xwe jî ne sade ye û ji du demên cuda pêk tê: "Dema buhûriya diyar ve dema buhuriya nediyar".

**60)** Û her car xulamê axê bi guhên me digirt, em diqewirandin.[103]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Û | her | car | xulamê | axê | bi | guhên | me | digirt, | em | diqewirandin. |

**Şîrove:** "Xulamê axa" ew hêman in ku kirde ji wan pêk tê. "Guhên me" jî bireserê teşkîl dike. Em livir saziyeke li dijî ergatîvê dibînin. Çima ku bireser tevlî pirjimar bûna xwe bandorek li ser lêkerê çênekiriye û hevahengî navbeyna kirde û lêkerê qewimiye. Di henek devokan de dibe ku ev qaîde carna tê binpakirin û dema borî jî bi fonksîyonên xwe ve dişibe dema fireh an jî dema bê. Di qisma duyem a hevokê de ergatîvî bi xusûsîyetên xwe yên tevahî ve eşkere ye. Loma "em" çiqas ji cînavkên koma yekem bibe jî xisletên biresertiyê wergirtiye û ji aliyek din ve jî wekî kirde lêkerê kesandiye. Bi vê terzî em dikarin bibêjin ku kesê/kesên ku hatiye/hatine qewirandin "em" in, ne xulamê axa ye. Her wiha kifşe ku di parçeya duyem a hevokê de tekiliya kirde û lêkerê qut bûye û bireser cihê kirdeyê îşxal kiriye.

**61)** Da ku ez xwe biyanî di nav zarokên vir de nebînim, min ew didan ber hevalên gund…[104]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Min | ew | didan | ber | hevalên | gund. |

**Şîrove:** "Min" ji koma bireser a cînavkan e. Zemîra ku wê dişopîne jî, yanî "ew" jî ji koma kirde a cînavkan e. Lê belê din av vê hevokê de her du wezîfeyên yekûdu guherandine û "min" bûye kirde û "ew" bûye bireser. Bê zanîna vê yekê ne gengaz e ku

[103] b.n., r. 139
[104] b.n., r. 141

em vê hevokê rast binerxînin. Ji xwe em ji rêza peyvan û wergereke bi zimaneke din em vê yekê bi hêsanî fêm dikin. Rêbaza ergatîvê ya ku lêkerê li gorî bireserê dişekilîne forma “didan” derxistiye holê û têkiliya lêkerê bi kirdeyê ve qut bûye. Em dikarin menaya tekûz a cînavka “ew” bipirsin û bêjin: Gelo ew nîşanî şexsa yekem a yekjimar dide an jî şexsa sêyem a pirjimar? Jibo fêmkirina vê yekê emê bes li fi’lê mêze bikin dê her tişt eşkere û zelal bibe. Madem ku lêker di forma şexa sêyem a pirjimar de ye hingê “ew” jî girêdayî şexsa sêyem a pirjimar e. Ji bilî vê yekê lêker du demên cuda dihewîne: Dema borî a diyar û çîroka dema borî. Qesda me ji çîrokê ew e ku lêker di dema borî de muddetek dewam kiriye. An jî em dikarin bibêjin ku lêker hereketeke wisa ye ku demek dewam kiriye û çi kin û çi dirêj xisleta berdewamiyê wergirtiye.

**62)** Dawiya dawî ew roj hat, ku birê min ê mezin ez birim dibistanê.[105]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ew | roj | hat, | ku | birê | min | ê | mezin | ez | birim | dibistanê. |

**Şîrove:** Du hevokên ji hev cuda bi daçeka “ku” ji hev cihê bûne. Ji ber ku her du ji hev cihê ne û têkiliyê wan bi hevûdu re tune ye piştî hevoka yekem di hevoka duyem de raweya daxwaze nehatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku “ku” livir bi wateya “û hatiye ‘emilandin. Di hevoka pêşîn de “hatin” li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye bikaranîn. Wextî em li kirdeyê bimeyzînin em dibînin ku ew jî şexsa sêyem û yekjimar e (ew roj). Bi vî awayî navbera kirde û fi’lê de harmoniyeke xuya dibe. Ahengên vê terzî derbarî lêkerên negerguhêz de carî ne û her daîm bêyî bireser tên bikaranîn. Ji xwe ji ber negerguhêz bûyîna fi’lê ye ku kirde û fi’l li hev hatine.

Di hevoka duyem de kirde ji çar kelimeyan pêk tê: “Birê min ê mezin”. “Ê” peyvikeke pratik e ku jibona berdewamiya ravekan tê bikaranîn. Terkîbeke qediyayî (birê min) bi cihetekî ve tê tekîd kirin (mezin) û li gorî zayendê peyvikên “ê, a, an” heltine (birê min ê mezin). Hêmana ku wê dişopîne “ez” e ev peyv tevlî aîdbûna xwe bi koma yekem a cînavkan livir di dema borî de û li cem lêkereke gerguhêz wekî bireser tevgeriye. Dîsa jî taybetmendiya xwe ya kevn domandiye û lêkerê ew kesandiye.

[105] b.n., r. 141

Sedema nakokiya zahir a hevokê, yanî qaliba “birê min ê mezin … birim”, li cihê qaliba mentiqî a “birê min ê mezin …bir” ev yekê ye. Bi gotineke din “ez” rola biresertiyê wergirtiye û lêkerê kesandiye û qaîdeke nû û ‘ecêb derxistiye holê ku em di demên fireh û bê de hîç wext tesadufê wê nabin.

**63)** Di vir de wî destê xwe bi alî komikek zarok kir û bêdeng ez hiştim û derket.[106]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Bêdeng | ez | hiştim | û | derket. |

**Şîrove:** Hevok du cumleyî ye û lekêrê ya ewil gerguhêz û ya din negerguhêz e. Em dibînin ku zemîr “wî” ye. Ev zemîr ji koma yekem û zayenda wî jî nêr e. Lê di saziya ergatîvê de roleke nû qezenc dike û dibe kirde. Lê dîsa jî ji ber ku ji koma bireseran e nikare lêkerê bikesîne. “Bêdeng” di wesfa hokertî de ye. Di rêzima Kurmancî de sifet di heman wext de dikarin bibine hoker. Hemana din “ez” e û ji koma kirdeyan tê hesibandin. Lê wextî ku dibin mijara dema borî rolên xwe ya kirdetiyê ji dest didin û dibin bireser. Lê disa jî ji ber ku esasen kirde ye dikare lêkerê bikesinîne. Loma em nikarin bibêjin “wî ez hişt”, lê hewce ye ku em bibêjin “wî ez hiştim”. Lêkera din, yanî “derketin” negerguhêz e lazim e ku em wê li gorî kirdeyê bikesînin, ne li gorî bireserê û bi vî awayî forma “ew derket” dertê holê.

**64)** Ez bi dilşikestî vegeriyam malê û min naskir ku bavê min cara yekem ez xapandim.[107]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | naskir | ku | bavê | min | cara | yekem | ez | xapandim. |

**Şîrove:** “Vegerîn” lêkerekî ye ku bireser naxwaze û ji ber vê yekê navbera kirde û fi’lê de ahengekî çêbûye. Her du lêkerên nav şemayê gerguhêz in û li gorî saziya ergatîvê sûret girtine. “Naskirin” çiqas wateya “zanîn”ê bihewîne jî livir bi wateya têgihiştinê hatiye bikaranîn. Hêmanên ku piştî daçeka “ku” hatine tev biresera vê

[106] b.n., r. 141
[107] b.n., r.143

hevokê ne û hînî me dikin ka tiştê ku hatiye têgiştin an jî naskirin çi ye. “Xapandin” jî lêkera duyem e. Wextî em li rêza peyvan mêze bikin dibe ku em şaş bin çimku piştî “ez” lêkera “xapandim” tê û wateya “ez xapandim” jî ew e ku şexsa yekem a yekjimar lêkerê bicih tîne. Lê kirdeya hevokê “bavê min” e. Şîroveya vê îtîlafê gelek besît e: “Ez” peywira biresertiyê wergirtiye û li gorî rêbaza ergatîvê lêkerê şibandiye xwe.

**65)** Û bi rastî jî vê dersê ji yên din bêtir ez dêşandim.[108]

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Û | bi | rastî | jî | vê | dersê | ji | yên | din | bêtir | ez | dêşandim. |

**Şîrove:** Hêmana ku mewqia kirdetiyê girtiye peyva “ders”ê ye ku bi rengdêra “vê”yê hatiye nîşandan. “Vê jibona tiştên nêzikî mirov tê bikaranîn û kelîmeya ku wê dişopine dikeve tewangê. “Ji yên din” jibo berawirdê hatiye bikaranîn û parçeyek ji kirdeyê nîne. “Bêtir” ne bi wateya “çêtir”, lê bi wateya “zêdetir” hatiye şixulandin. Hêmanên herî dawî “ez dêşandim” saziya ergatîvê berbiçav dikin. “Ez” herçend yek ji koma kirdeyan bibe jî wekî bireser hatiye bikaranîn û fi’la ku pey de tê li gorî xwe kesandiye.

**66)** Û çiqasî ji bo vê gotinê di xew de qarîn bi min diket, diya min ez ji xew radikirim û digot: − Kurê min, te xêr e, çima tu di xewê de dikî qerebalix![109]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Diya | min | ez | ji | xew | radikirim. |

**Şîrove:** Unsura herî ewil a şemayê, yanî “diya min” di hukmê ravekê de ye û rola kirdetiyê meşandiye. Piştre jî hêmana “ez” bala me dikşîne ku di mewqiê biresertiyê de. Ev cînavk herçend ji koma cînavkên kirde bibe jî wextî li hevrahê lêkerên gerguhêz û di dema borî de bê bikaranîn wezîfeya biresertiyê dlîze. Lê dîsa jî tevlî bûyîna xwe ya bireser dikare lêkerê bikesîne û bi vê terzî dişibe eslê xwe, yanî

[108] b.n., r. 143
[109] b.n., r. 144

kirdetiya xwe tevahî wenda nake. Eger em bizanibin ku di daîreya ergatîvê de van xisletan xwezayî ne em wan ecêb û awarte nabînin. Hêmana dawî ku lêkerê taybetmendiyek balkeş dihewîne loma di binyada xwe de daçeka “ra–” hewandiye. Wextî em bixwazin ku lêkerek bi daçek li cem “–di” bikarbînin ew çax “–di” dikeve navbera “ra–” û daçekê. Di netîce de “radikirim” sîxeke wisa ye ku nîşan dide me ku ev tevger di dema borî de muddetek dewam kiriye û bi demekî an jî lehzekî ve ne muqeyyed e. Taybetmendiyek a din a lêkerê jî ew e ku ji du demên cuda pêk tê: Dema borî a diyar û çîroka dema borî.

**67)** – Maşallah te gelek sal derbas kirine, sofî.[110]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Maşallah | te | gelek | sal | derbas | kirine, | sofî. |

**Şîrove:** “Te” herçend di wezîfe ya kirdetiyê de bê bikaranîn jî eslen yek bireser e. “Gelek sal” li dijî forma xwe ya yekjimar pirjimar e. Livir peyva “gelek” diyar û kifş dike ku “sal” pirjimar e û ji wateya yekbûnê dûre. Di saziya ergatîvê de ger bireser an jî obje di formeke pirjimar de bibe hewce ye ku lêker jî pirjimar bibe. Naxwe sîxeya “derbas kirine” ku li cihê “derbas kirî” hatiye bikaranîn vê yekê îsbat dike û eşkere ye ku navbeyna kirde û lêkerê de aheng çênebûye, lê aheng navbera bireser û lêkerê de qewimiye.

**68)** Lewra Xwuda em kirine mexlûq

Raziq ew e em kirine merzûq[111]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Lewra | Xwuda | em | kirine | mexlûq, | Raziq | ew | e | em | kirine | merzûq. |

[110] b.n.,r. 154
[111] Feqe Reşîdê Koçer, **Sirul Mehşer**, İstanul: Enstîtuta Kurdî, 2002, r. 8

**Şîrove:** Peyvên ku cihê kirdeyê girtine ji bo misraê ewil "Xwuda" û ji bo misraê duyem jî "Raziq" e. Hewce bû ku lêker li gorî kirdeyê li gorî şexsa sêyem a yekjimar bihatana kesandin lê em dibînin ku li gorî şexsa yekem a pirjimar hatiye şikilandin. Em dikarin vê îxtilafê di saziya ergatîvê de binerxînin. Ji ber ku "em" peywira xwe ya bingehîn ji dest daye û bûye bireser, lêker jî li gor wê hereket kiriye. Bi vê terzî jî li cihê "kiriye" "kirine" derketiye meydanê. Bi gotineke din li hev hatina kirde û lêker pêk nehatiye, lê ahengeke balkeş di navbera bireser û kirdeyê çêbûye.

**69)** Nûh pêxember hezar kêm pêncî salan li nav gelê xwe ma û her ew gazî îmananîna bi Xwedê Teala dikirin.[112]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Her | ew | gazî | îmananîna | bi | Xwedê | Teala | dikirin. |

**Şîrove:** Kirde terkîba "Nûh pêxember" e ku ji du peyvan pêk tê. Hejmara peyvan ji yekî zêdetir jî bibe yekjimar tên hesibandin. "Ew" bireser e û herçend di demên fireh û bê de wekî kirde bê şixulandin jî livir wateya û peywira biresertiyê wergirtiye. Wextî em li lêkerê mêze dikin dibînin ku ew ne li gorî kirdeyê, lê li paralela bireserê ve hatiye kesandin. Bi gotineke din sîxeya "dikirin" nîşan dide ku fi'l kesandina xwe ji objeyê helaniye û têkiliya wê bi kirdeyê ve hatiye birîn. Şixulandineke bi vê terzî jî bitenê netîceya saizya ergatîvê ye û encax li hevrahê lêkerên gerguhêz û di dema borî de derbasdar e.

**70)** Tu çûyî rehmetê, em hiştin derd û şînê de.[113]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Tu | çûyî | rehmetê, | em | hiştin | derd | û | şînê | de. |

[112] Ebul-Hesen En-Nedwî, **Qisseyên Pêxemberan Ji Bo Zarokan**, Wer: Mela Muhammedê Bêrkevanî, İstanbul: Nûbihar, 2010, r. 24
[113] Thackston, b.n., r. 184

**Şîrove:** Ji ber ku lêkera “çûyîn” bireser naxwaze, aheng mabeyna kirde û lêkerê de pêk hatiye û çawa ku di demên fireh û bê de tê dîtin koma cînavkan a yekem û dûyem di wezîfeyên xwe yên eslî de hatine şixulandin. Ji ber ku peyva “rehmet” li cem “çûyîn” hatiye bikaranîn ketiye tewangê. Di parçeya ku wê te’qîb dike “em” ne bi wateya kirde ye, lê ji xwe re wateya biresertiyê helaniye. Em dibînin ku navbera bireser û lêkerê ku her du cî muqabîlê şexsa yekem a pirjimar in ahengdariyek heye. Sedem ew e ku “hiştin” gerguhêz e û di dema borî de bê bikaranîn li gorî bireserê tê kesandin. Ji ber vê yekê jî li cihê forma “hiştî” ku ji me re mentiqîtir û asayîtir dixuye hewce ye ku em sîxeya “hiştin” bikarbînin.

**71)** Û min tu veşartî nav rûpelên Hawarê û li serê wî kêla te daçikand.[114]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Û | min | tu | veşartî | nav | rûpelên | Hawarê. |

**Şîrove:** “Min” cînavkeke ji koma bireseran e. Hemana “tu” ku wê dişopîne girêdayî koma kirdeyan e. Lê di nav vê saziyê de her du wezîfeyên xwe guherandine. Wextî em van peyvan yek bi yek binêrxînin û li gorî rêza wan a sentaksî ve bifikirin dibe ku em wateyê ji binî ve şaş fêm bikin. Ji bo tevdîrê hewce ye ku em bizanibin ka saziya ergatîvê çi ye û bi şixulandina wê wate û rolên peyvan çawa diguherin. Bi gotineke din wextî ku em bizanibin ku kirde li gorî bireserê tê şikilandin hingê em hevokê rast û tekûz fêm dikin. Li mînakê “tu” wekî bireser bicih bûye û ji ber vê yekê jî lêker li paralela wê sûret girtiye. Bi vê terzî jî em forma “veşartî” bi dest dixin ku li cihê “veşartim” hatiye bikaranîn.

**72)** Tu jî, Hawarê, pesnê xwe bide û bibêje: Tirba Şêx Evdirehman di min da ye; min ew veşartiye nav rûpelên xwe, kela wî daçikandiye raserî xwe.[115]

[114] b.n., r. 185
[115] b.n., r. 187

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Min | ew | veşartiye | nav | rûpelên | xwe, | kela | wî | daçikandiye | raserî | xwe. |

**Şîrove:** Ji ber ku her du parçeyên vê hevokê du lêkerên gerguhêz dihewînin her du jî bûne mijara ergatîvê. “Ez” cînavkeke kirdeyî ye û wextî bikeve tewangê dibe “min”. Li saziyê du bireser hene: “Ew” û “kela wî”. Hejmara van peyvan yekjimar e û ev yekê her du lêkeran xistiye yekjimar û li gorî wê, yanî li esasê şexsa sêyem a yekjimar hatine kesandin. Eger em vê hevokê di demên fireh û bê dubare bikin vê çax lêker dibin “veşartime” û “daçikandime”. Di lêkerên de wateya berdewamî tê his kirin loma her du jî li pey xwe “–ye” girtine. Ev qertafekî ye ku nîşanî berdewamiyê an jî bandora lêkerê dikin. Bi vê terzî jî em fêm dikin ku “veşartin” û “daçikandin” hêj jî didome û bi tu awayî neqediyaye.

**73)** Gul û çîçekên biharî li ber tava havînê hişk bûn û bayê payîzê jî kirasê wan revand û berfa zivistanê jî ew kefen kirin.[116]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Berfa | zivistanê | jî | ew | kefen | kirin. |

**Şîrove:** “Berfa zivistanê” ravekek pêk aniye û ji aliyê hejmarê ve yekjimar e. “Kefen kirin” jî lêkerek hevedudanî ye ku parçeyek jê lêker û a din jî navdêr e. Ji ber nakokiya kirde û lêkere em dikarin bibêjin ku têkiliya wan qut bûye û lêker li gorî hêmaneke din hatiye kesandin. Ew hêman “ew” e û lêker ji aliyên hejmar û şexs ve ji hêla wê hatiye şikilandin. “Ew” cihê “gul û çîçekên biharî” girtiye. Em jivir fêm dikin ku “ew” cihê formeke pirjimar girtiye. Bi vê terzî jî hêmana lêkerê jî li gorî wê bûye pirjimar û muqabila şexsa sêyem a pirjimar.

**74)** Em temam anîn wucûdê b’ qudretê

Cann û insan Wî bi ismê rehmetê [117]

---

[116] b.n., r. 188

[117] M. Mustafayê Mela ‘Aliyê Êzdarî, **Mewlidê Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehberê Xelasî Muhemmed ‘Eleyhîs-Selam**, İstanbul: İhsan Yayınları, 2005, r. 3

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Em | temam | anîn | wucûdê | b’ | qudretê. |

**Şîrove:** Hevok li gorî saziya helbestê qelibandî hatiye sazandin. Wextî ku em bixwazin wê li gorî qaîdeyên sentaksê carek din binivîsin binyadeke wiha dertê holê: “Wî bi qudretê [û] bi ismê rehmetê em temam anîn wucûdê.” Fi’lêkî (anîn) arasteyî her du bireseran hatiye bikaranîn (em, cann î însan). Kirde cînavka “wî” ye. Ev zemîr muqabilê cînavka “ew” e û cihê şexsa yekem a yekjimar digrê. Wextî ji vê cînavkê mebest Xwedê be em dikarin wê bi tîpeke mezin binivîsin. Ji ber ku her du bireser jî pirjimar in lêker jî li gorî wê pirjimar bûye û li cihê “anî” sîxeya “anîn” hatiye bikaranîn.

**75)** Ni‘meta xoş em kirin ku musluman

Hem Muhemmed ser serê me kir şivan [118]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Ni‘meta | xoş | em | kirin | ku | musluman. |

**Şîrove:** Di vê beytê de ku taybetmendiyên helbestê ên vegotina naqis û îfadeyên qelibandî dihewîne em dibînin ku “kirin” du car hatiye bikaranîn û bi du formên cuda derketiye pêşiya me. Sedema yekjimarî û pirjimariya van forman ev e ku lêkera ewil yekjimar û an din jî pirjimar hatiye bikaranîn. Cînavka “ew” ku di risteya yekem de derketiye pêşiya me ji xwe re rola biresertiyê wergirtiye û rola xwe ye esil ji dest daye. Lê dîsa jî bandora wê li ser lêkerê tê dîtin. Biresera din ya jî “Muhemmed”, bi yekjimartiya xwe lêkerê jî şibandiye xwe û wê xistiye “kir”. Em ji berî û paşiya peyvan bi hêsanî fêm dikin ku kirde “Wî”, yanî Xwedê ye.

[118] b.n., r. 3

**76)** Ka ‘ezîzê min çima ma l’ xurbetê

Ez tenê hiştim di nêva firqetê [119]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Ez | tenê | hiştim | di | nêva | xurbetê. |

**Şîrove:** “Ez” ji koma cînavkên kirdeyî ye lê livir li wesfa bireser de ye. Sedema vê yekê ew e ku di dema borî de û digel lêkerên gerguhêz cînavk wezîfeyên xwe diguherînin. Bi vî awayî zemîrên beşa yekem ku di demên fireh û bê de her daîm di rola kirdetiyê de ne, di saziya ergatîvê de ji xwe re rolên koma duyem a cînavkan werdigirin û wekî wan tevdigerin. Bi heman terz, cînavkên koma duyem jî di demên fireh û bê de di rolên xwe yên eslî, yanî biresertiyê de dimînin lê hingî dikevine daîreya ergatîvê wê çax ji xwe re wezîfeyek nû heltînin û dibin kirde. Ji ber vê yekê jî “hiştim” naye wateya “ez”, yanî şexsa yeme a yekjimar “hiştim” lê “kesek din min hiştiye”. Lê tiştê ku me têxe şaşitiyê ew e ku “ez” tevî bireser buyîna xwe dikare lêkerê bikesîne û kirdeya rastîn, yanî “ezîzê min” nikare li ser fi’lê bandoriyek çêbike.

**77)** Te ilahî em bi Ehmed şa kirin

Em bi vê lew ni‘metê pur şakir in [120]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Te | ilahî | em | bi | Ehmed | şa | kirin. |

**Şîrove:** Hemana ewil ku di şemayê de derbas dibe cînavka “te” ye û wateya objetiyê dihewîne. Îlahî” baneşan an jî nîda ye ku xîtabeke ji bo Xwedê ye. “Îlah” bi wateya rebb an jî Xwedê ye û “–î” paşqertafeke Erebî ye tê wateya “ê min”. Hêmana din, “em”, çiqas xuyanî de kirde bibe jî di vê konteksê de wekî bireser hereket kiriye û ji

[119] b.n., r. 22
[120] b.n., r.28

xwe re peywireke nû wergirtiye. Bi vê terzî jî lêker elaqeya xwe ji “te”, yanî ji lêker qut kiriye û li cihê kesandina “kirî”, forma “kirin” derketiyê holê.

**78)** Qewlê te xayet belîx in lefzê te xayet şirîn

Te bi wan ihya kirin millet û dîn Xace Huseyn [121]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Te | bi | wan | ihya | kirin | millet | û | dîn | Xace | Huseyn. |

**Şîrove:** Hewce ye em em van her du risteyan di nav tevayî de binerxînin. Peyvên “qewl” û “lefz” ku di risteya yekem de derbas dibin bi pirjimarî hatine bikaranîn. Ger em wan yek bi yek bihesibînin û yekjimar bibînin jî ji ber hatina wan li cem hev dîsa jî pirjimar dibin. Jixwe ev pirjimarî ye ku lêkera îhya kirinê li gor şexsa sêyem a pirjimar kesandiye. Herçend îfadeya “bi wan” bişibe bireser jî livir bi wateya wesîle an jî wasite hatiye bikaranîn û bûye hoker. Kirde cînavka “te” ye. Li dijî wezîfe ya xwe ya gelemperî livir bi wateya kirdetiyê hatiye bikaranîn û bûye faîl. Lê dîsa jî ji ber wezîfeyên xwe ya eslî nekariye ku lêkerê bikesîne û lêker ji hêla hêmaneke din, yanî ji terefê peyvên “qewlê belîx” û lefzê şirîn” hatiye kesandin.

**79)** Nezmê te xayet ‘ecîb in me‘neyê bê hed xerîb

Te ji wan durran temam kir ev kitêb Xace Huseyn [122]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Te | ji | wan | durran | temam | kir | ev | kitêb | Xace | Huseyn. |

**Şîrove:** “Te” ji koma bireseran e û ji xeynê dema borî her daîm vê peywira xwe didomîne. Livir di konteksa mînaka me de wezîfeya faîltiyê helaniye. Lê dîsa jî ji ber

[121] Melayê Bateyî, **Mewlîdun-Nebî**, Amd: Abdulbasit Muhammed Abdussamed Amedî, İstanbul: Nûbihar, 2012, r. 25
[122] b.n., r. 25

fonksîyona xwe ya eslî lêkerê nekesandiye. Yanî di hevokê de çiqas şûna kirdeyê bigire jî dîsa qismen li ser rewşa xwe ya gelemperî maye û nekariye lêkerê bikesîne. Hêmanên "ji wan durran" nîşanî jêderkê dike û wekî bireser nayên hesibandin. Hêmanên ku cihê bireserê girtine "ev kitêb" in. Ji ber vê yekê ye ku li cihê "temam kirî" ku kirdeya hevokê îqtîza dikir "temam kir" hatiye bikaranîn. Ev kesandin bi objeyê re ketiye harmoniyê û ji her aliyan ve pê re ahengdar e.

**80)** Em kirîne ummeta xeyrul-beşer

Tabi'ê wî muqtedayê namuwer [123]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Em | kirîne | ummeta | xeyrul | beşer. |

**Şîrove:** Di vê beytê de kirde nehatiye diyarkirin lê ji ber ku ji mewlida Bateyî hatiye îqtîbas kirin em dizanin ku kirde "Xudayê alemîn" e. Di şemayê de hêmana ewil, yanî "em" bireser e. Ev cînavk bitenê di dema borî de û li cem lêkerên tranzîtîf wateyek nû werdigire û wekî bireser tê bikaranîn. Lê dîsa jî taybetmendiyên xwe yên eslî jî bi tevahî ji dest nade û lêkerê dişekilîne. Ji ber vê yekê ku li cihê kesandina "kirîye" forma "kirîne" hatiye bikaranîn ku bi bireserê ve ahengdar û mutenasîb e.

**81)** Zulfa ku tête ser milan

Çengal e davêjî dilan

Qir kir te ehlê berçelan

Dad û li min dad û li min [124]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Qir | kir | te | ehlê | Berçelan. |

[123] b.n., r. 31
[124] b.n., r. 183

**Şîrove:** "Te" di pozîsyona kirdeyê de ye. Hewce bû li pêşiya hevokê de bihata bikaranîn lê ji ber ku saziya helbestê de ji bo îfadeyên qelibandî re cewaz heye hatiye cihê xwe yê niha. Lêker jî bi heman şiklê ve ji cihê xwe yê eslî derketiye û hatiye serê risteyê. Em ji lêkerê fêm dikin ku bi yekjimar bûna xwe nîşan dide ku bireser jî yekjimar e. "Ehlê Berçelan" yanî "xelkê Berçelanê" wekî peyveke yekjimar hatiye hesibandin loma gel tevahî hebûneke girseyî ye û dibe yekjimar. Bi vê terzî jî lekerê şibandiye xwe û wê jî xistiye yekjimar. Di encamê de jî forma lêker ji "qir kirî" derketiye û bûye "qir kir".

**82)** Siyeh çeşmê siyeh findê

Te sûhtim şibhetê findê [125]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Te | sûhtim | şibhetê | findê. |

**Şîrove:** "Te" endama duyem a cînavka bireseran e û ji aliyê hejmarê jî yekjimar e. Lê di dema borî de wesfeke nû bi dest dixe û ji xwe re maneyek nû werdigire û dibe kirde. Ji ber vê yekê ye ku di hevokê de peyva herî ewil ew e û rola kirdeyiyê wergirtiye. Hingê kesê ku dişewitîne şexsa yekem a yekjimar e (ez) û kesê ku dişewite jî şexsa duyem a yekjimar e. Paşqertafa "–im" ku bi lêkerê ve zeliqiye delîleke eşkere ye jibona huwiyetê bireserê. Ji ber vê yekê jî eger cînavka "ez" nehatibe gotin jî bi saya paşqertafa ku bi lêkerê ve zeliqiye em dikarin wê teşxîs bikin. Di netîce de hêmana "ez" ji xwe re roleke nû wergirtiye û lêkerê şibandiye xwe û wê anitiye forma "sûhtim"ê.

**83)** Suto hemî Dûskanî û Hewremarî gazî kirin.[126]

[125] Eş-Şeyh Ahmed El-Cezerî,**El-Eqdul-Cewherîyyu Fî Şerhî Dîwanîş-Şeyx El-Cezerî,** Amd: Ahmed bin El-Mulla Muhammed El-Behtî Ez-Zivingî, İstanbul: Haşemi Yayınevi, 2012, r. 396

[126] B. Nikitine, E. B. Soane, **The Tale of Suto and Tato: Kurdish Text with Translation and Notes**, Londra: Bulletin of the School of Oriental Studies, University of London, Vol. 3 No: 1, 1923, r. 91

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Sûto | hemî | Dûskanî | û | Hewremarî | gazî | kirin. |

**Şîrove:** Sûto naveke taybet e. Navên “Dûskanî” û “Hewremarî” jî taybet in. Her du nav jî paşqerfata “–î” helanîne ji bo ku ji bo însanan mensûbiyetê îfade bike. Herçend di formên van navan de yekjimarî hebe jî ew bi muhtewayê pirjimar in. Jixwe her du yekjimar bên qebûl kirin jî ji ber ku peyê hevûdu hatine bikaranîn dîsa jî dibin pirjimar. Ev pirjimarî li ser lêkerê jî bûye bandordar û wê anitiye forma “gazî kirin”, li cihê “gazî kir”.

**84)** Elhemdu lillah carekî dî min hemî mirowêt xo dîtin.[127]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Elhemdu | lillah | carekî | dî | min | hemî | mirowêt | xo | dîtin. |

**Şîrove:** Herçend di saziyê de bitenê hevokeke xuya bike jî ew du hevokên cuda dihewîne. Yekê ji wan hevoka duayê a “elhemdu lillah” e. Ya din jî bi hêmanên “carekî dî” destpêdike ku bi xwe tu tesîra wê li ser lêkerê tune ye. Unsura ku wê dişopine “min” e û ji berê ve xeber dide ku saziya ergatîvê dê bê damezirandin. Ev cînavk çiqas zahîren cînavka bireserî de bibe jî rola kirdetiyê wergirtiye û bûye çêkera lêkerê. Hêmanên din bireser in û di formeke pirjimar de ne. Em vê yekê hem ji peyva “hemî”, hem jî ji qertafa “–êt” fêm dikin. Bi vî awayî jî lêker ji xwe re forma “dîtin” wergirtiye û ji forma “dîtim” a mentiqî dûr ketiye.

**85)** Tito her carê çar pênc ji wan dikuştin û dane paş.[128]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Tito | her | carê | çar | pênc | ji | wan | dikuştin | û | dane | paş. |

[127] g.n., r. 105
[128] g.n., r. 106

**Şîrove:** “Tito” navekî taybet e. Hêmanên “her carê” nîşaneyên demê ne û bi vê terzî dibine hokera zemanê. “Çar pênc ji wan” jî di hukmê bireserê de ne. Livir li cihê forma “ew” em peyva “wan” dibînin çima ku “ji” hatiye bikaranîn. Wextî daçekek bê bikaranîn cînavkên li pey wê tev dibine cînavkên koma duyem. Livir em dibînin ku nivîskar behsa komeke qelebalix dike ku ji nav wan “her car” “çar pênc kes” tên kuştin. Ew îfade jî nîşan dide ku bireser pirjimar e. Wextî bireser pirjimar bibe ew li ser lêkerê jî muessîr dibe û wê dişibîne xwe. Ew jî forma “dikuştin” derxistiye holê ku li dijî çêkera hevoke ye û ger ev hevok di dema fireh an jî di dema bê de bibûya dibû “dikuşt”.

**86)** Qaimeqam bîst cendirman hinarine Rizge.[129]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Qaimeqam | bîst | cendirman | hinarine | Rizge. |

**Şîrove:** Qaimeqam di hukmê kirdeyê de û naveke hevenav e. Ji aliyê hejmarê ve jî yekjimar e. Her du hêman ku wê dişopînin bi hev re bireserê teşkîl dikin. Bireser jî çawa ku hejmara “bîst” bi eşkereyî nîşan dide di weskeke pirjimar de ye. Ji ber ku ev peyv paşqertafa pirjimariyê wergirtiye êdî di pirjimar bûna wê de tu şik namîne. Asayî Kurmancî de piştî hejmaran paşqertafa pirjimariyê nayê bikaranîn lê livir em dikarin bibêjin ku dibe ku nûser vê yekê ji bo te’kîdê bikaraniye. Di saziya ergatîvê de qaîdeke ye ku bireser lêkerê dişibîne xwe û hem ji aliyê şexsê, hem jî ji aliyê hejmarê ve di nav ahengeke de ne. Jixwe biresereke pirjimar (bîst cendirman) û fi’leke pirjimar (hinarine) vê yekê nîşan û îsbat dike.

**87)** Bende jî deh xulam digel nesranî hinarin.[130]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Bende | jî | deh | xulam | digel | nesranî | hinarin. |

[129] g.n., r. 106
[130] g.n., r. 106

**Şîrove :** "Bende" cihê şexsa yekem a yekjimar girtiye û te'bîreke wisa ye ji bo dilnizmî û tewazuê tê bikaranîn. Di Kurmancî de te'bîra "ez benî" jî heye û wateya wê ew e ku "ez amade me ji bo we xizmet bikim". Hêmana mute'aqîb "jî" ye. Livir ne ji bona tevlîbûnê, lê jibona berawirdê hatiye bikaranîn. Bi gotineke din axivker dibêje ku ji xeynê kesên din ez jî wiha û wiha tevger kirime. Li unsurên din bireser xuya dibe ku ji aliyê lêkerê ve pir giring e: "Deh xulam". Ji ber ku ew di saziyeke pirjimar de ye û ew me'na bi hejmara "deh" qewîtir bûye lêker jî li gorî wê hereket kiriye û forma "hinarin" helaniye. Bi vê terzî jî hevahengiya bireser û lêker qewimiye û diyardeya ergatîvê pêk hatiye.

**88)** Te bê fayde 'umur bûrand
Di qelbê xwe le'în rûnand
Heçî qencî te jê fûrand
Rija tev çû bi 'erdê da [131]

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Te | bê | fayde | 'umur | bûrand. |

**Şîrove:** Miqabila vê risteyê di zimanê nesrê de wiha ye: "Te 'umur bê fayde bûrand." Eger em vê yekê kelîme bi kelîme, yanî li gorî şemayê bifikirin û tehlîl bikin ew çax menayeke tam di eksê de dertê holê û wiha tê fêhm kirin: "Umur me bûrandiye." Ev her çiqas ji bom e be wate xuya bike jî ger em bizanibin ku di saziya ergatîvê de kirde û bireser cihên xwe diguherînin ew wext dibe watedar. "Te" endama koma cînavkên bireser e û di demên fireh û bê de vê rola xwe diparêze. Lê wextî ku dikeve daîreya ergatîvê ji xwe re roleke nû werdigire û dibe kirde, yanî wekî cînavka "tu" tê bikaranîn. Lê belê dîsa jî, yanî tevlî kirde bûna xwe nikare lêkerê bikesîne. Hêmana ku wê bikesîne bireser e. "Umur" peyveke yekjimar e û îşaretî şexsa sêyem a yekjimar dike. Ji ber vê yekê lêkerê jî şibandiye xwe û wê jî xistiye yekjimar û şexsa yekem.

**89)** Di dunyaê te keyf pur kir
Te zulm û cewr û <u>h</u>eyf pur kir
Binêr ka te çi <u>h</u>asil kir

---

[131] Seyid Eliyê Findikî, **Dîwan**, Amd: Selman Dilovan, Huseyn Şemrexî, İstanbul: Nûbihar, 2011, r. 16

Di vê resm û di vê rê da [132]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Binêr | ka | te | çi | h̲asil | kir? |

**Şîrove:** “Te” yekê ji cînavkên koma bireseran e û di demên fireh û bê de her daîm di wezîfeya kirdetiyê de ye. Lê li cem lêkerên tranzîtîv ji xwe re wezîfeyeke nû werdigire û dibe kirde/çêker. Lê çawa ku em di mînakê de dibînin tevlî bûyîna xwe ya faîl nikare lêkerê bikesîne. Kesandina lêkerê ku di netîceyê de bûye “hasil kir” li cihê “hasil kirî” bi bireserê ve elaqedar e. Di saziya ergatîvê de lêker li gorî bireser tê kesandin. Di vê konteksê de pirsa “çi” wekî peyveke yekjimar hatiye qebûl kirin û derbasî cihê şexsa sêyem bûye. bi vê avayî jî lêker pê re ahengdar bûye û sîxeya “hasil kir” derketiye holê.

**90)** Zahir kirin ev qeder senayi‘
Peyda kirin ev qeder bedayi‘
Her yek ji ‘edem kirin te peyda
Ibda‘ kirin te bê heyûla [133]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Her | yek | ji | ‘edem | te | kirin | peyda. |

**Şîrove:** Kirde cînavka “te” ye. Bireser jî ji hêmanên “her yek” pêk hatiye. Ew di zahîr de çiqas yekjimar bibin jî bi tevahî wekî pirjimar tên hesibandin. Bi gotineke din tiştên ku her yekê ji wan ji edemê hatine xuluqandin bi tevahî dibine pirjimar. Ji ber vê yekê jî li cihê forma “peyda kirî” forma sêyem a pirjimar hatiye bikaranîn û lêker ji xwe re sûreta “peyda kirin” wergirtiye. Ev di netîceya tenasuba bireser û kirdeyê û di çarçoveya ergatîvê pêk hatiye.

**91)** Û ji boy dilê zaroyan şaz kirinê har çîk̲î sûrat̲ bin dast̲ê ma hazir habû har yek̲î li cîê xo ma danî.[134]

[132] b.n., r. 16
[133] Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn**, Amd: Huseyn Şemrexî, İstanbul: Nûbihar, 2011, r. 21
[134] Hayrabydutyan, Badriarkutyan, **Elîfbacuz**, İstanbul, 1860, r. 1

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Her | yek̲î | li | ciyê | xo | ma | danî. |

**Şîrove:** Cînavka “ma”, an jî bi Kurmanciya îro “me” ji cînavkên bireserî a çarem e. Yanî cihê şexsa yekem a pirjimar digire. Wateya kirdetiyê bitenê di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz qezenc dike. Livir jî ji xwe re fonksîyona kirdetiyê wergirtiye û bûye çêkera fi’lê. Lê wextî em li lêkerê dimeyzînin em dibînin ku ew ne ji hêla kirdeyê ve hatiye kesandin. Hingê em dipirsin ka kîjan hêman wê kesandiye? Ji ber ku bingeha saziya ergatîvê li ser harmoniya bireser û lêkerê ye bersiv jî diyar e: Hêmana ku lêkerê dikesîne rasterast bireser e. Li ver peyvên ku cihê bireserê girtine “her yekî” ye û ew jî cihê peyva “sûrat” ku berê derbasbûbû helaniye. Ji ber ku bireser yekjimar e hewce ye ku lêker jî pirjimar be. Jixwe em dibînin ku lêker li dijî forma “danîn” ku cînavkên ma/em îqtîza dikin bûye yekjimar û sîxeya “danî” derketiye holê.

**92)** Nîhayet har çîk̲î ji dast̲ê ma dihat̲ jiboyê zaro ra ilmê xûndan şîrîn xûyayî kirinê ma kir.[135]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Nîhayet | har | çîk̲î | ji | dast̲ê | ma | dihat̲ | ma | kir. |

**Şîrove:** Hêmana ewil yek hokereke demî ye û beyanî merheleya herî dawî a pêvajoyek dike. Şeş hêmanên ku wê dişopîne bireser in. Bi Kurmanciya îro em dikarin wiha bibêjin: “her tiştî ku ji destê me dihat”. Ev komeka peyvan bitenê nîşanî yek bireser dikin loma tiştên ku dest bikaribe çêke wekî tiştek hatiye hesibandin. Ji ber ku hêmana bireserê yekjimar e hêmana lêker jî ku wê ji nêzîkî ve elaqedar dike bûye yekjimar. Di netîceyê de li cihê “kirin” ku asayî bi kirdeyê ve ahengdar e bûye “kir” û bi bireserê ve bûye paralel.

**93)** Tê fikirin ya westan dermanî kiya
Bo mirina ‘insanî her tiştek niya
Pêxember te‘am kir mirin û enbiya
Û çakan, salih̲an û mûrselîn û ewliya [136]

[135] b.n., r. 1
[136] Mustafa Dehqan, Alessandro Mengozzi, **A Kurdish Garshuni Poem By David Of Barazne (19th Century)**, Journal of Syriac Studies, Vol. 17.1, 2014, r. 70

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Pêxember | te‘am | kir | mirin | û | enbiya. |

**Şîrove:** Em dikarin bibêjin ku di binyadê helbestê de binpakirina qaîdeyên sentaksê tiştek asayî û xwezayî ye. Çawa ku em mînakê de dibînin lêker li navenda hevokê bi cih bûye û kirde jî hem li serî hem jî li dawî de rêz bûye. Yanî kirde peyvên “pêxember” û “enbiya” ne. Herçend peyva yekem (pêxember) di formeke yekjimar de bibe jî parçeya din (enbiya) pirjimar e. Ji xwe peyvên din ku me wan helnedane şemayê jî tev pirjimar in: “ewliya, çakan, salihan, murselîn”. Bi vê terzî wateya pirjimariyê tekûz e bi te’kîd e. Lê livir di daîreya ergatîvê de yekjimar an jî pirjimariya kirdeyê ne girin e. Tiştê muhim ew e ku em tesbît bikin ka kirde li gorî kîjan şexse û hejmara wê çend e? Livir em dibînin ku lêker li gorî şexsa yekem a yekjimar hatiye şikilandin. Ev yekê jî nîşanî îxtîlafeke eşkere dike. Em dikarin meseleyê bi vê awayî îzah bikin: Jêderka “mirin” wekî hêmaneke yekjimar hatiye qebûl kirin û bi vê terzî lêkerê jî xistiye binê bandora xwe di nav wan de hem ji aliyê hejmarê, hem jî ji aliyê şexsê ve ahengeke çêbûye.

**94)** – Wey ez kuştim, ez kuştim – pîre kire qîrîn û k’et.[137]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Wey | ez | kuştim, | ez | kuştim, | pîrê | kire | qîrîn | û | ket. |

**Şîrove:** Livir behsa tu kirdeyê nekirine, lê em ji çîroka ku ev hevok jê hatiye girtin dizanin ku kirde “hûn” e. “Ez” livir bi wezîfeya bireser hatiye bikaranîn û bûye mijara fi’lê. Ger em vê hevokê dervayî ahagiyên ergatîvê binerxinîn ew wext dibe ku menayî ji sedî sed xelet fêm bikin. Bi gotineke din berevajî qesda nûserê menayekî wisa dertê holê ku “ez” dibe kirdeya lêkerê. Hemin ku wisa ye ji bona me elzem e ku em vê yekê bizanibin: Di daîreya ergatîvê de cînavkên bireserî dibine kirde û cînavkên kirdeyî jî dibine bireser, lê belê lêker dîsa jî ji hêla cînavkên kirdeyî ve tê kesandin. Ji ber vê yekê jî çawa ku em li hevokê de dibînin forma “ez kuştim” derketiye pêşiya me. “Ketin”

[137] Thakston, b.n., r. 173

ku bi xwe lêkereke negerguhêz e bi kirdeyê ve bûye ahengdar û çawa ku di demên fireh û bê de tevdigere livir jî wisa tevgeriyaye.

**95)** Çi de'w? Te bîr kir, H'eso, te bavê min kuşt, bavê min.[138]

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Te | bîr | kir, | H'eso, | te | bavê | min | kuşt, | bavê | min. |

**Şîrove:** Di hevokê de di yek saziyê de du hevok bi hev re hatine pêşkêş kirin û bi vê terzî hevokeke dirêj pêk hatiye. "Bîr kirin" gerguhêz e, yanî ji xwe re bireserekî dixwaze. Livir ji bo bireserê peyvek an du peyv nehatiye bikaranîn lê hevokekî bi tevahî bûye bireser: "Te bavê min kuşt." Lê em dibînin ku ev bireser jî, yanî hevoka ku me hêşka daye di nav xwe de bireserek din dihewîne: "bavê min". Di hevoka ewil de lêker li gorî şexsa sêyem a yekjimar hatiye kesandin û têkilya wê bi "tiştê ku hatiye jibîrkirn" ve heye. Hevoka duyem jî bi şexsa sêyem a yekjimar têkildar e. Kirdeya her du lêkeran jî "te" ye lê tevlî kirde bûna xwe dîsa jî nekariye wan lêkeran bikişîne. Sedem jî ev e ku ev cînavk eslê xwe de bireser e û çiqas jî rola kirdetiyê bigire jî nikare fi'lê bikesîne.

**96)** Babîlon navê bajarekî gelekî kevin e. Wextekê padşayê Babîlonê gelek welatêd din bindest kiribûn. Miletê wî t'evî miletê Îsraêlê şer' kir û ew bindest kirin. Gelek merivêd Îsraêlê çawa xulam birine welatê xwe.[139]

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Miletê | wî | t'evî | miletê | Îsraêlê | şer' | kir | û | ew | bindest | kirin. |

**Şîrove:** Peyvên ku mewqia kirdetiyê girtiye cuzên "miletê wî ne. Ji ber ku van kelîmeyan cihê komekî girtine em dikarin wan hem wekî hebûnek, yanî yekjimar hesab bikin, hem jî wekî şexsên cûr be cûr, yanî pirjimar bibînin. Em ji lêkera "şer kir" bi hêsanî fêm dikin ku wekî hebûnek an jî yekjimar hatiye hesibandin. Wextî em di hevokê de lêkerer negerguhêz bikartînin hewce ye ku kirde û lêker ahengdar bibin. Çawa ku di cumleya duyem de dîtine. Lê di hevoka duyem de navbera kirde û lêkerê ahengek neqewimiye. Em dikarin sedema vê yekê encax bi mahîyeta lêkerê îzah bikin. Hêmana

[138] b.n., r. 170
[139] **Mizgînîya Li Gora Metta**, Moskova: Înstîtuta Welgerandina K'têba Pîroz, 2011, r. 625

ku berê lêkerê dertê pêşiya me, yanî cînavka “ew” çiqas kirde bibe jî livir bi rola bireserê hatiye bikaranîn û cihê “miletê Îsraîl” girtiye. Tiştê ecêb ev e ku “miletê Îsraîl” di pozîsyona kirdeyê de bûye yekjimar û di pozîsyona bireserê de jî bûye “pirjimar”.

**97)** Destpêbûnê da Xwedê ‘erd û ‘ezman ‘efirandin.[140]

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Destpêbûnê | da | Xwedê | ‘erd | û | ‘ezman | ‘efirandin. |

**Şîrove:** Kelîmeya ku di hukmê kirdeyê de ye “Xwedê” ye. Ev peyv nîşanî şexsê yekem a yekjimar dike û xaîb e. Lêkera vê hevokê “efirandin” e ku di dawî de bi cîh bûye. Kesandin jî li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye kesandin. Livir di navbeyna kirde û lêkerê de nakokiyeke xuya dike. Herçend her du peyv jî xaîb bibin jî yekê ji wan şexsê yekem ê din jî şexsa sêyem e. Em dikarin livir vê yekê bipirsin: Gelo lêker li gorî kîjan hêmanê hatiye kesandin? Bersiv ev e ku çareserî di saziya ergatîvî de ye. Bireser “erd û ezman” e û ji ber ku behsa du hêmanan dike bûye pirjimar. Eger bireser pirjimar bibe hewce ye ku lêker jî li gorî wê bibe pirjimar û navbera her du yan de ahengdariyek çêbibe. Jixwe di encamê de jî wisa bûye û “erd û ezman” û “efirandin” ketine harmoniyekî û qaîdeya ergatîvê teheqquq kiriye.

**98)** Lê Sîyabendê e’gît, nêç’irvan,
Xecazerîn gîhand serê Sîpanê,
Ser wî da hat bêdadya giran,
Gak’ûvî ew avît zêrzemyê.[141]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Gak’ûvî | ew | avît | zêrzemyê. |

**Şîrove:** Ji bona ku em berê fêmkirina xelet bigirin pêwist e ku em tesbîtî her wateyeke bikin û ji aliyê sentaksê ve binerxînin. Unsura yekem di wesfa kirdeyê de ye û rola çêkerê helaniye. Hêmana din cînavka “ew” e ku şexsa sêyem a koma bireseran e. Ji bona tehlîleke rast û dirust lazim e ku em têbigihijin ku ev hêmanok ne parçeyeke ji

[140] **Pênc K’têbêd Mûsa**, Moskova: Înstîtuta Welgerandina K’têba Pîroz, 2011, r. 10
[141] Cerdoê Esed, **Ser R’ya E’mir**, Erîva:, Neşîreta Hayastan, 1966, r. 9

kirdeyê ye. Çima ku li dijî saziya xwe mewqiê biresertiye girtiye û wezîfeya mijar bûna kirdeyê pêk aniye, ne edakera wê. Ji ber ku kirde û bireser, her du bi hev re di binyada yekjimariyê de ne em dikarin vê yekê bipirsin: "Gelo lêker li gorî kîjan hêmanê hatiye kesandin?" Bersiv hêsan e: Herçend "ew" bibe bireser jî dîsa cuz'a ku lêkerê kesandiye ew e. Di encamê de kesê ku ji zêrzemyê dikeve Sîyabendê egît û nêçirvan e, ne gakûvî.

**99)** Li 'ezmana hêşîn da
Xwe ra çêkir min malek.[142]

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Li | 'ezmana | hêşîn | da | xwe | ra | çêkir | min | malek. |

**Şîrove:** Di çarçoveya firsendên ku helbest pêşkêşî me dike ev hevok di sentakseke cuda de pêk hatiye û ji xwe re saziyeke qulibandî wergirtiye. Eger em wê bi rêzê û ji nû ve bisazin tiştеke wiha dertê holê: "Min li ezmana hêşîn da xwe ra malek çêkir." Herçend "min" yek ji cînavkên bireserî bibe û wateya objeye girtibe jî di konteksa ku tê de bicîh bûye de menaya "ez" helaniye. Lê dîsa jî li dijî rola xwe ya nû nekariye lêkerê bikesinîne û vê peywirê heştiye ji bona peyva ku cihê biresertiyê girtiye. "Malek" di rola şexsa sêyem a yekjimar e, çima ku ji aliyê hejmarê ve ne pirjimar e û behsa wê bi xiyabî hatiye kirin. Ji ber ku di rola biresertiyê de ye lêkerê kesandiye û li cihê "kirim" ku şexsa yekem a yekjimar îqtîza dike forma "kir" pêkhatiye. Ev form jî bi xwe netîceya ahengdariyê bireser û kirde di saziya ergatîvê de ye.

**100)** Zar'otî û zilamya wî maleke p'ir'nefer da buhurîye. Ewî hema wan çaxa da k'ilam û ç'îro'kê cime'ta xweye dilşewat bihîstine.[143]

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ewî | k'ilam | û | ç'îr'okê | cime'ta | xweye | dilşewat | bihîstine. |

**Şîrove:** Unsura ku wesfa kirdeyê wergirtiye "ewî" ye. Ev yek ne ji wan peyvan e ku em heta niha rastî wan hatine. Çawa ku rêzanên ergatîvê dixwazin hewce ye ku kirde yekê ji koma bireseran bibe lê livir kirde yekê ji koma kirdeyan e. Saziyên vê terzê

[142] b.n., r. 22
[143] Seh'îdo Îbo, **Sînem**, Erivan: Neşîreta Hayastan, 1966, r. 22

gelemperî di Kurmanciya Serhedê de tên dîtin û hewce ye ku em li ser wan jî wekî ergatîveke serbixwe bisekinin. Peyvên ku cihê bireserê girtine raveka zencîrî ya “kilam û çîrokê cimeta xweye dilşewat” e. Ji ber ku li cihê şexsa sêyem a pirjimar girtiye lêker jî bi paralelî bûye wekî wê û forma “bihîstine” derketiye holê. Di encamê de herçend ku di destpêkê de rewşeke awarte xuya bike jî di harmoniya bireser û kirdeyê de tu derasayî neqewimiye.

## BEŞA DÛYEM

## DI HÎNDÎ DE ERGATÎVÎ Û MÎNAKÊN HÎNDÎ

### 2.1. DI HÎNDÎ DE ERGATÎVÎ

Ergatîvî di Hîndî de bûyereke gramatîk e ku mekanîzmaya wê dişibe Kurmancî. Yanî di dema borî de eger lêker gerguhêz bibe ji hêla bireserê ve tê kesandin, ne ji hêla kirdeyê ve. Em dikarin van qaîdeyan wiha birêz bikin:

**1)** Lêker, gerguhêz e, yanî divê ku pê re bireserekê bê bikaranîn.
**2)** Lazim e ku lêker di dema borî de (di şaxên dema borî de) bê kesandin
**3)** Lêker ji her aliyan ve, yanî ji hêlên hejmar, şexs û zayendên ve bi bireser ve dikeve ahengdariyê. Bi gotineke din bireser û lêker dikevin hevahengiyeke bêkêmasî.
**4)** Kirde bi daçeka "ने" (nê) tê diyar kirin. Yanî ev daçek piştî kirdeyê tê bikaranîn û em bi saya wê dizanin ku lêker dê di formeke derasayî de bê bikaranîn.

कृष्ण कुमार ने एक नई मोटर साइकिल ख़रीदी है।[144]
[Krişnakumâr nê êk naî motar saikil xarîdî he.]
(Krişnakumâr, motorsiqletekê kirîye.)

Mînaka jorê çar taybetmendiyên ergatîvîyê jî dihewîne û mînakeke kamil e. "Krişnakumâr", yanî kirdeya lêkerê pey xwe de daçeka "nê" helaniye û bi vî awayî rêzika çarem pêk hatiye. Lêkera "xarîdî he" (kirîye) ku di dawî de bicîh bûye nîşan dide ku lêker di dema borî de hatiye kesandin. Bi vê terzî rêzika duyem jî qewimiye. Ji ber ku "xarîdî he" ji bo temam bûna hevokê ne bes e, yanî mirov mentiqa xwe de kêmasiyekê hîs dike û dipirse gelo"Krişnakumâr" çi kirîye rêzika sêyem jî pêk tê. Bi gotineke din lêker gerguhêz û bireserekê dixwaze. Di dawî de biresera "motar saikil" bi zayendaya xwe ya "mê", bi hejmara xwe ya "yekjimar" û bi şexsa xwe ya "şexsa sêyem" lêkerê kesandiye û wê şibandiye xwe. Di encamê de rêzika çarem jî ketiye çarçoveya ergatîvîyê û mînaka ku me nîşan daye bi temamî wesfên wê hewandine.

Eger di lêkereke terkîbî de navdêrêkê hebe ew wekî biresera lêkerê tê qebûl kirin û wê dişibîne xwe. Yanî lêkereke terkîbî de hêmana navdêrê lêkerê têxe bin bandora

[144] N. Sreedharan, **Learn Hindi Through English**, Chennai: Sura Books, 2006, r. 81

xwe û wê ji her sê rehendên ve dişebîne xwe. Meselen di fi’la “anuvâd karnâ” de “anuvâd” nav û “karnâ” jî fi’l e. Bi vî şeklî êdî ne hewce ye ku em biresereke din bigerin, çima ku di terkîbê de navekî heye û ew nav rola biresertiyê wergirtiye. Bo ku em mijarê zelaltir fêm bikin em dikarin van pirsan bînin ziman: “Gelo filankes çi kiriye?” “Filankes tercume kiriye.” Livir em dikarin pirseke din jî tewcîh bikin: “Ka ew çi tercume kiriye?” Dibe ku bersiv wiha bibe: “Ew roman tercume kiriye.” Di Hîndî de eger li cem lêkereke terkîbî bireserekê bê bikaranîn jî dîsa lêker ne li gorî wê, lê belê li gorî ev navdêra ku di terkîbê de ye tê kesandin. Yanî livir peyva “roman” ne giring e û bandora wê li ser lêkerê çênabe. Lê peyva “tercume” ku li cem lêkerê terkîbekê çêdike lêkerê têxe bin bandora xwe û wê ji aliyên hejmar, şexs û zayendê ve dikesîne.

उस पंडित ने ऋगवेद का अनुवाद किया था।[145]
[Us pandit nê rigvêda kâ anuvâd kiyâ thâ.]
(Ew ‘alim Rig Vedayê tercume kiribû.)

Çawa ku em di vê mînakê de dibînin hêmana “karnâ” li gorî bireserê an jî peyva “anuvâd” hatiye kesandin û di dema borî ya domdar da bûye “kiyâ thâ”. Yanî lêker û bireser ji her sê cîhetan ve bûne wekî hevûdu.

Carna jî lêker tevlî bûyina xwe ya gerguhêz nakeve daîreya ergatîvîyê û li gorî bireserê naye kesandin. Ji ber ku vê rewş jî qaîdeke serbixwe ye em nikarin wan wekî îstîsna qebûl bikin. Em niha dest bi daçeka “ko” bikin û di kîjan rewşan de em dikarin xaricî ergatîvîyê derkevin birêz bikin û ji bo her yekê ji wan rewşan re mînak bidin:

Eger di hevokekê de daçeka “ko” bê bikaranîn êdî wesfên bireserê, yanî ji taybetmendiyên wê yên nêr/mê, yekjimar/pirjimar, şêxsa yekem/duyem, sêyem re qiymet nadin û lêker her daim di formeke sabît de dimîne.

मोहन ने बहिन को बुलाया।[146]
[Mohan nê bahin ko bulâyâ.]

[145] b.n., r. 85
[146] Koul, b.n., r. 38

(Mohan, gazî xwişkên xwe kirin.)

मोहन ने बहनों को बुलाया।[147]

[Mohan nê bahno ko bulâyâ.]

(Mohan gazî xwişka xwe kir.)

Çawa ku tê dîtin yekjimarî û pirjimariya bireserê yaxûd mêtî û nêrîti ya wê li ser lêkerê çi bandorekê nekiriye û ew li ser forma şexsê sêyem ê nêr û yekjimar de maye. Hewce ye ku em bibêjin ku çend lêker hene ku dervayî qaîdeya ergatîvîyê dimînin û bireser li ser lêkerê bandordar nabe û wekî demên fireh û bê lêker ji hêla kirdeyê ve tê kesandin. Yanî hevahengî di nav kirde û lêker de ye û taybetmendiyên dema fireh û dema bê livir jî tekrar dibe. Ji ber ku hejmara wan kêm in em dikarin wan wekî îstîsna qebûl bikin. Em van lêkeran dikarin bi vê terzî pêşkêş bikin: “Lânâ” (anîn), “khêlna” (leyistin), “bolnâ” (axaftin), “bhûlna” (jibîrkirin), “baknâ” (leqeleq kirin). Ser de jî tiştê ku bala me dikşîne ew e ku piştî kirdeyan daçeka “nê” nayê bikaranîn.

उमा कमीज़ लाई।[148]

[Umâ kamîz lâî.]

(Umâ îşlik anî.)

Çawa ku tê dîtin “Umâ” bi yekjimarî û mêtiya xwe lêkerê kesandiye û taybetmendiya xwe daye wê. Ji bilê vê daçeka “nê” nehatiye bikaranîn û vê yekê bûye delîleke din ji bo tunebûna ergatîvîyê. Hevokên ku me di jêr de birêz kirin mînakên din in ji bo vê rewşa awarte.

लड़का बोला और लड़की बोली।

[Larkâ bolâ aur larkî bolî.]

(Kurik axivî û keçik axivî.)

वह रास्ता भूला।[149]

[147] b.n., r. 38
[148] b.n., r. 38
[149] b.n., r. 39

[Vah rastâ bhûlâ.]
(Ew, rê jibîrkir.)

Çend lêkerên negerguhêz jî hene ku dikarin daçeka”nê”, yanî elameta ergatîvîyê helînin. Em dikarin wan jî îstîsna qebûl bikin loma muxayirî rewşa gelemperî ne. Em dikarin wan jî wiha birêzbikin: “Çhîknâ” (hilpişkîn), “khâsnâ” (kuxîn), “nahânâ” (serê xwe şûştin) ve “thûknâ” (tû kirin).

तुमने सड़क पर क्यों थूका ?[150]
[Tumnê sarak par kyo thûkâ? ]
(Te çima  ser rê tû kir?)

Çend lêker jî hene ku çiqas bireser bixwazin jî daçeka “nê” bikarnayni û aheng di nav bera bireser û lêker de pêk nayê û wekî demên fireh û bê aheng di nav bera kirde û lêker de diqewime: “Lagnâ” (dest pê kirin), “çuknâ” (qedandin) ve “saknâ” karîn).

वह सेब खाने लगा।[151]
[Vah sêb khânê lagâ.]
(Ew dest bi xwarina sêvan kir.)

मैं यह काम कर चुका।[152]
[Me yah kâm kar çukâ.]
(Min vê îşê çêkir û qedand.)

वह चिट्ठी लिख सका।[153]
[Vah çitthî likh sakâ.]
(Wî karîbû nameyekê binîvise.)

---

[150] b.n., r. 85
[151] b.n., r. 40
[152] b.n., r. 40
[153] b.n., r. 40

Ji bo çend lêker jî meselen “samachnâ” (fêmkirin) ve khêlnâ (leyistin) bikaranîna “nê” tercîhî ye. Yanî  Yanî ku em bixwazin em dikarin wê bikarbînin û ku em nexwazin em wê bikarnaynin. Eger em ji daçeka “nê” îstîfade bikin em hevokê jî li gorî wê, yanî li gorî qaîdeyên ergatîvê dadimezrînin. Eger ne wisa be, hevok wekî demên fireh û bê tê saz kirin.

मैंने उस की बात समझी।[154]

[Menê uskî bât samachî.]

(Min qewla wî fêmkir.)

मैं उस की बात समझा।[155]

[Me uskî bât samachâ.]

(Min qewla wî fêm kir.)

उसने हाकी खेली।[156]

[Usnê hâkî khêlî.]

(Wî hokey leyist.)

उस हाकी खेला।[157]

[Us kâhî khêlâ.]

(Wî hokey leyist.)

Di bikaranîna daçeka “nê” de çend cînavk hene ku naguherin û çend cînavk jî hene ku dikewine tewangê. Di tabloya jêr de ji bo her yek ji cînavkan halên wan yên cuda û yên hevbend hatiye nîşan dan.[158]

.

[154] b.n., r. 40
[155] b.n., r. 40
[156] b.n., r. 41
[157] b.n., r. 41
[158] Special forms of pronouns when used with ने, http://hindilanguage.info/hindi-grammar/verbs/ergativity/ (11/11/2016)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| मैं | Me | मैंने | Me | Ez |
| तू | Tû | तूने | Tûnê | Tu |
| तुम | Tum | तुमने | Tumnê | Tu, Hûn |
| आप | Âp | आपने | Âpnê | Hûn |
| यह | Yah | इसने | İsnê | Ev, Ew |
| वह | Vah | उसने | Usnê | Ew |
| हम | Ham | हमने | Hamnê | Em |
| ये | Yê | इनहोंने | İnhonê | Van, Ew |
| वे | Vê | उन्होंने | Unhonê | Ew |

Ergatîvîya Hîndî ku me di çarçoveke gelemperî de teqdîm kirin çiqas tevlihev xuya bike jî piştî pratîk û hinkeran di demek şûn de dibe melekeyekê û êdi axivker zêde zehmet nakşîne. Tiştê giring ew e ku em bizanibin li kû derê daçeka “nê” tê bikaranîn, li kû derê tê jê kirin û li kû derê tercîhî ye. Ser de jî em bizanibin ku çend rewşên îstîsnaî jî hene ku em nikarin di wan de mekanîzmaya ergatîvîyê bişuxilînin. Çend cînavk hene ku wextê “nê” werdigirin diguherin û çend cînavk jî hene ku di heman formên xwe yên eslî de dimînin. Lazim e ku em van forman jî bizanibin. Bi kurtasî ergatîvî wekî hemû mijarên rêzimanê girêdayî qaîdeyan diyar in û mirov wan bi rêyeke baş bi’elime di demek şûn de êdî dibin parçeyeke ji axaftina wî û pirsgirekên ku berê wî şaş dikir ji holê radibin.

## 2.2. MÎNAKÊN HÎNDÎ

**1)** हमने सन्त्रा खाया।[159]

[Hamnê santrâ khâyâ.]

(Me porteqal xwar.)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ham | -nê | santrâ | khâyâ. |

**Şîrove:** Di Hîndî de qaîdeke wisa heye ku di dema borî de li cem lêkerên gerguhêz kirde bi wesîleya daçeka "nê" tê mueyyen kirin. Bi gotineke din wextî lêker bi vê paşqertafê tê nîşandan mirov fêm dike ku hinek şûn de lêkereke gerguhêz dê were bikaranîn û qaîdeya egratîvê dê pêk bê. Eger kirde cînavkeke bibe "nê" pê re dizeliqe lê eger kirde ji navdêreke teşkîl bibe hingê em dikarin wê pê bileliqînin an jî cuda binivîsin. Kengî ev paşqertaf bi cînavkekê re bizeliqe di hinekan de guhertin çêdibê û di hinekan de tu guherîn cihêtî çênabe. Livir di mînakê ku em nîşandane cînavk "ham" e û "nê" nekariye ku ser de tu guherîn pêk bîne. Hêmana ku berê lêkerê bicîh bûye (santrâ) bireser e. Ji aliyê bandorkirina lêkerê ve bireser gelek giring e û hewce ye em hem hejmar, şexs û zayendê wê mêze bikin. Ji ber ku "santrâ" yekjimar e û nêr e û cihê şexsa sêyem girtiye lêker jî herwiha bûye yekjimar, nêr û şexsa sêyem. Bi vî awayî jî saziyeke wisa qewimiye ku kirde li der ve maye û bireser û lêker li cem hev ahengdariyeke ava kirine.

**2)** उसने सन्त्रा खाया।[160]

[Usnê santrâ khâyâ.]

(Ew porteqal xwar.)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Us | -nê | santrâ | khâyâ. |

**Şîrove:** Peyva ku di hukmê kirdeyê de ye "us" e. Ev cînavk esases forma kesandî a "vah" e ku bi wateya "ew" tê bikaranîn. Çawa ku em li jor de gotibûn çend

[159] H. Derya Can, Canan Erdemir, **Hintçe Gezi ve Konuşma Rehberi**, Ankara: Delta Kültür Yayınevi, 2015, s. 20

[160] b.n., r. 20

cînavk hene ku bi paşqertafa “nê” formên xwe yên esil wenda dikin û çend cînavk jî hene ku dimînin ser eslên xwe. “Vah” çi nêr û çi mê bibe jibo şexsa sêyem a yekjimar tê bikaranîn. Ji bikaranîna wê em fêm dikin ku kesê an jî tiştê ku behsa wê tê kirin ne li hawir de ye. Yanî em vê cînavkê ji bo hêmanên ku li dûre me ne bikartînin. Lê ger em bixwazin ku behsa tiştekî an kesekî nêzik bikin hingê em cînavka “yah” bikartînin. Wextî van her du cînavkan, yanî “vah” û “yah” bi paşqertafa “nê” bikevine têkiliyê hingê qaîdeya tewang dertê holê û ji xwe re formên “us” û “is” werdigrin. Em dikarin vê guherînê bişibînin meseleya “koma yekem a cînavkan” û “koma duyem a cînavkan”. Mesela wextî em daçeka “ji” bikarbînin em nikarin cînavkên koma yekem bikarin. Çawa ku “ji ez” xelet e û di Kurdî de naye gotin wisa jî “vah nê” jî ne rast e. Hewce ye ku em Kurdî bibêjin “ji min” û Hîndî de bibêjin “ us nê”.

Peyva duyem ku di hevokê de derbas dibe “porteqal” eû di forma yekjimariyê de ye. Lêker jî li gorî wê bûye yekjimar û pê re ketiye ahengê. Em dikarin zenn bikin ku kirde û lêker, nav xwe de hevaheng in û ji her sê cihetan, yanî ji aliyên şexs, hejmar û zayendê ve paralel in. Lê ev yekê xelet e. Çima ku di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz aheng navbera bireser û lêkerê de diqewime û ger navbera kirde û lêkerê ahengek bixuye jî ew bitenê tesadufî ye.

**3)** तूने सन्त्रे खाए।[161]

[Tûnê santrê khâê.]

(Te porteqal xwarin.)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Tû | -nê | santrê | khâê. |

**Şîrove:** “Tû” ku di rola kirdeyê de hatiye bikaranîn ji wan cînavkan e ku wextî li cem “nê” bê bikaranîn naguhure. Peyva “santrê” ku di mewqia bireser de hatiye bikaranîn û wateya wê “porteqalan” e di formeke pirjimariyê de bicîh bûye. Em dikarin vê yekê ji tewanga herfa “a” bi hêsanî têbigihijin ku di encamê de bûye “ê”. Hêmana dawî, yanî lêker li gorî hêmana ku berê wê de hatiye bikaranîn ji xwe re şikl girtiye û navbera wê û kirdeyê de nakokiyek çêbûye. Sedem ew e ku li gorî qaîdeya ergatîvê di

[161] b.n., r. 21

dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz, lêker ne li gorî kirdeyê, lê belê li gorî bireserê tê kesandin.

**4)** मैंने रोटी खाई।[162]

[Me̱nê roṯî̱  khâî.]

(Min nan xwar.)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Mĕ | -nê | roṯî̱ | khaî. |

**Şîrove:** Di Hîndî de zayendên navdêran ne bitenê li ser tewanga navdêran, herwiha li ser lêkeran jî xwedî bandor in. Bi gotinek din di zemana borî de û di kesandina lêkereke gerguhêz de hem hejmara navdêrê, hem jî zayenda wê pir giring e. Di mînaka xwe de dibînin ku "roṯî̱" aliyek ve yekjimar û aliyek din ve jî mê ye. Bi vî awayî ew lêkerê jî xistiye yekjimar û mê. Me berê dîtibû ku peyva "santrâ" yekjimar û nêr e û lêkera ku jê hevrahî dike bi "–a"  diqede. Wisa jî peyva "roṯî̱" sedem bûye ku lêker bi "–î" biqede. Ev taybetmendî di Kurdî de xuya nabe. Di Kurdî hevahengî bi tenê ji aliyên hejmar û şexsê ye. Lê di Hîndî de vê yekê xwedî sê rehend in: Hejmar, şexs û zayend.

**5)** आपने रोटीयां खाईं।[163]

[Âpnê roṯiyâ̱ khâî̱.]

(We nan xwarin.)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Âp | -nê | roṯiyâ̱ | khâî̱. |

**Şîrove:** "Âp" li cihê muxatebê ê pirjimar tê bikaranîn û piranî ji bona îfadekirina resmîyet û nezaketê tê şixulandin. Yanî li hemberî me bitenê kesekî hebe jî em dikarin wê bikarbînin. Wextê ku bi daçeka "nê" were bikaranîn tu guhertin pêk nayê. Hêmana din bireser e û ji ber ku ji aliyê hejmarê ve pirjimar û ji cihetê zayendê jî mê ye forma "roṯiyâ̱" wergirtiye. Ji ber ku hemû wesfên bireserê di lêkerê de jî eynen tê tekrar kirin

[162] b.n., r. 21
[163] b.n., r. 22

livir lêker jî bûye şexsa sêyem a pirjimar û mê. Bi gotineke din em dikarin bitenê ji xusûsiyetên lêkerê derxînin ka kîjan hêman wê kesandiye û xistiye bin bandora xwe. Di encamê de navbeyna bireser û lêkrê ve hevahengiyek tekûz qewimiye û her du ji her sê aliyan ve li hev hatine.

**6)** वे बाज़ार गाये।[164]

[Ew çûn bazarê.]

| | | |
|---|---|---|
| Vê | bâzâr | gâyê. |

**Şîrove:** Di vê mînakê de cih daye mînakekî ku lêkera wê negerguhêz e daku em vê bi yên din muqayese bikin. “Cânâ” tê wateya “çûyîn” û di dema borî de wextî li gorî şexsa sêyem a yekjimar bê kesandin dibe “gâyâ”. Lê ev jî li gorî şexsa sêyem a pirjimar biguhure dibe “gâyê”. Di Hîndî de ji bo lêkera “çûyin” daçekekî nayê bikaranîn û wateya berêxwedayîn bi awayekî veşartî tê nîşandan. Ji ber vê yekê ye ku peyva “bâzâr” bê qertaf, an jî sade hatiye bikaranîn. Çawa ku tê dîtin ahengdariya bireser û lêker pêk nehatiye û kirde û lêker li hev hatine. Bes qaîdeya ergatîvê nehatiye tetbîq kirin. Sedem jî ew e ku lêkera “cânâ”, yanî “çûyîn” ne tranzîtîv e û qet bireser nagire.

**7)** तुमने सेब खाया है।[165]

[Tumnê sêb khâyâ he.]

(We nan xwariye.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Tum | -nê | sêb | khâyâ | he. |

**Şîrove:** Cînavka “tum” ku tê wateya “hûn” hem ji bo şexsa duyem a yekjimar, hem jî ji bo şexsa duyem a pirjimar tê bikaranîn û her tim dixwaze ku lêker, çi eslî û çi arîkar bibe pirjimar. Wextî ku daçeka “nê” pê ve bizeliqe tu guhertinek pêk naye. Dî hevoka me ya mînakî de peyva ku cihê bireserê girtiye “sêb” e. Ev peyv ku wateya wê “sêv” e ji aliyê hejmarê ve yekjimar e û ji aliyê cinsiyetê jî nêr e. Ji ber vê yekê ye ku

[164] b.n., r. 22
[165] b.n., r. 22

hêmana “khâyâ” ku di wezîfeya lêkerê de ye û lêkera arîkar a “he” ku navbera dema borî û dema niha de têkîliyek ava kiriye, ji her aliyan ve bûne tabiê bireser. Bi gotineke din hêmanên “khâyâ he” ku li hevokê di pozîsyona lêkerê de ne digel objeyê ketiye nav ahenegeke tekûz û bê kêmasî. Bi vê terzî jî ew qaîdê (ergatîv) pêk hatiye ku di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz fi’l bireserê dişopîne û ji her sê cihêtê jî dişibe wê.

**8)** मैंने सेब खाए हैं।

[Menê sêb khaê he.]

(Min sêv xwarine.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Me | -nê | sêb | khaê | he. |

**Şîrove:** Du hêmanên ewil ku bi hev re hatine nivîsandin nîşanî kirdeyê dikin. “Me” bi wateya “ez” e lê di çarçoveya ergatîvê de hewceye ku em ji bona miqabila wê “min” bikarbinîn. “Nê” jî daçeka ergatîvîyê ye ku bê wê me’na tekûz nabe lê li Kurdî de ji bo vê yekê miqabileke tune ye. Peyva “sêb” bixwe yekjimar e lê wekî ku paşqertafa pirjimariyê heline bi wateya pirjimariyê hatiye bikaranîn. Sedema vê yekê ev e ku hinek ji peyvên nêr paşqertafa pirjimariyê helnadin. Çawa ku bireser bûye pirjimar û nêr û şexsa sêyem wisa jî lêker van taybetmendiyan helaniye û bûye pirjimar û nêr û şexsa sêyem. Eger me lêkerê li gorî kirdeyê saz bikirana wê çax lêker dibûya “khâyâ hû” û forma xwe ya nika ji dest dida.

**9)** आपने मेरी बहुत मदद की। धन्यवाद।[166]

[Âpnê mêrî bahut madad kî. Dhanyavâd.]

(We gelek arîkariya min kir. Spas.)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Âp | -nê | mêrî | bahut | madad | kî. | Dhanyavâd. |

**Şîrove:** Lêkera “arîkarî kesekî bûn” formeke hevedudanîye. Qisma yekem navdêr e (madad) û qisma duyem jî lêker e (karnâ). Ev sazî di nav xwe de binyadeke gerguhêz a nixumandî dihewîne. Em dikarin bipirsin ka “kê arîkarî kiriye” û bersiv

[166] b.n., r. 85

bidin ku “ew arîkarî kiriye”. Loma peyva “madad” mijara lêkera “karnâ” ye. Çawa ku di daîreya ergatîvê de bireser lêkerê dikesîne wisa jî “karnâ” ji hêla “madad” ve hatiye kesandin û bûye “kî”. Tiştê ku livir bala me dikişine ew e ku “bahut” yanî “zêde” wateyê teqwîye kiriye lê bireser dîsa jî yekjimar maye. Tiştek din a balkeş jî ew e ku “mêrî” yanî sifeta aîdîyetê livir bi wateya “ji min re” hatiye bikaranîn.

**10)** एक दिन एक आदमी ने कछुए की बांसुरी सुनी।[167]

[Êk din êk âdmî nê kaçhuê kî bânsurî sunî.]

(Rojeke mêrekî flata kîsoyê seh kir.)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Êk | din | êk | âdmî | nê | kaçhuê | kî | bânsurî | sunî. |

**Şîrove:** Du hêmanên ewil (êk din) hokerên demê ne. Du hêmanên du wan dişopînin jî (êk âdmî) di mewqia kirdeyê de ne û ji bo analîza saziya ergatîvê pir giring e. Unsura din (nê) parçeyekê ye ku nîşanî lêkereke gerguhêz û rabirdû dike û bi serê xwe ne xwedî menakî ye, lê xwedî fonsksîyonekê ye. Sê unsurên ku wê teqîb dike jî (kaçhuê kî bânsurî) ji aliyê ergatîvê ve pir muhim e, ji ber ku teşkîlî bireserê dike an jî em dikarin bibêjin ku obje ji van her sê peyvan pêk hatiye. Hêmana herî dawî jî (sunî) lêker e û bi kesandina xwe ji hêla bireser ve ji me re mentiqa ergatîvî vi zelalî vedibêje.

“Êk admî” hem yekjimar e, hem jî nêr e. Eger lêker ku di dawiya hevokê de bicîh bûye li gorî wê bihata kesandin ew çax dibûya “sunâ”, ne “sunî”. Hingê em nikarin behsî ahengek di nav kirde û lêkerê de bikin. Hemin ku wisa ye hewce ye ku em bipirsin ka kîjan hêman lêkerê kesandiye. Bersiv ev e ku di daîreya ergatîvê de bireser lêkerê dikesîne. Bireser ji çi sê parçeyan pêk hatiue: “Kâçhuê kî bânsurî”, yanî fluta kîsoyê. Peyva “flut” bi yekjimarî û mêtiya xwe lêkerê jî xistiye bin bandora xwe û ew jî bûye yekjimar, mê û şexsa sêyem.

**11)** अचानक, उन्हें बाहर एक आवाज़ सुनाई दी।[168]

[Açânak, unhe̱ bâhar êk âvâz sunâî dî.]

(Wî ji nişka ve li derva dengekî bihîst.)

[167] Kaçuê Kî Bansurî (कछुएकी बांसुरी), www.bookbox.com (11/11/2016)
[168] Senta Ka Krîsmas (सैण्टा का क्रिसमस), www.bookbox.com (15/11/2016)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Açânak | unhê | bâhar | êk | âvâz | sunâî | dî. |

**Şîrove:** Peyva ewil (açânak) yek hokerekê ye ku xebera ji nişka ve bûyîna fi’lê dike. Hêmana ku wê te’qîb dike (unhê) forma tewang a cînavka “vê”, şexsa sêyem apirjimar e. Di çarçoveya hevokê de îsî’mala vê formê ji bona şexsekî munferîd ji bona hurmetê ye. Bi gotineke din wextî em li cihê şexsê sêyem ê yekjimar formeke pirjimar bikarbînin ew dibe tiştek îtibarî, yanî subjektîf û ji bo wê kesê ku mijara vê formê ye jî dibe sedema medh û te’zîm. Forma pirjimariyê girêdayî kîjan sedemê dibe bila bile lêker jî li gorî wê tevdigere û li paralelê wê de tê sazkirin. Lê livir di mînakê de kirde û lêker di nav xwe de ketine nakokiyekê. Sebeba vê yekê ew e ku lêker li gorî bireserê hatiye şikilandin. Peyva “bâhar” ku bi serê xwe ve bûye hokera cihê tê wateya “li derve”. Ew du hêman ku li pey de tên, “êk âvaz”, di pozîsyona bireserê de ne û ji hêla hejmar yekjimar û ji hêla zayendê jî mê ye. Lêker jî (sunâî dî) ji du parçeyan pêk tê ku her du jî fi’l in. Ya berê tê wateya “seh kirin” û ya din jî tê wateya “dayîn”. Ev her du lêker jî ji hêla her du terefan ve, yanî hem ji aliyê hejmarê û hem jî ji aliyê zayendê ve pê re ketiye ahengê û bi vê terzê jî ergatîv qewimiye.

**12)** राम ने एक घोड़ा ख़रीदा।[169]

[Râm nê êk ghorâ xarîdâ.]

(Râmî hespekî kirî.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | nê | êk | ghorâ | xarîdâ. |

**Şîrove:** “Râm” navekî nêr e û ji ber ku cihê navekî taybet girtiye bi xwezayî dibe şexsa sêyem. Wextî em li lêkerê mêz e bikin dibînin ku ew jî di forma nêrîtî û yekjimartî de hatiye bikaranîn. Livir navbera kirde û lêkerê de ahengeke xuya dike. Lê sedema vê ahengê ne ew e ku kirde û lêker li hev hatine, lê belê tenasuba bireser û lêker e. Bi gotineke din ev harmonî ne di navbera kirde û lêkerê ye, lê di navbera obje û fi’lê ye û ew harmoniya ku ji rûve xuya dike jî bi temamî tesadufî ye. “Ghorâ”, yanî “hesb” jî hêla hejmarê ve yekjimar û ji hêla zayendê jî nêr e. Bi van taybetmendiyên xwe

[169] Dr. N. Sreedharan, b.n., r. 74

sedem bûye ku lêkera “xarîdna” jî bibe nêr û yekjimar û bi vê terzî jî kesandina “xarîda” derketiye holê. Di encamê de em arek din jî bibêjin ku têkîliya vê kesandinê û kirdeya “Ram” tune ye û şibandina wan bi hevûdu bitenê pîşad e.

**13)** राम ने दो घोड़े ख़रीदे।[170]

[Râm nê do ghoṟê xarîdê.]

(Râmî du hesp kirîn.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | nê | do | ghoṟê | xarîdê. |

**Şîrove:** “Râm” navekî taybet e ku di mewqia kirdetiyê de ye û nîşanî şexsekî yekjimar û nêr dike. Ew daçeka ku pey de tê jî (nê) behsa du fonksîyonên cuda dike: “Dema borî û lêkera tranzîtîf”. Hêmana din jî (do) rengdêra hejmarê ye û ew forma ku di pey de tê wê têxe qaliba pirjimartiyê. “Ghora” yekjimar û “ghorê” pirjimar e. Hêmana herî dawî (xarîdê) lêker e û ji her du aliyan ve, yanî hem ji aliyê hejmarê, hem jî ji aliyê zayendê ve anagora bireserê hatiye kesandin û pê re bûye ahengdar. Bi vê terzî jî qaîdeya ergatîvê, yanî kesandina lêkerê li gorî bireserê pêk hatiye.

**14)** राम ने एक गाय ख़रीदी।[171]

[Râm nê êk gây xarîdî.]

(Râmî çêlekeke kirî.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | nê | êk | gây | xerîdî. |

**Şîrove:** “Râm” kirdeyeke nêr û yekjimar e û bi daçeka ku wê şopandiye bûye yekbûnîyeke tekûz. “Êk” rengdêra hejmarê ye û ji bona zayenda peyvê ku wê te’q^,b dike tu delîlek nahewîne. Lê dîsa jî îqtîza dike peyv bibe yekjimar. “Gây” yanî çêlek navdêreke yekjimar û mê ye. Naxwe lêkera “xarîdna” yanî sitandin ji ber vê peyvê bûye “xarîdnî”. Bi vê terzî jî navbera bireser û lêkerê harmoniyek bê kemasî qewimiye ku hem nîşanî hejmarê, hem jî zayende dide.

[170] b.n., r. 75
[171] b.n., r. 75

**15)** राम ने दो गायें ख़रीदीं।[172]

[Râm nê do gâyê xarîdî.]

(Râmî du çêlek kirîn.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | nê | do | gâyê | xarîdî. |

**Şîrove:** Râm naveke taybet e ku pozîsyona kirdetiyê girtiye. Ji hêla zayendê nêr û ji hêla hejmarê jî yekjimar e. Hêmana din “nê” ye û hewce ye ku digel kirde bê nirxandin. Her du hêmanên din (do gâyê) teşkîlî bireserê dikin û ji aliyê hejmarê pirjimar û ji aliyê zayendê jî mê ne. Cuza dawî jî lêker e. Di navbera vê parçeyê û faîl de nakokiyek pir eşkere xuya dike. Yekî ji wan yekjimar û nêr e û yekê ji wan jî pirjimar û mê ye. Sedema vê yekê ev e ku lêker ji hêla bireser ve ku rasterast berê wê de bicîh bûye hatiye kesandin. Ev hevahengî ewqas li hev hatiye ku dengekî nazal ku di kutaya dawî ya navdêrê “do gâyê” de heye eynen di kutaya dawî ya lêkera “xarîdî” de jî hatiye tekrar kirin û bi vê rezî jî ev paralelî ji her alî ve pêk hatiye.

**16)** सीता ने एक पत्र लिखा।[173]

[Sîtâ nê êk patr likhâ.]

(Sîtayê nameyeke nivîsî.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Sîtâ | nê | êk | patr | likhâ. |

**Şîrove:** “Sîtâ” navekî mê ye û ji ber ku navekî taybet e an jî bitenê nîşanî şexsekî dike cihê şexsa sêyek a yekjimar girtiye. Em nikarîn wê ji daçeka “nê” cuda bifikirin loma di dema borî de li cem lêkerên gerguhêz hewce ye ku ev peyvik were bikaranîn. “Êk” rengdêra hejmarê ye û livir ji hejmarê zêdetir delaletî gelemperîtiyê dike. Yanî “Sîtâ” ji nav nameyeke (êk patr) nivîsiye û ne pêwist e ku em bi taybetî behsa wê bikin. Peyva “êk” çi hejmara eslî, çi hejmara gelemperî, di kîjan peywir de bê bikaranîn jî ferq tune ye,lazim e ku navdêra ku wê dişopîne bibe yekjimar. Çawa ku

[172] Sreedharan, s. 75
[173] Sreedharan, s. 75

kelîmeya “patr” jî yekjimar hatiye bikaranîn. Lêker ku li dawiya hevokê de hatiye çiqas yekjimar û şexsa sêyem bibe jî ji aliyê zayendê ve bi kirdeyê ve li hev nehatiye û nakokiyeke derxistiye holê. Bes kirde û lêker ji hev gelek cuda ne û eşkere ye ku lêker ji hêla kirdeyê ve nehatiye kesandin. Eger wisa ye em bipirsin ka kê lêkerê kesandiye? Bersiv hêsan e: Bireser, yanî “patr” e. Çima ku wê her du taybetmendiyên xwe, yanî yekjimartî û nêrîtiya xwe dane lêkerê.

**17)** सीता ने दो आम खाए।[174]

[Sîtâ nê do âm kâê.]

(Sîtâyê du mango xwarin.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Sîtâ | nê | do | âm | khâê. |

**Şîrove:** “Sîtâ” navekî taybet e û xwedî taybetmendiyên yekjimartî û nêrîtî ye. Di çarçoveya mînakê me de li cem “nê” parçeyek nedabeşbar pêk aniye. Du peyvên ku wan dişopîne bireser e (do âm) û ji aliyê cinsiyetê ve nêr û ji hêla hejmar jî pirjimar e. Herçend peyva “am” (fêkiyek tropîkal e ku li Hîndîstanê gelek belavbûyî ye) di zahîr de yekjimar bibe jî fonksîyoniya pirjimariyê meşandiye. Tiştê ku vê fonksîyonê pêk aniye hêmana “do” ye. Lê em dikarin bipirsin ka ev peyv çima paşqertafa pirjimariyê helnedaye. Bersiv ev e ku navdêrekî bibe nêr û tîpa wî ya dawî jî bibe dengdar ji bo wê paşqertafa pirjimariyê nayê bikaranîn. Hêmana dawî ku lêker e di nav xwe de pirjimariyê û nêrîtîyê dihewîne. Ev jî vê yekê îsbat dike ku lêker li gorî bireserê hatiye kesandin û ji her sê aliyan ve yekûdu girtine.

**18)** राम ने सीता को देखा।[175]

[Râm nê Sîtâ ko dekhâ.]

(Râmî Sîtâyê dît.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | nê | Sîtâ | ko | dekhâ. |

[174] b.n., r. 75

[175] b.n., r. 75

**Şîrove:** "Râm" di hukmê kirdeyê de ye. "Sîtâ" jî di wesfa bireser de ye. Wextî ku em lêkerê ji perspektîfên hejmar û zayendê ve binerxînin em têdigihijin ku ew ne li gorî bireser e. Bi gotinek din di çarçoveya ergatîvê de lêker li gorî bireser tên kesandin lê livir tiştek wisa neqewimiye. Sedem ew e ku li cem hinek lêkeran daçeka "ko" tê bikaranîn û wextî ew bê bikaranîn di saziya hevokê de hinek guhertin çêdibe. Divê ku em vê qaîdayê her tim ji ber bikin û bînin bîra xwe û di rêzimana Hîndî de qaîdeyek pir giring e: "Eger di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz li piştî bireserê "ko" were bikaranîn hingê lêker her daîm li gorî şexsê sêyem ê nêr û yekjimar tê kesandin."

Lazim e ku em vê yekê jî wekî ergatîv bipijirin çima ku li gorî mentiqa ergatîvê navbera kirde û lêkerê daîma nakokîyek heye. Yekjimarî û nêrîtî a daîmî jî cûreyeke nakokî ye ku girêdayî daçeka "ko" ye. Çawa ku em li hevokê dibînin lêkera "dekhnâ" daçeka "ko" xwastiye û bireser çiqas mê û yekjimar bibe jî lêker nêr û yekjimar maye.

**19)** हम ने खाया।[176]

[Hamnê khâyâ.]

(Me xwar.)

| | | |
|---|---|---|
| Ham | -nê | khâyâ. |

**Şîrove:** "Ham" cihê şexsa yekem a pirjimar digre. Daçeka "nê", xeber dide ku li dawiya hevokê lêkereke tranzîtîf heye û di dema borî de hatiye kesandin û bi vê terzî ev daçek fonksîyoneke gelek giring bicîh tîne. Hêmana dawî jî fi'l e û di sûreta şexsê sêyem ê yekjimar û nêr hatiye şikilandin. Livir îxtîlafeke pir eşkere derketiye holê. Ev hal bi qaîdeyeke a rêzimana Hîndî ve têkîldar e. Ew jî ev e ku wextî ku lêker gerguhêz bibe û di dema borî de bê kesandin û li hembera wê tu bireser neyê bikaranîn, yanî hevok bêyî bireser bê lidarxistin ew çax hewce ye lêker her daîm di forma yekjimar û şexsê seyem ê nêr de bibê kişandin. Di mînaka me de jî bireser tunîne û li dijî şexseke pirjimar (hamnê) lêker sade maye (khâyâ). Ev rewş gelek nêzîkî forma Kurmancî ye ku lêker di dema borî de bêyî bireser li gorî şexsê sêyem tê kesandin. Mesela wextî ku em hejmara xwarinan re zêde qiymet nedin em dikarin bibêjin "me xwar" û ev yekê ji sedî

[176] b.n., r. 75

sed mentiqa qaîdeyên Kurdî digre. Livir tiştê muhim ew e ku behsa bireser neyê kirin û lêker her daîm di forma yekjimar û şexsê sêyem de bibe.

**20)** नौकरानी सब्ज़ी लाई।[177]

[Naukarânî sabzî lâî.]

(Berkara jin sewzeyê anî.)

| | | |
|---|---|---|
| Naukarânî | sabzî | lâî. |

**Şîrove:** Di Hîndî de hinek lêker hene ku ji çarçoveya ergatîvê dertên û ne li gorî bireserê, lê li gorî kirdeyê tên kesandin. Yanî çawa ku di dema fireh û bê de harmoniyeke di navbera kirde û lêkerê de heye wisa jî ji bo çend fi’lên îstîsnaî jî vê qaîde xerab nabe. Van lêkeran ku me behsa wan kirin ew in: “Lânâ” (anîn), “bolna” (axaftin), “bhûlna” (jibîrkirin), “milnâ” (hevnasîn), “darnâ” (hevnasîn), “larnâ” (şer kirin). Em ji bîr nekin ku ew li gorî kirdeyê hereket dikin.

“Lânâ” jî yekê ji wa lêkeran e û livir li mînakê me li gorî kirdeya yekjimar, şexsa yekem û mê ew jî bûye yekjimar, şexsa yekem û mê. Lê livir pirsgirêkeke jî heye ku bireser bi xwe jî yekjimar, şexsa yekem û mê ye. Lê belê çawa ku me gotibû di çarçoveya qaîdeya ku mijara me ye di kesandinê de bitenê li gorî kirdeyê tevgeriyaye.

**21)** नेताजी सभा में क्या बोले ?[178]

[Nêtâcî sabhâ mê kyâ bolê?]

(Serokî li civatê çi got?)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Nêtâcî | sabhâ | mê | kyâ | bolê? |

**Şîrove:** Peyva ewil di hukmê kirdetiyê de ye û di formeke hevedudanî de ye: “Nêtâ” û “cî”. “Nêtâ” bi wateya “lîder”ê ye û “cî” jî di Kurmancî de “birêz” e. “Mê” tê wateya li cihekî bûyîn, yanî muqabila wê di Kurmancî de “di…de” ye. Lê hinek ji hevrahê xwe yê Kurmancî cuda ye, çima ku di Kurmancî de ji bo vê fonksîyonê du peyv

[177] b.n., r. 75
[178] b.n., r. 75

tên bikaranîn û navdêr dikeve navbera wan, lê li Hîndî de vê qertaf tê piştî peyvê. “Kyâ” bi wateya “çi” ye û em dikarin wê bi nîyeta çêkirina pirsan cûr bi cûr li cihên muxtelîf de bikarbînin. Yanî ji aliyê sentaksê pirsa “kyâ” ne tenê berê lêkeran, lê berê hêmanên din jî tê bikaranîn. Hêmana dawî li gorî şexsa sêyem a pirjimar hatiye kesandin û lêkera bolnâ (axaftin; gotin) bûye “bolnê”.

Di hevokê de kirde çiqas yekjimar bibe jî lêker pirjimar e û vê yekê nîşan dide ku navbera wan de nakokiyek heye. Livir dibe ku rasterast ergatîv were bîra mirov. Ji bo bersiv dayîna vê sualê hewce ye ku em du qaîdeyên zimanê Hîndî bînin bîra xwe: (1) Wextî em behsa şexseke girign dikin em wî wekî şexsê sêyem ê pirjimar dihesibînin. (2) Lêkera “bolnâ” çiqas gerguhêz bibe jî dîsa nakeve daîreya ergatîvê, yanî ew qaîdeyên ku derbarê lêkerên gerguhêz derbasdar in derbarê vê lêkerê ne wisa ne. Hingê livir pirjimar bûyîna fi’lê girêdayî rêz û hurmet e û ne ji ber qaîdeyên ergatîvê ye.

**22)** राम वह कहानी भूल गया।[179]

[Râm vah kahânî bhûl gayâ.]

(Râmî wê çîrokê jibîrkir.)

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Râm | vah | kahânî | bhûl | gayâ. |

**Şîrove:** Peyva ku di hukmê kirdetiyê de ye “Râm” e û nîşanî şexsê sêyem ê nêr dike. Peyva ku di hukmê biresertiyê de ye jî “kahânî” ye û wateya wê bi Kurmancî “çîrok” e. Ev peyv ji aliyê zayendê mê, ji aliyê şexsê şexsa sêyem e û ji aliyê hejmarê yekjimar e. Li gorî qaîdeya ergatîvê di dema borî de û li cem lêkerên gerguhêz jibîrkirin” jî li gorî bireserê tê kesandin lê dîsa jî çawa ku em dibînin lêker li gorî vê rêzikê nebûye “bhûl gayî”, lê maye “bhûl gayâ”. Sedema vê yekê jî ew e ku lêkera “bûlnâ” yanî “jibîrkirin” jî wekî çend lêkerên din îstîsna ye û wextî di dema borî de tê bikaranîn wekî demên din, dîsa li gorî kirdeyê hereket dike û navbera wan her duyan de ahengek çêdibe.

Di mînaka me de em dibînin ku lêker hevedudanî ye, yanî ji yekê zêdetir hêmanên wê hene. Wextî fi’la “cânâ”, yanî “çûyîn” bizeliqe lêkere din ew çax ev mana

[179] b.n., r. 76

çêdibe: Lêker bi tekûzî û temamî qewimiye û tê de tu kêmasiyek nemaye. Livir di konteksa ku bûye mijara me “bhûlnâ” û “gayâ” bi hev re hatine bikaranîn û ji xwe re manayek wiha saz kirine: “Râm, çîrokê bi temamî jibîrkir. Yanî wî ji bîr kiriye ku tu tişteke naye bîra wî.” Çawa ku em dibînin livir taybetmendiyek îdyomatîk heye û di tercimeyê de j3i me li gorî wê hereket bikin çêtir e.

**23)** राम, कृष्ण और गोपल ने ग़लती की।[180]

[Râm, Krişna aur Gopal nê ğaltî kî.]

(Râm, Krişna û Gopal xeta kir.)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Râm, | Krişna | aur | Gopal | nê | ğaltî | kî. |

**Şîrove:** Daçeka “nê” ji xeynê zemîran ji bo navên taybet yek bi yek nayê nîşandan û bitenê dizeliqe navê herî dawî. Çawa ku li mînakê tê dîtin “nê” bitenê li dawiya navê sêyem xuya dike ku her sê jî bi xwe kirde ne. Kirde bi xwezayî pirjimar e. Lê wextê ku em dimeyzînin lêker li gorî şexsa sêyem a yekjimar û mê hatiye kesandin. Ev jî nîşanî nakokî û îxtîlafeke eşkere dike. Sedema vê yekê ew e ku “ğaltî karnâ” fi’lêke terkîbî ye û di nav xwe de bireserekî dihewîne: “ğaltî”. Wextê em bipirsin ka wan çi kirin, bersiv jî wiha tê dayîn: “Ğaltî”, yanî xeletî. Ji ber ku navdêra “ğaltî” mê û yekjimar û şexsa sêyem e divê ku lêker jî wisa bibe û ji xwe wisa jî bûye.

**24)** मैंने, तुमने और उसने कल प्रदर्शनी देखी।[181]

[Menê, tumnê aur usnê kal pradarşanî dêkhî.]

(Min, te û wî pêşangehê dît.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Me | - nê, | tum | -nê | aur | us | -nê | kal | pradarşanî | dêkhî. |

**Şîrove:** Wextî ku kirdeya hevokê ji cînavkan pêk tê û ji yekê zêdetir kirde tê bikaranîn em dikarin ji bo her cînavkê daçeka “nê” bikarbînin. Di hevokê de her sê cînavkên cuda îşaretî cînavka “em/me” dike. Lê wextê ku li lêkerê dimeyzînin em

[180] b.n., r. 76
[181] b.n., r. 76

dibînin ku ew li gorî şexsa sêyem a yekjmar û mê hatiye kesandin û vê yekê jî îsbat dike ku navbera kirde û lêkerê îxtilafeke eşkere heye. Sedem jî ew e ku lêker li gorî bireserê hatiye kesandin û çi taybetmendiyên wê hebe derbasî lêkerê bûne.

Peyva “kal” xwedî du wateyan li dijî hev e û bi wî awayî peyveke pir balkeş e. Van du menayên li hemberî hev jî evan in: (1) “Duh” (2) “Sibê”. Ji bo teyîn kirina manayê herî rast hewce ye ku em li peyvên din jî binihêrin. Yanî wextî ku em bixazin bizanibin ka peyva “kal” li gorî kîjan wateyê hatiye bikaranîn lazim e ku ji xwe re delîleke bigerin û bibînin. Eger li hevokê hokereke girêdayî zemanê borî hebe an jî lêkereke ku di dema borî de hatiye kesandin bê dîtin ew çax em bi hêsanî fêm dikin ku “kal” bi wateya “duh” hatiye bikaranîn. Lê wextê ku bereksiya wê çêbibe, yanî hokereke girêdayî dema bê an jî lêkereke ku nîşanî siberroja dike hebe ew çax gelek zelal e ku “kal” bi wateya “sibê” hatiye şixulandin.

**25)** मैंने नौकरी के लिए कई आवेदन भेजे।[182]

[Menê naukrî kê liê kaî âvêdan bhêcê.]

(Min ji bo karê gelek serlêdan şandin.)

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Me | -nê | naukrî | kê | liê | kaî | âvêdan | bhêcê. |

**Şîrove:** Hêmana ewil “mê” ye ku bi daçeka “nê” ve zeliqiye. Yanî wateya wê di Kurmancî de “min” e. Hêmana din “kê” ye û piştre jî “liê” tê. Lazim e ku em van her duyan bi hev re bibînin. Wate jî “ji bona” ye. “Kaî” ji wan peyvan e ku nîşanî mîqdarê dide. Wextî berê peyveke bê bikaranîn wê têxe pirjimar. Jixwe ji ber vê yekê ye ku peyva “avêdan” (serlêdan) wekî pirjimar hatiye qebûl kirin. Wê bi vê terzî alîkî ve lêkerê xistiye pirjimar û alîkî ve jî xistiye nêr. Di encamê de lêker bûye “bhêcê”. Yanî lêker ji xwe re vê formê wergirtiye û nebûye “bhêcâ” an jî “bhêcî”, çima ku li gorî bireserê tevgeriyaye û wesfên wê helaniye. Bi gotineke din fi’l her çi taybetmendiyên bireserê hene wan tev heldaye û bi vî awayî jî ergatîv derketiye holê.

**26)** वह यात्री सिंगपूर से महँगा कैमरा लाया।[183]

[182] b.n., r. 76
[183] b.n., r. 76

[Vah yâtrî Singapûr sê mahagâ kemrâ lâyâ.]
(Ew turîst ji Japonyayê kamerayeke biha anî.)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Vah | yâtrî | Singapûr | sê | mahagâ | kemrâ | lâyâ. |

**Şîrove:** “Vah” peyveke pir-fonksîyonî ye û dikare ji terefek rola rengdêriya îşaretê bicîh bîne û ji terefek din jî dibe cînavka îşaretê. Di mînakê de ji ber ku berê navdêreke hatiye bikaranîn û nîşanî nêzîkbûn an jî dûrbûnê daye bûye sifeta îşaretê. Çawa ku me berê jî gotibû çend lêker hene ku çiqas bikevine daîreya ergatîvê dîsa jî li gorî bireserê nayên kesandin. “Lânâ” jî yekê ji wan lêkeran e. Ji ber vê yekê ye ku piştî lêker “nê nehatiye bikaranîn û di navbera kirde û lêker ahengek çêbûye. Bi qoleke din çawa di demên fireh û bê de navbera kirde û lêkerê de ahengek çêdibe, liviri di mînaka ku me nînadaye de jî ahengek wisa çêbûye û çi aliyê zayendê û çi aliyên hejmar û şexsê tu bandora bireserê çênebûye li ser lêkerê.

**27)** तुमने मुझे क्यों गाली दी?[184]
[Tumnê muchê kiyo gâlî dî?]
(Te çima çêrî min kir?)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Tum | -nê | muchê | kiyo | gâlî | dî? |

**Şîrove:** Lêkerên hevedudanî nav xwe de bi xwezayî bireser dihewînin û dibin mijara ergatîvê. Lêkera “gâlî dênâ” (çêr kirin) yekê ji wan lêkerên terkîbî ne ku ji du peyvên pêk tên û yekê ji wan navdêr û a din jî lêker e. Livir peyva ku navdêr e peyva “gâlî” (çêr) ye ku yekjimar, mê û şexsa sêyem e. Hewce ye ku lêker jî eynen van taybetmendiyan bigire. Jixwe çawa ku em li mînakê dibînin lêker van taybetmendiyan helgirtiye û elaqeya xwe ji kirdeyê bi tevahî birîye û li gorî bireserê ji xwe re forma “dî” helaniye.

**28)** साक्षात्कार में अधिकारी ने कोई कठिन सवाल नहीं पूछा।[185]

[184] b.n., r. 76
[185] b.n., r. 76

[Sâkşâtkâr mê̲ adhikârî nê koî kat̲hin savâl nahî̲ pûçhâ.]

(Desthilatdar, li mulaqatê tu pirsên dijwar nepirsîn.)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Sâkşâtkâr | mê̲ | adhikârî | nê | koî | kat̲hin | savâl | nahî̲ | pûçhâ. |

**Şîrove:** Du hêmanên ewil (sâkşâtkâr mê̲) hokera cihê teşkîl kiriye. Du hêmanên din jî (adhikârî nê) kirdeyê pêk anîne. Ew her sê hêmanan ku kirdeyê dişopînin jî (koî kat̲hin savâl) bireser in û ji nêzîk ve bi lêkerê ve têkîldar in. Daçeka "nahî̲" ku wateya lêkerê xistiye negatîv berê lêkerê hatiye bikaranîn. Hêmana dawî ya hevokê lêker e û li gorî bireserê (savâl) şexsê sêyem, yekjimar û nêr hatiye kesandin. Bi vê terzî qaîdeya li hev hatina bireser û lêker an jî ergatîv pêk hatiye. Livir tiştê ku bala me dikşîne ew e ku piştî koî (hîç) navdêr yekjimar maye. Li dijî vê rêzikê ku di zimanê Îngîlîzî de tên dîtin peyv pirjimar nebûye. Yanî di Îngîlîzî de piştî peyva "any" hewce ye ku navdêr bibe pirjimar, mesela "any pencils" lê dî Hîndî de tiştewk wisa ne pêwîst e.

**29)** अब्दुल्ला ने परसों पाँच केले खाए।[186]

[Abdullâ nê parso̲pâ̲ç kêlê khâê.]

(Abdullâyî par du mûz xwarin.)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Abdullâ | nê | parso̲ | pâ̲ç | kêlê | khâê. |

**Şîrove:** "Abdullâ" navekî taybet e û cihê şexsê yekem helaniye. Peyva "nê" ku wê şopandiye xeberî du tiştan dide: (1) Lêker di dema borî de hatiye kesandin; (2) Lêker gerguhêz e. "Parso̲" hokera demê yê û di Kurmancî de tercumeya wê "par" e. "Kêlâ" ku bi wateya "mûz"ê ye bi forma pirjimartiyê hatiye bikaranîn û bûye "kêlê". Tiştê ku wê xistiye pirjimar jî peyva "pâ̲ç" (pênc) e. Hêmana dawî jî lêkera "khâê" ye ku di ferhengan de jêderka wê wekî "khânâ" tê nîşandan. Em livir dibînin ku temasa lêker û kirde hatiye qutkirin û lêker li gorî bireserê hatiye kesandin û çi taybetmendiyên wê hene eynen liwir jî hatiye dubare kirin. Bi gotineke din forma khâyê" ji ber bireserê ye ku pirjimar û nêr e. Ger li gorî kirdeyê hatibana çêkirin forma "khâyâ" derdiket pêşiya me.

[186] b.n., r. 76

**30)** तुमने यह आईना कहाँ ख़रीदा?[187]

[Tumnê yah âînâ kahâxarîdâ?]

(Te vê neynikê ji kû kirî?)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Tum | -nê | yah | âînâ | kahâ | xarîdâ? |

**Şîrove:** "Tum" cînavkekî ye cihê şexsê duyem ê pirjimar digire lê gelemperî ji bo şexsê deyum ê yekjimar tê bikaranîn. Wextî ku li cem lêkerekê gerguhêz were bikaranîn daçeka "nê" dizeliqe wê.

"Yah" peyvekî ye ku ji bo îşaret kirina tiştên nêzîk tê bikaranîn û carna dibe rengdêr û carna jî dibe cînavk. Livir di vê konteksê de ji ber ku navdêra ku li piştî wê tê wesifandiye bûye rengdêr. Peyva "âînâ" ji aliyê hejmarê yekjimar û ji aliyê zayendê jî nêr e. Hêmana "kahâ" cih dipirse û "a" ya dawî ku di heceya duyem de derbas dibe hem dirêj, hem jî nazal e, yanî ji pozê derdikeve. Hêmana dawî li gorî unsura bireser, yanî "âînâ" hatiye kesandin. Bi vê terzî jî ji jêderka "xarîdnâ" (standin) forma "xerîdâ" derketiye. Bi gotineke din eger lêker li gorî kirdeyê bihata kesandin sîxeya "xarîdê" derdikete meydanê lê li gorî bireser bûye "xarîdâ". Di encamê lêker her sê taybetmendiyên bireserê wergirtiye û pê re ahengdariyek tekûz û bê kêmasî qewimiye.

**31)** चौकीदार ने मुझे पाँच बजे जगाया।[188]

[Çaukîdâr nê muchê pâç bacê cagâyâ.]

(Pasêvanî saet pênca de min şiyar kir.)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Çaukîdâr | nê | muchê | pâç | bacê | cagâyâ. |

**Şîrove:** Du hêmanên ewil (çaukîdâr nê) kirdeyê pêk anîne û hemana din jî (muchê) bireserê teşkîl kiriye. "Muchê" wekî obje hatiye bikaranîn û wateya wê "ji min re" an jî "min" e. Livir ji bo bireser an jî objeyê delîlek tune ye daku em fêm bikin gelo

[187] b.n., r. 76
[188] b.n., r. 77

ew nêr e ya jî mê. Lê ji kesandina lêkerê ku li gorî şexsê sêyem ê nêr hatiye damizrandin em zayendê bi hêsanî fêm dikin. Bi gotinek din zayendê bireser ji cînavkê nehatiye têgihiştin lê ji lêkerê eşkere bûye ku ew şexsê sêyem ê yekjimar û nêr e. Û bi vê terzî jî navbera bireser û lêker ahengdarîyek qewimiye.

**32)** मेरी पत्नी ने हमारी बच्ची के लिए जापानी खिलौने ख़रीदे।[189]

[Mêrî pitâ nê hamârî baççî kê liê câpânî khilonê xarîdê.]

(Jina min ji bo qîza me leyîstokên Japonî kirîn.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Mêrî | pitâ | nê | hamârî | baççî | kê | liê | câpânî | khilonê | xarîdê. |

**Şîrove:** Her du rengdêrên mulkîyetê (mêrî, hamârî) ku nîşanî xwedî bûnê dikin li gorî zayendê mê hatine bikaranîn. Bi Kurmancî tercumeya wan dibe “ya min” û “ya me”. Ger van rengdêran bi formeke pirjimar bên bikaranîn dibine “mêrê” û hamârê”. Daçeka “nê” nîşan dide ku li dawiya hevokê lêkereke wisa heye ku hem di dema borî de hatiye kesandin, hem jî gerguhêz e. Du cuz hene ku bireser ji wan pêk tê: Yekê ji wan rengdêra wesifandinê ye û a din navdêrekî nêr û pirjimar e (câpânî khilonê). Fi’la hevokê jî ku li dawî de bicîh bûye wesfekî hevşib hewandiye û bûye pirjimar û nêr. Ev jî bûye sedema derketina qaîdeya ergatîvê ku ji ahengdariya bireser û lêkerê pêk tê.

**33)** आपने खेत में कितनी गायें  देखीं।[190]

[Âpnê khêt m<u>ê</u> kitnî gây<u>ê</u> dêkh<u>î</u>?]

(We li zeviyê çend çêlek dîtin?)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Âp | -nê | khêt | m<u>ê</u> | kitnî | gây<u>ê</u> | dêkh<u>î</u>? |

**Şîrove:** Hêmanên “âp” û “nê” bi hev re yekitiyek çêkirine. Du hêmanên din jî (khêt m<u>ê</u>) di hukmê hokera mekanê de ne. “Kitnî” (kîjan) peyva pirseyê û ‘ededa tiştan dipirse û her tim li gorî zayenda peyvan tîpa wê ya dawî diguhere. “Gây” peyveke

[189] b.n., r. 77
[190] b.n., r. 77

yekjimar û mê ye û di forma xwe ya pirjimar de dibe “gayê”. Bi vê terzî jî ew peyva yekjimar û mê dibe pirjimar û mê. Wextê ku em li fi’la ku hêmana dawîn a hevokê teşkîl dike dimeyzînin em dibînin ku ew jî bûye pirjimar û mê. Vê yekê jî nîşan dide ku bireser û lêker ji her sê aliyan ve jî wekî hevûdu ne û ketine ahengeke tekûz û bê kêmasî.

**34)** सरकार ने ग़रीबी दूर करने के लिए कोशिश की।[191]
[Sarkâr nê ğarîbî dûr karnê kê liê koşiş kî.]
(Hikûmet ji bona rakirina feqîriyê cehd kir.)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Sarkâr | nê | ğarîbî | dûr | karnê | kê | liê | koşiş | kî. |

**Şîrove:** Peyva serkar ku bi wateya “hikûmet”ê ye di formeke yekjimar û mê derketiye pêşiya me. Wextê em li fi’lê mêze bikin dibînin ku ew jî bi van wesfan hatiye pêşkêş kirin. Vêga em dikarin behsa ahengdariyeke di navbera kirde û lêkerê bikin? Yanî dikarin bibêjin ku hêmana ku lêkerê kesandiye kirde ye?

Ev li hev hatin bi temamî tesadufî ye loma di çarçoveya ergatîvê de tekîlî an jî temasek navbera kirde û lêkerê tune ye û wextê wan her du bişibîne hevûdu em dikarin bibêjin ku ev hevşibî ne ji qaîdeyên rêzimanê tê, lê belê girêdayî tesaduf an jî rasthatinê ye. Eger em hevokê bi kûrahî tehlîl bikin dibînin ku lêker ji hêla “koşiş” hatiye kesandin ku parçeyek ji fi’la terkîbî ya “koşiş karnâ”, yanî “cehd kirin”ê ye. Lêkerên terkîbî ku nav xwe de navdêrek û lêkerek dihewîne taybetmendiyek balkeş nîşan didin, yanî wextî ku dibine mijara ergatîvê ne hewce ye ku em li bireserê bigerin, zîra ev navdêra ku li berê lêkerê bicîh bûye ji xwe bireser e û lêker ji hêla wê tê kesandin û ji her sê rehendan ve (zayend, hejmar û şexs) pê re dikeve ahengê. Em dikarin vê yekê bi mentiqa Kurmancî jî vebêjin: “Cehd kirin” binyadeke hevedudanî ye û hem navdêrek, hem jî lêkerek dihewîne. Em dikarin ji vê terkîbê pirseke û cewabeke derînin. Ew çi kiriye? (pirs); Ew cehd kiriye (cewab). “Koşiş karnâ” jî bi vê terzî di nav xwe de hem pirs û hem jî cewab dihewîne. Wextî em vê terkîbê li gorî zemanê borî bikesînin “koşiş” dibe bireser û lêkerê, yanî peyva “karnâ” li gorî xwe dikesîne û wê têxe yekjimar, şexsa sêyem û mê û di endamê de forma “kî” dertê holê.

[191] b.n., r. 77

**35)** क्या तुमनेbअख़बार में वह अजीब विज्ञापन पढ़ा ?[192]

[Kyâ tumnê axbâr mê vah acîb vicnâpan parhâ?]

(Gelo te li rojnameyê wê reklama ecêb xwand?)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Kyâ | tum | -nê | axbâr | mê | vah | acîb | vicnâpan | parhâ? |

**Şîrove:** “Kyâ” bi wateya “çi” ye lê wextê ku em wê bînin û daynîn serê hevokê ew çax hevokê têxe “hevoka erê an jî ne”. Bi gotinek din peyva “kyâ” eger bibe hêmana ewil hingê em mecbûr dibin ku bersivê de ji her du kelîyên “erê” an jî “ne” yekê bikarbînin. “Tum” bi wateya “hûn” e, lê em dikarin wê li cihê “tu” jî bikarbînin. “Nê” jî daçek e û nîşan dide ku li dawiya hevokê lêkereke gerguhêz û borî hatiye bikaranîn. Wextê em li kirde û lêkerê dimeyzînin dibînin ku her du li hev nehatine û navbera wan de harmoniyek pêk nehatiye. Eger hev bigirtana lêker dibûya “parhê”. Sedema forma “parhâ” ew e ku bireser (vicnâpan) yekjimar û nêr û wesfên xwe eynen hemilandiye ser lêkerê. Bi gotinek din bireser lêkerê li gorî xwe şikilandiye û bi vê terzî jî qaîdeya ergatîvê çêbûye.

**36)** बिड़ला परिवर ने देश की उन्नति के लिए अनेक कारख़ने खोले।[193]

[Birlâ parivar nê dêş kî unnati kê liê anêk kârxânê kholê.]

(Malbata Birlâ ji bo li pêş ketina welatê gelek karxane vekirin.)

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Birlâ | parivar | nê | dêş | kî | unnatî | kê | liê | anêk | kârxânê | kholê. |

**Şîrove:** “Birlâ parivar nê” navê komekî ye ku kirde ji wî pêk tê. Ji vê cîhetê jî, yanî bi saya bûyîna xwe ya komê yekjimar hatiye hesibandin. Ji aliyê zayendê jî nêr e. “Kêş kî unnati kê liê” yanî “ji bona pêşveçûyîna memleketê” mebestê îfade dike û ji ber ku têkîliya wê bi bireser ve tune ye li ser bandorek jî çênekiriye. “Anêk kârxanê” yanî “gelek fabrîqeyan” bireser e û di forma pirjimariyê û nêrîtiyê de ye û xwedî elaqeyek

[192] b.n., r. 77

[193] b.n., r. 77

giring li ser lêkerê ye. Peyva “kârxanâ” yekjimar e, lê kengê bi formeke pirjimar bê pêşkêş kirin herfa “a” a dawî dibe “ê” û çawa ku em di mînakê de dibînin peyv dibe “kârxanê”. Eger em li lêkerê mêze bikin dibînin ku taybetmendiyên bireserê eynen ser wê de jî xuya bûye. Û vê yekê jî nîşan dide ku li pêşiya tetbîq kirina ergatîvê tu asteng nemaye û qaîdeya li hev hatina an jî ahengdariya bireser û kirde teheqquq kiriye.

**37)** लोगों ने मंत्री का स्वागत किया और उनको माला पहनाई।[194]

[Logo nê mantrî kâ svâgat kiyâ aur unko mâlâ pahnâî.]

(Gel, wezîrê bi xweşî pêşewazî kir û jê re zerzengeke ji çîçekan daliqand.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Logo | nê | mantrî | kâ | svâgat | kiyâ | aur | unko | mâlâ | pahnâî. |

**Şîrove:** Li hevoke bitenê kirdeyek û du bireser û du lêker hene. “Logo” (gel) di formeke pirjimar e û di hukmê kirdeyê de ye. Bi daçeka “nê” bûye parçeyek û xeberî lêkereke ku dema borî de hatiye kişandin û lêkereke gerguhêz daye. “Mantrî” peyvekî nêr û yekjimar e û di hukmê biresertiyê de ye. Biresera din “mâlâ” ye û ew jî yekjimar e lê vêga zayenda wê mê ye. “Svâgat kiyâ” fi’lêke terkîbî ye û pahnâî” jî lêkereke kozatîf e, yanî kirde vê tevgerê bi xwe encam nake lê ji yekî re dide çêkirin. Taybetmendiyên bireseran eynen li ser lêkeran xuya bûye û lêkera ewil bûye nêr û yekjimar û a din jî mê û yekjimar. Bi vê terzî jî li cihê lêkerên pirjimar ku bi kirde ve dibûna ahengdar lêkerên yekjimar hatine bikaranîn û ev her du, yanî bireser û kirde bi yekê din re ketine harmoniyeke tekûz.

**38)** गाँव की स्त्रियों ने शादी के समय लोक गीत गाए।[195]

[Gâv kî striyo nê şâdî kê samay lok gît gaê.]

(Jinên gund bi dirêjiya dawetê stiranên gelêrî gotin.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Gâv | kî | striyo | nê | şâdî | kê | samay | lok | gît | gâe. |

[194] b.n., r. 77
[195] b.n., r. 77

**Şîrove:** Kirde ji komeke ku çar peyv dihewîne pêk tê ku di forma mêtî û pirjimariyê de ye: “Gâv kî striyo nê” (jinên gund). Sê hêmanên din hokera demê ne û ji me re xeber dide lêker kengê qewimiye: “şâdî kê samay” (di esnayê dawetê de). Bireser jî nav xwe de ji yekê zêdetir dihewîne û di forma nêr û pirjimar de ye: “Lok gaê” (stranên gelê). “Gâê” formeke kesandî ye ku nîşanî şexsa sêyem a pirjimar dide û jêderka wê “gânâ” (strîn) e û livir di rola lêkertiyê de ye. Çawa ku tê dîtin lêker ne li gorî şexsa sêyem a mê û pirjimar, lê li gorî şexsê sêyem ê nêr û yekjimar hatiye kesandin. Bi gotineke din tenasub navbera bireser û kirdeyê pêk hatiye û bandora kirde li ser lêkerê ji hîç aliyan ve neqewimiye. Ev jî meseleyek e ku bi qaîdeya ergatîvê têkîldar e.

**39)** मैंने दुकान में अपनी पुरानी किताबें बेचीं।[196]
[Menê dukân mê apnî purânî kitâbê bêçî.]
(Min li pirtûkxaneyê kîtabên xwe firotin.)

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Me | -nê | dukân | mê | apnî | purânî | kitâbê | bêçî. |

**Şîrove:** Şexsê yekem ê yekjimar bûye kirdeya hevokê. Daçeka “nê” jê cuda nehatiye nivîsandin û îma kiriye ku li dawiya cumleyê lêkereke gerguhêz heye. “Dukân mê” wekî hokera cihê hatiye bikaranîn û ji bo me mekanê lêkerê ku henûz nehatiye gotine xeber daye. Hêmana “apnî purânî kitâbê” cihê bireserê girtiye û alîkî ve bi mêtî û alîkî ve jî bi pirjimarî delalet kiriye. Hêmana dawî, yanî lêkera “bêçna” ji her sê aliyan ve bi bireser ve ketiye ahengê û pê re harmoniyeke tekûz pêk aniye. Bi vê terzê jî eşkere bûye ku temasa kirde û lêker tune ye û obje an jî bireser li ser kirdeyê bandor kiriye û wê şibandiye xwe.

**40)** कौरवों ने पांडवों से अठारह दिन युद्ध किया।[197]
(Kauravayan, li dijî Pandavayan bi dirêjiya 18 roj şer kir.)

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Kauravo | nê | Pândavo | sê | athârah | din | yuddha | kiyâ. |

---

196 b.n., r. 77
197 b.n., r. 78

**Şîrove:** Peyva ku di hukmê kirdetiyê de ye navekî taybet e (Kauravo̱) û bi formeke pirjimar derketiye pêşiya me. Daçeka “nê” ku wê te’qîb kiriye ji bo me xeber dide ku li dawî de lêkereke gerguhêz û borî heye. Du hêmanên din (Pândavo̱ sê) terkîbekî ye ku bi daçeka wasiteyê “sê” hatiye damezrandin û livir ne bi wateya bihevreyî, lê belê hembertiyê îfade dike. Li du hêmanên din jî hokera demê hatiye bikaranîn (aṯhârah din). Livir peyva “din” çiqas yekjimar bibe jî bi saya vê rengdêrê ku li berê wê hatiye bikaranîn bûye pirjimar. Yanî bi fonksîyona xwe rola pirjimartiyê hemilandiye. Em heya livir hêmana bireserê nedîtine, lê wextê em li lêkerê bimeyzînin dibînin ku ew parçeyeke jê ye. Yanî ji jêderka “yuddha karnâ” “yuddha” navdêr e, “karnâ” lêker e û “yuddha” bûye mijar an jî biresera wê lêkerê. Ji ber ku “yuddha” yekjimar û nêr e, van taybetmendiyên xwe eynen daye lêkerê û wê jî xistiye yekjimar û nêr. Di encamê de jêderka “karnâ” bûye “kiya”. Yanî bi tevahî ketiye binê bandora bireserê û çi xusûsiyetên wê hene wan tev helgirtiye.

**41)** उस संन्यासी ने न तो काफ़ी पी और चाय पी।[198]

[Us sannyâsî nê na to kâfî pî aur çây pî.]

(Ew munzewî ne qehwe vexwar, ne jî çay vexwar.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Us | sannyâsî | nê | na | to | kâfî | pî | aur | çây | pî. |

**Şîrove:** Peyva “sannyâsî” ku wateya wê munzevî ye, yanî kesekî ku xwe ji civatê dûr xistiye û xwe daye îbadetê ye, navekî nêr û yekjimar û şexsê sêyem teşkîl dike. Livir bi rengdêra îşaretê ya “us” ku wateya wê “ew” e kirdeyê pêk aniye. Hêman din daçeka “nê” ye û bi vê terzî delîleke pêşkêş kiriye ku di dawiya hevokê de lekereke gerguhêz ku di dema borî de hatiye kesandin dê were bikaranîn. Daçeka “na” ku li cem lêkeren ku dema borî de tên kesandin tê bikaranîn menayê xistiye neyînî. Di parçeyan ku van te’qîb dikin de jî di bireser û du lêker bala me dikişînin. Lêkera “pîna”, yanî “vexwarin”, ji xwe re sûreta “pî” wergirtiye, çima ku li gorî bireserên “kâfî” û “çây”, yanî “qehwe û çay” hatiye kesandin. Bi gotineke din lêker li gorî şexsa sêyem a yekjimar û mê hatiye damezrandin. Eger lêker li gorî kirdeyê bihata kesandin hingê

[198] b.n., r. 78

forma “piyâ” derdiket pêşiya me, le çawa ku em dibînin di saziya ergatîvê de hewce ye ku lêker ji her sê aliyan ve li gorî bireser bê çêkirin.

**42)** दुकान्दार ने तुमसे क्या कहा और तुमने क्या उत्तर दिया ?[199]

[Dukândâr nê tumsê kyâ kahâ aur tumnê kyâ uttar diyâ?]

(Xwedî mexazeyê ji te re çi got û te çi bersiv da?)

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Dukândâr | nê | tumsê | kyâ | kahâ | aur | tum | -nê | kyâ | uttar | diyâ? |

**Şîrove:** Di lêkerên dema borî de wextê ku ew dibin gerguhêz, lê belê bireser neyê gotin hingê lêker di forma yekjimar û nêr û şexsê yekem de dimîne. Li mînakê me de du hevok hene û jibona hevoka yekem fi’la “kahnâ” bûye lêker û ji bo wê tu bireser nehatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî lêker ji xwe re forma “kahâ” girtiye û bi vê terzê jî bûye yekjimar, şexsê yekem û nêr. Esasen em dikarin peyva pirsê a “kyâ” ku cînsîyet nahewîne wekî bireser qebûl bikin. Lê dîsa jî ew qaîdeyê ku me gotibû dîsa jî naguhere, yanî fi’l sade û nêr dimîne. Em dibînin ku lêkera duyem jî yekjimar, nêr û şexsê sêyem e. Lê livir sedem ne ew e ku lêker çiqas gerguhêz bibe jî bêyî bireser hatiye bikaranîn lê belê di fi’lê terkîbî de ew parçeya ku navdêr e bi xwe navekî yekjimar û nêr e. Me berê jî gotibû ke di dema borî de wextê ku lêkereke terkîbî an jî hevedudanî bê bikaranîn ew nav xwe de biresek dhewîne û lêker li gorî wê tê kesandin. Ji ber ku “uttar” yanî “bersiv” peyveke maskulîn û yekjimar e lêkera “dêna” jî li gorî wê bûye yekjimar û nêr û ji xwe re forma “diyâ” wergirtiye. Bi vê awayî jî “tumnê”, yanî kirdeya hevokê tu bandorek li ser lêkerê çênekiriye û têkiliya wê ji lêkerê hatiye birîn. Vê yekê jî di encamê de li hev hatina bireser û lêkerê pêk aniye, yanî ergatîv derketiye holê.

**43)** मेहमान सेब और अमरूद लाये हैं।[200]

[Mêhmân sêb aur amrûd lâyê h<u>e</u>.]

(Mêvanî êv û guava anîne.)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Mêhmân | sêb | aur | amrûd | layê | h<u>e</u>. |

[199] b.n., r. 78

[200] b.n., r. 80

**Şîrove:** Çend lêker hene ku dervayî qaîdeyê ergatîvê dimînin. Em muşahede dikin ku van lêkeran çiqas bireser bixwazin jî dîsa li gorî kirdeyê hereket dikin û qaîdeya ergatîvê derheqqê wan carî nabe. “Lânâ” yanî “anîn” jî yekê ji van lêkera ne û taybetmendiyeke bi vê terzê dihemilîne. Lazim e ku em wê li gorî kirdeyê bikesînin, çawa ku di demên fireh û bê de em wisa dikin. Dibe ku em bawer bikin ku hêmanên “sêb” û “amrûd” payê hev hatine û lêker li gorî wan hatiye kesandin; çima ku kirde yekjimar û lêker pirjimar e. Lê ji bo me tunebûna daçeka “nê” delîlek pir giring e. Em dizanin ku di Hîndî de ji bo kirdeyên yekjimar bi mebesta rêz û hurmetê lêkerên pirjimar tên bikaranîn. Bi gotineke din, em tenê behsî şexsekî bikin jî ku em bixwazin jê bi îhtîramî xeber bidin em dikarin derbarê wê saziyan pirjimartiyê bikarbînin. Livir jî ji bo giramî dayîn kirdeya “mêhmân” yanî mêvan wekî pirjimar hatiye hesibandin û li cihê “he” forma pirjimar ya “he̱” hatiye şixulandin. Hemin ku wisa ye em dikarin vê hukmê bidin ku bireser li ser lêkerê bandordar nebûye û wekî demên din livir jî navbera kirde û lêkerê harmoniyek tekûz qewimiye.

**44)** मैंने नेहरूजी का भाषण सुना है।[201]

[Me̱nê Nêhrûcî kâ bhâşa̱n sunâ he.]

(Min axivîna birêz Nehrû seh kir.)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Me̱ | -nê | Nêhrû | -cî | bhâşa̱n | sunâ | he. |

**Şîrove:** Lêkera “sunâ honâ” ku lêkereke hevedûdanî ye îma kiriye ku kirde hêj jî vê tecrubeyê diveşêre û bandora wê qut nebûye. Bi gotineke din xwedî vê lêkerê dibêje ku guhdarî kirina gotara “Nehrû cî” ji bo faîl re bûye tecrubeyek giring û bandora vê gohdarkirinê jî henûz wenda nebûye. Eger em li lêkerê bimeyzinin dibe ku em bawer bikin ku lêker şexsê yekem ê yekjimar e, lê gava em li bireserê mêze bikin têdighijin ku taybetmendiyên lêkerê ji bireserê hatine, ne ji kirdeyê. Zîra “bhâşa̱n” hem bi yekjimartiya xwe, hem jî bi nêrîtiya xwe li ser lêkerê bûye bandordar û sîxeya “sunâ he” pêk aniye. Ji aliyê rastnivîsê jî tiştek ku bala me dikişîne ew e ku daçeka “nê” ku daçeka ergatîviyê ye û peyvoka “cî” ku beyanî rêzê dike ji kirdeyê cuda nehatine nivîsandin.

[201] b.n., r. 81

**45)** क्या तुमने हरिशचन्द्र नाटक देखा है?[202]

[Kyâ tumnê Harişçandra nâṯak dekhâ he?]

(Sen Harişçandra piyesini izledin mi?)

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Kyâ | tum | -nê | Harişçandra | nâṯak | dekhâ | he? |

**Şîrove:** Lêkera hevokê hevedudanî ye û ji dema borî û dema fireh pêk tê. Bi vê terzî lêkera “dekhâ he”, yanî “dîtiye” çêbûye. Em livir dibînin ku cînavka “tum” li ser lêkerê nebûye bandordar çima ku ew pirjimarî dixwaze lê lêker yekjimar maye. Bi gotinek din li cihê “dêkhê hê̱” ku bi kirdeyê ve ahengdar e, “dêkhâ he” hatiye bikaranîn ku bi xwe yekjimar û şexsê sêyem û nêr e. Sedema vê nakokiyê ew e ku di daîreya ergatîvê de ahengdarî navbera bireser û kirdeyê de ye. “Harişçandra nâṯak” (pîyesa Harişçandra)  bi taybetmendiyên xwe yên yekjimar û nêr eynen li ser lêkerê jî bandor kiriye û wê şibandiye xwe. Jixwe vê yekê jî netîceya qaîdeya ergatîvê ye lêker ji hêla bireser ve tê kesandin û tu têkîliya wê bi kirdeyê ve çênabe.

**46)** उस लेखक ने अलमारी में बहुत-सी पुस्तकें रखी हैं।[203]

[Us lêkhar nê almârî mê̱ bahut-sî pustakê̱ rakhî he̱.]

(Ew nûser gelek kîtab danîne dolabê.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Us | lêkhar | nê | almârî | mê | bahut | sî | pustakê̱ | rakhî | he̱. |

**Şîrove:** Du hêmanên ewil (us lêkhâr) kirde ne û di forma nêrîtî Û yekjimartiyê de ne. Ji ber ku “almârî mê̱” cihê an jî mekanê xeber dide me bûye hokera cihê. Hêmanên ku bireserê teşkîl kiriye û lêkerê bi nêzîkî elaqedar kiriye van her sê hêman in: “bahut-sî pustakê̱” (gelek pirtûk). Peyva “pustak” ku wateya wê “pirtûk” e bi saya zerfa “bahut-sî” (gelek) û bi herfa “-ê” ku bi peyvê ve zeliqiye hatiye pirjimar kirin. Van taybetmendiyên xwe eynen hemilandiye lbi lêkerê jî û wê bi xwe re xistiye ahengdar. Wextê em li lêkera “rakhî” (danî) dimeyzînin dibe ku em bifikirin ku lêker wekî

[202] b.n., r. 81
[203] b.n., r. 81

yekjimar hatiye bikaranîn û bi bireser ve neketiye ahengê. Lê pir eşkere ye ku lêkera din, yanî “he” nîşan daye ku bi pirjimariya xwe kêmasiya lêkera din temam kiriye û bi bireser ve ketiye ahengeke tekûz.

**47)** अधिकांश लोगों ने बचपन के बाद रामायण नहीं पढ़ी है।[204]
[Adhikânş logo nê baçpan kê bâd Râmâyana nahî parhî he.]
(Piraniya însanan piştî zarokatiyê Râmâyana nexwandiye.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Adhikânş | logo | nê | baçpan | kê | bâd | Râmâyana | nahî | parhî | he. |

**Şîrove:** Kirdeya “adhikânş logo” (gelek kes) ku ji sê peyvan pêk hatiye nîşanî pirjimariyê û nêrîtîyê dike û lêkera “parhî he” (xwandiye) jî nîşanî yekjimariyê û mêtiyê kiriye. Vêga nakokiyek pir eşkere heye navbera kirdeyeke pirjimar û nêr û lêkerek yekjimar û mê. Sedema vê yekê ew e ku navê taybet ê “Râmâyana” îşaretî navekî yekjimar û mê kiriye û ji ber ku bireser e lêkerê ji van her du aliyan ve kesandiye. Bi vî awayî jî têkîliya kirde û lêker qut bûye û lêker ji hêla bireser ve hatiye kesandin û bi hev re paraleltiyek tekûz derxistine holê.

**48)** मेरे बच्चे के जन्मदिन पर मेरे दोस्तों ने उपहर भेजे हैं।[205]
[Mêrê baççê kê canmadin par mêrê dosto nê uphar bhêcê he.]
(Dostên min li rojbûna zaruyê min gelek diyarî şiyandine.)

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Mêrê | dosto | nê | uphar | bhêcê | he. |

**Şîrove:** Peyva “dosto” ku bi wateya “dostan” hatiye bikaranîn ji hêla zayendê nêr û ji hêla hejmarê pirjimar e. Daçeka “nê” ku wê te’qîb kiriye nîşan dide ku lêker dê bibe dema borî û gerguhêz. Hêmana lipeyhatî “uphar”, yanî “diyariyan” di formeke yekjimar de dixuye lê jê bi fonksîyoneke pirjimar hatiye îstîfade kirin. Ev hêman bi hemû taybetmendiyên xwe lêkerê şibandiye xwe. Bi gotineke din çi wesfên wê hene eynen li ser lêkerê zahir bûne. Vêca em nikarin bibêjin ku di nav kirde û lêkerê de

204 b.n., r. 81
205 b.n., r. 81

ahengdariyeke heye û lêker ji terefê kirde ve hatiye kesandin. Ev hevşibî tesadufî ye û hewce ye ku em bibîr bînin ku bireser jî pirjimar û nêr e. Di encamê de paraleltiya bireser û fi’lê di vê mînakê de jî qewimiye û bûyera ergatîvî pêk hatiye.

**49)** डॉक्टर ने रोगी को मृत्यु से बचाया है।[206]

[Dôkṯar nê rogî ko mrityu sê baçâyâ he.]

(Bijîşk naxoşê ji mirine xilas kiriye.)

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Dôkṯar | nê | rogî | ko | mrityu | sê | baçâyâ | he. |

**Şîrove:** Kirde koma “dokṯar nê” (bijîşk) ye ku ji du peyvan pêk hatiye. Peyva “rogî” (naxweş) jî di hukmê biresertiyê de ye. Sade mayîna lêkerê ne bi kirde, ne jî bi bireser ve têkîldar e. Çima ku bi saya daçeka “ko” lêker her daim bi formeke sade û yekjimar dertê pêşiya me. Vê yekê di daîreya ergatîviyê de qaîdeyek pir xurt e ku tu cara xera nabe. Vêca jêderka “baçânâ honâ” ji xwe re forma “baçâyâ he” helaniye, zîra ketiye binê bandora daçeka “ko” û wextê ew di hevokê de hebe ji bo kesandina fi’lê alternatîfeke din naye fikirîn.

**50)** बिड़ला परिवार ने मंदिरों के लिए लाखों रुपये दिए हैं।[207]

[Biṟlâ parivâr nê mandiro̱ kê liê lakho̱ rupyê diê he̱.]

(Malbata Biṟlâ ji bona perestgehan bi sed hezaran rupî bexşandine.)

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Biṟlâ | parivâr | nê | mandiro̱ | kê | liê | lakho̱ | rupyê | diê | he̱. |

**Şîrove:** Jêderka “dêna hona” ku formeke hevedudanî ye, li gorî şexsê sêyem ê pirjimar û nêr hatiye kesandin û di encamê de bûye “diê he̱”. Livir sedema vê pirjimariyê ne ew e ku kirde wekî navdêreke komî hatiye hesibandin, lê belê bireser bi xwe şexsê sêyem, nêr û pirjimar e. Bûyera ergatîvê ku wateya wê ew e ku têkîliya lêker û kirde qut dibe û lêker ji hêla bireserê ve tê kesandin carek din qewimiye. Bi gotineke din “lakho̱ rupyê” (hezaran rûpî) di formeke pirjimar, nêr û şexsê sêyem de ye û van

206 b.n., r. 81

207 b.n., r. 81

xusûsîyetên xwe daye kirdeyê jî û navbera wan her du yan de harmoniyek tekûz qewimiye.

**ENCAM**

Berê her tiştê di destpêkê de derheqê du zimanan de agahiyên binhehîn hat dayîn. Piştre jî derbarê taybetmendiya ergatîvê di çarçoveke mehdûd de hat îzah kirin. Di beşên lipeyhatî dejî mînakên Kurmancî û Hîndî hatin teqdîm kirin û ji bo her yekê ji wan re jî kin ya dirêj şiroveyek hat berpêş kirin. Bi vê usûlê me xwast ku mentiq û mekanîzmayê ergatîve berbiçav bikin.

Wextî ku me mînakên her du zimanan bi metodeke analîzî rêzandin di nav wan de çend hevşibî û ferqîtî derketin holê û ku em wan dikarin bi vê terzî bisêwirînin:

- Di her du zimanan de jî ergatîvî bitenê di dema borî û şaxên wê de tên dîtin. Yanî em nikarin lêkerekê meselen di dema fireh de an jî di dema bê de bikarbînin. Çend mîsal li jêrê hatine nîşandan:

“लड़के ने पानी पिया।” (Lar̲kê nê pânî piyâ.) “Gedeyî av vexwar.”

Çawa ku tê dîtin di hevoka Hîndî û wergera wê de mentiq yek e, yanî heman taybetmendî heye ku bitenê dema borî qebûl dike û kesnadina lêkeran li gorî vê qaîdeyê pêk tên.

- Di her du zimanan de jî ergatîvî bitenê ji bona lêkerên gerguhêz tê bikaranîn. Yanî eger ji fi’leke bê obje bê îstîfade kirin hingê qaîdeyên ku ji bo ergatîvîtiyê tên bikaranîn betal dibin:

“मोहन कल अपने पिता को देखने दिल्ली गया।” (Mohan kal apnê pitâ ko dekhnê Dillî gayâ.) “Mohan duh ji bo dîtina bavê xwe çû Delhiyê.” Çawa ku tê dîtin “çûyîn” lêkereke negerguhêz e û wextê di dema borî de were bikaranîn em nikarin li gorî objeyê hereket bikin çima ku hêmanekê wisa tuneye û ji ber vê yekê jî mecbûr dimînin lêkerê anegora kirdeyê bikesînin.

- Di Kurmancî de lêker ji rehendên hejmar û şexs ve tê kesandin, yanî li serlêkerê du wesf eşkere dibin; lê lêkerên Hîndî sê rehend nîşan didin ku ji hejmar, şexs û cinsîyet ibaret in. Yanî di lêkerên Kurmancî de zayend ne diyar e, lê li lêkerên Hîndî de zayenda objeyê li ser lêkerê xuya dibe:

“बढ़ाई ने एक कुर्सी बनाई।” (Bar̲hâî nê êk kursî banâî.) “Neccar, kursîyekê çêkir.”

Livir di mînakê Hîndî de zayenda “kursî” ku peyveke mê ye diyar bûye loma lêker jî li gorî wê hatiye kesandin, lê belê di mînaka Kurmancî de em nikarin behsa zayendê bikin zîra lêkerên Kurmancî çi nêr û çi mê tev yek in û di nav xwe de rehenda zayendê nahewînin.

- Di Kurmancî de ji bo lêkerên gerguhêz tu îstîsna tuneye, yanî dema van lêkeran dikevine daîreya ergativê li gorî bireserê tên kesandin. Lê belê li Hîndî de çend lêker hene ku tevî bireserên ku dixwazin nakevin çarçoveya ergatîvê.

- Di Kurmancî de tu lêkera gerguhêz tuneye ku nekeve daîeeya ergatîvê. Lê di Hîndî çend lêker hene ku bûne mijara îstîsnayê. Yanî çiqas gerguhêz bibin jî di dema borî de ji hêla bireserê nayên kesandin.

- Di Kurmancî de lêkerên ne gerguhêz nakevin daîreya ergatîvê, lê Hîndî de çend lêkerên negerguhêz hene ku dibin mijara ergatîvê. Bi qowleke din çiqas gerguhêz wernegirin jî dîsa daçeka “nê” bi wan re tê zeliqandin.

- Di her du zimaman de jî çend qertaf hene ku li cem kirdeyê tên bikaranîn û nîşan didin ku lêker karakterekê ergatîvî dihemilîne. Bikaranîna wan di Kurmancî de çiqas qels bibe jî di Hîndî gelek bihêz e.

- Di her du zimanan de li ser cînavkan çend guhertin çêdibe. Di Kurmancî de zemîr bi tevahî dikevine tewangê, yanî ji formên xwe yên eslî derdikevin û dikevin kategoriyeke din. Lê Hîndî ev guhertin encax qismen çêdibe.

- Di her du zimanan de jî lêker li dawî de bicîh dibe.

- Kürtçede herhangi bir edat ergatif kullanımını engellemzken Hintçede “ko” edatının kullanımı ergatifi etkiler ve fiili yalın-eril formda bırakır.

- Di Kurmancî de tu daçek ki bo bikaranîna ergatîvê asteng nabe, lê di Hîndî de daçeka “ko” nahele ku lêker bikeve çarçoveya ergatîvê.

Ew maddeyên ku li jor de rêz kirine jixwe di mînakên de bi berfirehî hatibûn îzah kirin. Wextê me wan tehlîl kirin me dît ku çiqas girêdayî şaxan cuda bibin û xwedî cudahiyên giring bibin jî mentiqa ergatîvîyê di navbera Kurmancî û Hîndî gelek nêzîkî hevûdû ne.

Di netîceyê de hêviya me ew e ku zimanê Kurmancî, çi nêzîk û çi dûr bi zimanên din ku xwedî ergatîvê ne re bibe muqayese kirin, loma ergatîvî ji giringtirîn taybetmendiyên Kurmancî ye ku ji demên qedîm heya niha hebûna domandiye.

**ÇAVKANÎ**

Anti Hindi Agitations of Tamil Nadu, https://en.wikipedia.org/wiki/Anti-Hindi_agitations_of_Tamil_Nadu (Tarîxa Gihiştinê: 20 Kewçêr 2016).

Basque grammar,https://en.wikipedia.org/wiki/Basque_grammar (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

Bateyî, Mella, **Mewlidun-Nebî**, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2012.

Bedirxan, Celadet Ali û Roger Lescot, **Kürtçe Grameri**, Nezan Kendal (wer.) İstanbul: Avesta Basın Yayın, 2012.

Burushaski, https://en.wikipedia.org/wiki/Burushaski (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

Can, H. Derya û Canan Erdemir, **Hintçe Gezi ve Konuşma Rehberi**, Ankara: Delta Kültür Yayınevi, 2015.

Conquests, Wiki/Muslim_conquests_of_the_Indian_subcontinen (Tarîxa Gihiştinê: 10 Kewçêr 2016).

Devanagari, https://en.wikipedia.org/wiki/Devanagari (Tarîxa Gihiştinê: 15 Kewçêr 2016).

El-Behtî Ez-Zivingî, Ahmed bin El-Mulla Muhammed (amd.), **El-Eqdul-Cewherîyyu Fî Şerhî Dîwanîş-Şeyx-Elcezerî,** İstanbul: Haşemi Yayınevi, 2012.

En-Nedwî Ebû Hesen Eli, **Qisseyên Pêxemberan Ji Bo Zarokan**, (wer.) Mela Muhemmedê Bêrkevanî, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2010.

Ergative Case, https://en.wikipedia.org/wiki/Ergative_case (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

Esed, Cirdo, **Ser R'ya E'mr,** Erivan: Neşîreta Hayastan,1966.

Êzdarî, Mela Muhemmed, **Mewlîda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehberê Xelasî Muhemmed Eleyhîs-Selam,** İstanbul: İhsan Yayınları, 2005.

Findikî, Seyyit Elîyê, **Dîwan**, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2011.

Formal Explanation of Ergativity, http://hindilanguage.info/hindi-grammar/verbs/ergativity/ (Tarîxa Gihiştinê: 19 Kewçêr 2016).

Hayrabydutyan û Badriarkutyan, Elîfba Cuz, İstanbul: 1860.

Hindi, http://aboutworldlanguages.com/hindi (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

History of Hindustani, https://en.wikipedia.org/wiki/History_of_Hindustani (Tarîxa Gihiştinê: 10 Kewçêr 2016).

Îbo, Sehîd, **Sînem,** Erivan: Neşîreta Hayastan, 1966.

İncekan, Abdullah, **Geçişli Fiiller ve Ergativ**, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2009.

**Încîl,** “Metta”, (Kurmancî), (w. n.), Moskova: Înstîtuta Welgerandina K’têba Pîroz, 2011.

Kaçuê Kî Bansurî, file:///C:/Users/pro2000/Downloads/001_TF_HIN.pdf (Tarîxa Gihiştinê: 11 Mijdar 2016).

Khariboli Dialect, https://en.wikipedia.org/wiki/Khariboli_dialect (Tarîxa Gihiştinê: 10 Kewçêr 2016).

Koçer, Feqî Sirul Mehşer, İstanbul: Weşanên Enstîtuta Kurdî Ya Stenbolê, 2002.

Koul, N. Omkar, **Modern Hindi Grammar,** Springfield: Dunwoody Press, 2008.

Kurdo, Qanatê, **Tarixa Edebyeta Kurdi**, Ankara: Öz-Ge Yayınları, 1992.

Mustafa Dehqan û Alessandro Mengozzi, A **Kurdish Garshuni Poem By David Of Barazne (19th Century),** Journal of Syriac Studies, Cilt 17, 2014.

Nikitine, Basil û Ely Benister Soane, **The Tale of Suto and Tato: Kurdish Text with Translation and Notes,** Bulletin of the School of Oriental Studies, University of London, C 3, Hejmar 1, 1923.

Ocek, Nezîr, **Waneyên Rêzimana Kurmancî**, İstanbul: Weşanên Sîtav, 2014.

Rekhta, https://en.wikipedia.org/wiki/Rekhta (Tarîxa Gihiştinê: 10 Kewçêr2016).

Senta Ka Krîsmas, www.bookbox.com (Tarîxa Gihiştinê: 15 Mijdar 2016)

Special forms of pronouns when used with ने, http://hindilanguage.info/hindi-grammar/verbs/ergativity/ (TarîxaGihiştinê: 11 Mijdar 2016).

Sreedharan, N. **Learn Hindi Through English,** Chennai: Sura Books, 2006.

Şemrexî, Huseyn, (amd.) **Mem û Zîn,** İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2011.

**Tewrat,** "Tekwîn", (Kurmancî), (w. n.), Moskova: Înstîtuta Welgerandina K'têba Pîroz, 2011.

Thackton W.M., **Kurmanji KurdishA Reference Grammar with Selected Readings,** (c. n.), 2006.

The Issue of the Proto-Indo-European Language, Sri Nandanandana Dasa, http://www.dandavats.com/?p=16739 (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

The Verbal Syntax and Ergativity of Georgian, Nancy Thulen, http://www.nthuleen.com/papers/L12paper.html (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

Tibetan, https://en.wikipedia.org/wiki/Modern_Standard_Tibetan_grammar (Tarîxa Gihiştinê: 08 Kewçêr 2016).

Yıldırım, **Kadri, Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi,** İstanbul: Avesta Yayınları, 2013.

**PÊVEK**

Dengdarên ku binê wan xetkirî ne ji panka devê dertên û bi te’bîreke Îngilîzî “palatal” tên bi nav kirin. Dengdêrên ku binê wan xetkirî ye ji pozê dertên û ew jî bi te’bîreke Îngilîzî wekî “nazal” tên nasîn. Eger piştî konsonantekê herfa “h” bê nivîsandin ew konsonant û “h” bi hev re tên teleffuz kirin. Yanî “h” ji tîpa berê xwe ne cuda ye û jê re arîkarî dike daku bi bêhnê re were derxistin. Ji ber vê yekê ye ku ji bo van tîpan “dengên bi hilm” tê gotin. Di Hîndî de vokala “a” ne wekî ya Kurmancî ye, loma di Hîndî de “a” carna dirêj û carna jî kin tê bilêvkirin. Ji ber vê yekê me ser “a”ya dirêj îşareta “^” yanî kumik danî. Herwiha “i” ji bo ya “î”ya kin û “î” jî ji bo ya dirêj hatiye bikaranîn.

Hîndî bi alfabeyeke tê nivîsandin ku jê re “abugîda”, yanî sîstema nivîsandinê ya bi heceyan tê gotin. Ev sîstem tîpên bideng xarîc ji bo her herfê herî kêm du deng bikar tînê. Yanî eger em konsonantekê binivîsin lazim e ku wê li cem herfekê din bixwînin û ew herf jî piranî vokalekê ye. Me di lîsteyê de ji bo her hecekê kelîmekê nîşan daye û heya ku ji destê me hat di transkrîpsîyonê de navbera Hîndî û Kurmancî hevşibî çêkirin. Bi gotineke din me dev ji latînîzeyeke standart berda û daku Kurmancekî bi hêsanî bixwîne di transkrîpsîyonê herfan de îmlayê Kurmancî şopand. Bi vê terzî ye ku kesekî Kurmancî-ziman dikare wergerandina tîpan bêyî zehmeteke mezin bixwîne.

**Herfên bêdeng**

| **Tîp û Transkrîbe Ya Wê** | **Mînaka Hîndî Û Wateya Wê** | **Hembera Wê Bi Kurmancî** | **Teleffuza Wê Ya Kurdî Ya Teqrîbî** |
|---|---|---|---|
| क : ka | काम: kâm | kar | k̲armend |
| ख: kha | खाना: khânâ | xwarin | (-) |
| ग : ga | गाड़ी: gâr̲î | ‘erebe | garis |
| घ : gha | घर: ghar | xanî | (-) |
| ङ : n̲a | गङ्गा: Gan̲gâ | Robara Ganjê | ren̲gîn |
| च : ça | चाकू: çâkû | kêr | ç̲akûç |
| छ : çha | छठे: çhat̲hê | şêst | (-) |
| ज : ca | जाना: cânâ | çûn | c̲arû |
| झ : cha | झंडा: chand̲â | al | (-) |

| | | | |
|---|---|---|---|
| ञ : na | चञ्चल: pançal | îkramîye | pêncî |
| ट : ta | ट्रेन: trên | trên | (-) |
| ठ : tha | ठंड: thand | sar | (-) |
| ड : da | डाक्टर: dâktar | bijîşk | (-) |
| ढ : dha | ढाल: dhâl | nişîv | (-) |
| ण : na | व्याकरण: vyâkran | rêziman | kengî |
| त : ta | तितली: titlî | perperok | tirş |
| थ : tha | अर्थ: arth | wate | (-) |
| द : da | दर्द: dard | derd | derd |
| ध : dha | दूध: dûdh | şîr | (-) |
| न : na | गाना: gânâ | stran | gewr |
| प : pa | पचास: paçâs | pêncî | paqij |
| फ : pha | फूल: phûl | çîçek | (-) |
| ब : ba | बाज़ार: bâzâr | bazar | boxçe |
| भ : bha | भालू: bhâlû | herç | (-) |
| म : ma | मछली: maçhlî | masî | masî |
| क़: qa | क़लम: qalam | qelem | qelem |
| ख़ : xa | ख़ाली: xâlî | vala | xwarin |
| ग़ : ğa | ग़लत: ğalat | xelet | xem |
| ज़ : za | ज़मीन: zamîn | ruyê erdê | zivistan |
| ड़ : ra | खिड़की: khirkî | pace | (-) |
| फ़ : fa | फ़िल्म: film | fîlm | fêkî |
| य : ya | यात्रा: yâtrâ | rêwîtî | yekîtî |
| र : ra | रंगीन: rengîn | rengîn | roj |
| ल: la | लाल: lâl | sor | lal |
| व : va | व्यक्ति: vyakti | kes | vexwarin |
| ह : ha | हरा: harâ | kesk | her |

| | | | |
|---|---|---|---|
| श : şa | शादी: şâdî | de’wet | şêst |
| ष : şa | भाषा: bhâşâ | ziman | (-) |
| स : sa | सस्ता: sastâ | erzan | sist |

**Herfên Bideng**

| | | | |
|---|---|---|---|
| अ: a | अनार: anâr | hinar | (-) |
| आ: â | आलू: âlû | kartol | awir |
| इ: i | इंजेक्षन: incêkşan | derzî | însan |
| ई: î | ईर्षालु: irşâlu | çavnebar | îcar |
| उ : u | उल्लू:ullû | bûm | usûl |
| ऊ: û | ऊंठ: ûnth | deve | ûr |
| ऋ: ri | ऋषी: ruşî | ‘ezîz | (-) |
| ए: ê | एक: êk | yek | êdî |
| ऐ: ei/e | ऐनक: eynek | berçavk | eywan |
| ओ: o | ओक: ok | lep | ocax |
| औ: au | औरत: aurat | jin | awhile |

## JÎNENÎGARÎ

İlyas Sayım di sala 1982 de li navçeya Dêrxasê ya Mûşê ji dayik bû. Dibistana seretayî li navçeya xwe, dibistana navîn jî li navenda bajarê xwand. Lîseyê li Enqereyê qedand. Piştre jî li zanîngeha Anadolê ya Eskîşehîrê beşa mamostetiya Îngîlîzî temam kir û li Bursa, Mêrdîn û Mûşê demeke dirêj bi mamostetî re mijûl bû. Di sala 2015 de di zanîngeha Mûş Alparslanê de derbasî beşa ziman û edebiyata Kurdî bû. Xebatên wî bi giranî ser rêziman û elfabeyan e. Kurdî, ‘Erebî, Farisî, Îngîlîzî û Hîndî dizane. Ew zewicandî ye û xwedî qîzeke bi navê Semîne Sehra ye.

# ÖZGEÇMİŞ

İlyas Sayım 1982 yılında Muş'un Hasköy ilçesinde dünyaya geldi. İlkokulu kendi ilçesinde, ortaokulu şehir merkezinde okudu. Sonrasında Ankara'ya yerleşti ve liseyi orada tamamladı. 2005 yılında Eskişehir Anadolu Üniversitesi İngilizce Öğretmenliği bölümünü bitirerek Bursa, Mardin ve Muş'ta öğretmenlik yaptı. On yıllık öğretmenlik deneyiminin ardından 2015 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümüne geçti. Çalışmaları daha çok dilbilgisi ve alfabeler üzerinedir. Kürtçe, Arapça, Farsça, İngilizce ve Hintçe bilmektedir. Evlidir ve Semine Sahra isminde bir kız çocuğu babasıdır.